

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Serdar AKBAŞ

HAKKARİ KURMANCİSİ GRAMERİ ÜZERİNE BİR ANALİZ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ-2020

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Serdar AKBAŞ

HAKKARİ KURMANCİSİ GRAMERİ ÜZERİNE BİR ANALİZ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEZ YÖNETİCİSİ
Doç. Dr. Ayhan TEK

MUŞ-2020

K.T.
ZANÎNGEHA MUŞ ALPARSLAN
ENSTÎTÛYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Serdar AKBAŞ

ANALÎZEK LI SER RÊZIMANA KURMANCIYA HEKARIYÊ

TEZA MASTIRÊ

RÊVEBIRÊ TEZÊ
Doç. Dr. Ayhan TEK

MÛŞ-2020

SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Hakkari Kurmancisi Grameri Üzerine Bir Analiz” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin.....yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

22.09.2020

Serdar AKBAS



NAVEROK

NAVEROK	I
KURTE	V
ÖZET.....	V
ABSTRACT.....	VII
PÊŞGOTIN	VIII
KURTEBÊJE	IX
ÎNDEKSA TABLOYAN.....	X
DESTPÊK.....	1

BEŞA YEKEM

DI DEVOKA HEKARÎYÊ DA DENGSAZÎ

1.1. DENGSAZÎ.....	7
1.1.1. Rêjeya Dengan	8
1.1.2. Herfên Bideng	10
[y:] <ü>	11
[a:] <a>.....	13
[æ] <e>	14
[e:] <ê>.....	15
[ɪ] <i>	16
[i:] <î>	18
[o] <o>.....	19
[u:] <û>	20
[ʊ] <u>	20
1.1.3. Deng Guherîna Bidengan/Dengdêran.....	21
1.1.4. Herfên Bêdeng/Dengdar	24
B [b]	27
C [dʒ].....	28
Ç [tʰ]-[tʃ].....	28
D [d]	30
F [f]	31
G [g]	32
H [h], [ħ].....	32

J [ʒ].....	34
K [k ^h],[k]	34
L [l], [ɫ].....	35
M [m]	36
N [n],[ŋ].....	36
P [p],[p ^h].....	38
Q [q]	38
R [r],[r̥].....	39
Ş [ʃ]	40
T [t ^h],[t]	40
V [v]	42
Y [j]	42
X [x],[χ].....	44
W [w]	44
Z [z].....	45
[ʔ] eyn.....	45
Dîftonga “xw”yê	45

BEŞA DUYEM

MORFOSENTAKS

2.1. NAVDÊR	47
2.2. ZAYEND	47
2.2.1. Zayenda Rêzimanî.....	48
2.3. RAVEK/EZAFE	51
2.3.1. Raveka Zincîrî	54
2.3.2 Ji Piştî Qertafên Nedîyarîyê Veqetandek	61
2.4. TEWANG	63
2.4.1. Tewanga Qertafên Nedîyarîyê	65
2.4.2. Tewanga Cînavkan.....	67
2.5. FONKSYONÊN TEWANGÊ	68
2.5.1. Di Rewşa <i>Ergatîvî</i> De Tewang	69
2.5.2. Di Rewşa <i>Akûzatîvî</i> da Tewang.....	73
2.5.3. Tewandina Hêmanên Di Dawîya Lêkerê Da Cih Digirin	74

2.5.4. Tewardina bi Daçekan	77
2.5.5. Tewardina bi ezafe/ravekê.....	78
2.5.6. Di Rewşa Banglêkirinê Da Tewang	79
2.6. CÎNAVK	81
2.6.1. Cînavkên Kesane.....	81
2.6.2. Cînavkên Nişandarîyê	83
2.6.3. Cînavkên Vegerok.....	87
2.6.4. Cînavka Qertafî	88
2.6.5. Cînavkên Pirsyarîyê	88
2.7. DAÇEK	89
2.7.1. Pêşdaçek.....	90
2.7.2. Paşdaçek.....	94
2.7.3. Bazindaçek	96
2.7.4. Daçekên Biwêjî	97
2.7.5. Kelijîna Daçekan bi Cînavkan ra (Contracted Adpositions).....	98
2.8. LÊKER	99
2.8.1. Çend Hêman û Bikaranînên Cuda.....	101
2.8.2. Qetafên Kesandinê	102
2.8.3. Di Devoka Hekarîyê da Neyînîkirin	104
2.8.4. Avaniya Lêkeran (Voice).....	105
2.8.4.1. Gerguhêzî û Negerguhêzî (transitîf/intransitîf).....	106
2.8.4.2. Lebatî û Tebatî	107
2.8.4.3. Avaniya Dançêker	109
2.8.5. Dem-Rawe-Aspect (DRA)	109
2.8.5.1. Raweya Fermanî.....	114
2.8.5.2. Dema Niha û Dema Fireh	115
2.8.5.3. Dema Bê.....	117
2.8.5.4. Dema Borîya Dîyar	118
2.8.5.5. Dema Borîya Dûdar	119
2.8.5.6. Çîrokîya Dema Borî	120
2.8.5.7. Dema Borîya Berdest	120

BEŞA SÊYEM

DI DEVOKA HEKARÎYÊ DA HEVOKSAZÎ

3.1. HEVOKSAZÎ (SYNTAX)	122
3.1.1. Peyvrêzî.....	122
3.1.2. Ji alîyê Wateyê ve Hevok.....	128
3.1.2.1. Pirslêkirin	128
3.1.2.2. Hevokên Erênî û Neyînî.....	129
ENCAM	130
ÇAVKANÎ	134
KURTEJİYAN	138
ÖZGEÇMİŞ	139

ÖZET
YÜKSEK LİSANS TEZİ
HAKKÂRİ KURMANCISI GRAMERİ ÜZERİNE BİR ANALİZ

Serdar AKBAŞ

Tez Danışmanı: Doç. Dr. Ayhan TEK

2020, 148 sayfa

Hakkâri, olarak adlandırılan bölge, Türkiye sınırları içerisinde yer alıp üç ayrı ülkenin (Türkiye, İran, Irak) siyasi sınırlarını birbirine bağlayan bir konumda olup, Kürtçe (Kurmanci) konuşucularının tam merkezinde yer almaktadır. Bu konumu itibariyle Hakkâri’de (Hakkari merkez/Colemêrg, Yüksekova/Gever, Şemdinli/Şemzînan, Çukurca/Çel) konuşulan diyalektin gramer özellikleri diğer Kurmanci diyalektlerine göre birtakım farklılıklar göstermekte ve diğer Kurmanci diyalektlerinde kaybolan bazı arkaik Kürtçe yapıları korumaktadır. Bu tezde, dört merkez şeklinde konumlanan Hakkâri bölgesinde konuşulan diyalektin genel dilbilgisi yapısı incelenmekte ve diğer Kurmanci ağızlarından farklılaştığı yapılar, bu merkezlerden yaşları 20 ile 90 arasında değişen 30 farklı kişiden toplanan veriler temel alınarak belgelendirilip ve saptanan yapı farklılıklarının muhtemel sebepleri üzerine tartışılmaya çalışılacaktır.

Hakkâri diyalektinin genel gramer yapısını inceleyen bu tez üç bölümden oluşmaktadır; ses bilgisi (fonoloji), kelime ve biçim bilgisi (morfosentaks) ve cümle bilgisi (sentaks). İlk bölümde diyalektin ses yapısı üzerinde duruldu; hangi sesin ne kadar kullanıldığı, bu diyalekte diğer Kurmanci diyalektlerine göre var olan farklı sesler saptanıp, sistematik ve özel ses değişimleri belirlenmeye çalışıldı. İkinci bölümde diyalektin kelime ve biçim bilgisi (morfosentaks) üzerinde durulmaktadır. Bu çerçevede, Hakkâri Kürtçesinin dil özellikleri Kurmancinin öbür diyalektlerine göre değerlendirilip, toplanılan veriler doğrultusunda analiz edilecektir. Son bölüm ise Hakkâri diyalektiğinin diğer Kurmanci diyalektlerine göre farklı cümle yapıları tartışılacaktır.

Anahtar Kelimeler: Kürtçe, Kurmanci, Hakkâri, Hakkâri ağızı, Behdini, Gramer.

KURTE
TEZA MASTIRÊ
ANALÎZEK LI SER RÊZIMANA KURMANCÎYA HEKARÎYÊ

AKBAŞ, Serdar

Şêwirmend: Doç. Dr. Ayhan TEK

2020, 148 Rûpel

Devoka Hekarîyê ji ber pozisyona erdnigarîya ku li ser tê axavtin û ji ber sînorên sîyasî yên di nava sê dewletan da (Tirkîye, Îran, Iraq) û di merkeza kurdîaxêveran da cih digire, li gorî devokên din ên Kurmancîyê gelek taybetîyên cuda di nav xwe de dihewîne. Ev xebat jî di vê çarçoveyê da li ser rêzimana devoka Hekarîyê ku bi çar navendan (Colemêrg, Geve, Şemzînan, Çel) pêk tê, bi çavekê zimannasî pêk têt. Xebat li ser bingeha datayên 30 kesayetên ku emrê wan di navbera 20-90ê da ye, hatîye amadekirin.

Naveroka vê xebatê ji sê beşan pêk têt; dengsazî, peyvsazî/morfosentaks û hevoksazî. Di beşa ewil da li ser dengsazîya devokê hatîye rawestan; pêşîyê li gorî Kurmancîya standard rêjeya denga hatîye dîyarkirin pişt ra her dengek cuda cuda hatîye analîzkirin. Herwisa li gorî devokên din ên Kurmancîyê dengguherînên sîstematîk û dengguherînên taybet hatine dîyarkirin. Beşa duyem ya xebatê li ser peyvsazî/morfosentaksa devokê ye. Ev beş li gorî beşên din berfirehtir e, lewra gelek mijaran di nava xwe da dihewîne; navdêr, zayend, ravek, cînavk, ergatîvî, lêker, dem, daçek... Di devoka Hekarîyê da ev mijar hemû li gorî Kurmancîya standard û devokên din ên Kurmancîyê hatin analîzkirin, di her mijarekê da form û avayên cuda yên devoka Hekarîyê hatin dîyarkirin. Beşa sêyem ya vê xebatê li ser hevoksazîya devokê ye û di i vê beşê da piranî li ser peyvrêzîyê hatîye rawestan û di devoka Hekarîyê da avayên cuda yên peyvrêzîyê hatin dîyarkirin.

Peyvên Sereke: Kurdî, Kurmancî, Hekarî, Behdînî, Devoka Hekarî, Gramer.

ABSTRACT
MASTER THESIS
AN ANALYSIS ON GRAMMAR OF HAKKARI KURMANJI

Serdar AKBAŞ

Advisor: Assoc. Dr. Ayhan TEK

2020, Page: 148

Hakkari is a province in the southeastern Turkey and it links the borders of three countries; Turkey, Iran and Iraq. It is located in the heart of Kurmanji speaking area, thus the grammatical features of this dialect (Hakkari Colemêrg, Yüksekova/Gever, Şemdinli/Şemzînan, Çukurca/Çel) display certain differences from other Kurmanji dialects while some archaic features which have been lost in other dialects are still preserved. This thesis aims to investigate the grammar (i.e. phonological, morphological and syntactic properties) of Hakkari dialect, to explore the aspects where this dialect diverges from the standard norm and to discuss the potential reasons for the differences based on the Kurmanji data collected from 30 people with different ages (i.e. between 20 and 90 years old) living in the different districts of Hakkari.

Investigating the main grammatical aspects of Hakkari dialect, this thesis is structured into three main chapters; phonology, morphology and syntax. Chapter-1 investigates the phonetic inventory of sounds, the sounds that are peculiar to this dialect, systematic sound changes and the frequency of use of sounds. Chapter-2 focuses on the word structure and morphological properties of Hakkari dialect and analyzes the aspects where this dialect diverges from other Kurmanji dialects. Chapter-3, on the other hand, discusses the different syntactic properties of this dialect. Lastly, concluding remarks are presented in the Conclusion section.

Key Words: Kurdish, Kurmanji, Hakkari, Dialect of Hakkari, Bahdini, Grammar.

PÊŞGOTIN

Zimanê Kurdî ku wek gelek zimanekê dinyayê di nava xwe da bi çend zaravayên ji hev cuda pêk tê û her zaravayek jî di nava xwe da çend devokên cuda dihewîne. Ji wan zarava û devokan hinek ên bûy mijarên xebatên zimannasan û hinek jî ji xebatên zimannasîyê yên bêpar may. Ev xebat jî li ser devoka Hekarîyê pêk dihêt ku me di vê xebatê da, hewl da ku Kurmancîya Hekarîyê bi çavekê zimannasîyê û li ser bingeha datayên ku me ji herema Hekarîyê berhev kirî, analîz bikin. Armanca vê xebatê ev e ku, ji bo xebatên berfirehtir bibe çavkanîyek.

Amadekirin û pêkhatina vê xebatê, bi harîkarî û rêbertîya gelek kesan çêbû. Pêşîyê dixwazim spasîyên xwe li şewirmendên xwe birêz Doç. Dr. Ayhan TEK û birêz Dr. Songül GÜNDOĞDU bikim ku ji serê xebatê û heya dawîyê ez bi tecrûbe û pêşniyarên xwe bêpar nehêlam. Ji bo pêşniyar û sererastkirinên birêz Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ û birêz Dr. Mehmet Emin PURÇAK spas dikim. Dîsa di berhevkirina datayan da ji bo harîkarîya hevalên xwe spasiya Emrah DÜZEN û Yusuf BAŞARGAN dikim. Herwiha ji bo wan kesên ku me deng/data jê girtî û bûyî bingeha xebata me zor spas dikim.

Hêvîdar im ku ev xebat, li ser devokên Kurmancîyê û bi taybetî jî li ser Kurmancîya Hekarîyê ji bo xebatên berfirehtir bibe pêngavek.

Muş-2020

Serdar AKBAŞ

KURTEBÊJE

1	:	Kesê yekemîn
2	:	Kesê duyemîn
3	:	Kesê sêyemîn
D.H	:	Devoka Hekarîyê
MKL	:	Li hev hatina mêjer û kesandinê
Daç	:	Daçek
K.S	:	Kurmancîya standard
K.T.	:	Komara Tirkiyeyê
J	:	Jimar
R	:	Rûpel
PK1	:	Pirjimar kesê yekem
PK2	:	Pirjimar kesê duyem
PK3	:	Pirjimar kesê sêyem
C.X	:	Cînavkên xwerû
L	:	Lêker
M	:	Mêza
N	:	Nêrza
Nd.	:	Nedîyar
Pj.	:	Pirjimar
Tew.	:	Tewang
T.C.	:	Türkiye Cumhuriyeti
Q	:	Qertaf
Yj.	:	Yekjimar
YK1	:	Yekjimar kesê yekem
YK2	:	Yekjimar kesê duyem
YK3	:	Yekjimar kesê sêyem
Veç.	:	Veçetandek
Veç.S.	:	Veçetandeka serbixwe
Xwr.	:	Xwerû

ÎNDEKSA TABLOYAN

Tablo 1.1. Di derheqê Bêjêran da

Tablo 1.2. Danberheva Hejmar û Rêjeya Dengan

Tablo 1.3. Li gorî pozisyona ji devî derketinê herfên bideng

Tablo 1.4. Li gorî pozisyona “ziman”î herfên bideng

Tablo 1.5. Konsonantên/Bêdengên Kurdî

Tablo 2.1. Di Kurmancîyê Da Qertafên Zayenda Rêzimanî.

Tablo 2.2. Di Devoka Hekarîyê da qertafên zayenda rêzimanî

Tablo 2.3. Cînavkên kesane di Devoka Hekarîyê da.

Tablo 2.4. Cînavkên Nîşandarîyê û dîyardeyên nêzîkatîyê li Şemzînan

Tablo 2.5. Daçek Di Devoka Hekarîyê Da

Tablo 2.6. Ji alîyê avanîyê ve lêker.

Tablo 2.7. Qertafên Kesandinê di Kurmancîyê da

Tablo 2.8. Bi Kêşana Lêkera “*kirin/çûn*”ê Qertafên Kesandinê di Standard û Devoka Hekarîyê da

Tablo 2.9. Bi Kêşana Lêkera “*çûn*”ê li gorî Deman Neyînîkirin di Devoka Hekarîyê da

Tablo 2.10. Avanîya Tebatî di Devoka Hekarîyê da

Tablo 2.11. DRA Dîyarde di Kurmancîyê da

Tablo 2.12. Hin Dîyardeyên Cuda di Devoka Hekarîyê da

Tablo 2.13. Bi kêşana lêkerên “*çûn/gotin*”ê di standard û Devoka Hekarîyê da Xwestekîya pêknehatî.

Tablo 2.14. Bi Kêşana Lêkera “*çûn*”ê Pêkhatina Deman di Devoka Hekarîyê da

Tablo 2.15. Bi Kêşana Lêkera “*Kirin*”ê Cudahîya Dema Niha û Fireh di D.H da

Tablo 2.16. Bi Kêşana Lêkera “*şuştin*”ê Dema Bê di D.H da

Tablo 2.17. Bi Kêşana Lêkerên “*xwarin û hatinê*”ê Dema Borîya Dîyar di D.H da

Tablo 2.18. Bi Kêşana Lêkerên “*kenîn*”ê Dema Borîya Dûdar di D.H da

Tablo 2.19. Bi Kêşana Lêkera “*birin*”ê Çîrokîya Dema Borî di D.H da

Tablo 2.20. Bi Kêşana Lêkera “*dîtin*”ê Dema Borîya Berdest di D.H da

Tablo 3.1. Li gorî *lêkeran* bi cihbûna hêmana *têrkerê*

DESTPÊK

Giringî û Mijara Xebatê

Herêma ku wek “Hekarî” tê binavkirin, sînorên sîyasî yên dewletên Iraq, Îran û Tirkîyeyê bi hev ve girêdide, lê di nava sînorên sîyasî yên dewlata Tirkîyeyê da dimîne. Ev herêm her çend jî di pozisyonek wisa da be ku sînorên sîyasî yên sê dewletan bi hev ve girêbide; ji navendên wan her sê dewletan dûr û di navenda Kurdîaxêveran da dimîne. Yanî ji Erebî, Farisî û Tirkî axêveran dûr û di merkeza kurdîaxêveran da cih digire. Ji ber vê pozisyona xwe di devoka Hekarîyê da li gorî devokên din yên Kurmancîyê hin cudahîyên rêzimanî tînin û hin taybetîyên ku di devokên din ên Kurmancîyê da berze bûne ev devok wan taybetîyan hêj jî li ser xwe digire û diparêze. Di vê çarçoveyê da lêkolînên ku me li ser lîteratûra vê mijarê kirî, me tesbît kir ku çu xebatên berfireh li ser vê mijarê nehatîne kirin. Her çend di vê dema nêzik da çend meqaleyên ku hatî weşandin, li ser hin taybetî û avayên vê devokê rawestibin jî, ev devok bi hemû taybetîyên xwe ve û bi gelemperî nehatîye tehlîl kirin.

Ev xebat, dê li ser devoka Hekarîyê ku ji aliyê zimanî ve ji xebat û lêkolînên berfireh dûr mayî raweste. Avayê rêzimana devoka Hekarîyê bi gelemperî di çarçoveya dengsazî (fonolojî), peyv û awa (morfolojî) û hevoksazî (sentaks) ve analîz bike û li gorî wan analîzan avayê rêzimana vê devokê di çarçoveyê fireh da vekole û teşe û taybetîyên cuda yên vê devokê bi datayan peyitîne. Herwiha li ser wan cudahîyên ku hatine dîyarkirin raweste û ji bo xebatên devokên Kurmancîyê dê bibe alîkar.

Rêbaza Xebatê

Me di vê xebata xwe da ji bo berhevkirina daneyan di lîteratûra “linguistic fieldwork and language documentation” da rêbaz û teknîkên hatine pêşniyarkirin bikaranîn (Vaux&Cooper 1999, Austin 2014). Pêşîyê me ji çar navendên herêma Hekarîyê (Colemêrg, Gever, Şemzînan, Çel) ji çend jin û mîrên ku emrê wan di navbera 20-90 da diguhire, bi navgînek deng qeydkirinê bi awayekî xwebixweyî bi qasî 283 deqqeyan “dane” berhevkirin û me ew deng bi rêya kompûterekê derbazî nivîsê kirin. Pişt ra me ew dane di çarçoveya xebatên mînak ên dîyalektên Kurmancîyê an jî gelek xebatên din ên zimanên bêyanî da bi çavekê zimannasî tehlîl kirin û darêjek rêzimanî nivîsî.

Çavkanî û Lîteratûr

Li ser Kurmancî û devokên Kurmancîyê ên ku di nava sînorên sîyasî ên dewleta Tirkîyê da têne axivtin, kêma xebatên ku bi rêbazên zimannasîyê hatîye kirin hene. Dema mirov bi konteksta erdnigarî û têkildarîya zimanan ve lê dinêre, li ser awayên devokên Kurmancîya ku di nava sînorên Tirkîyeyê da tê axivtin, herêm bi herêm hin cudahî û guherîn tên berçav (Haig 1998; 2002; 2008; 2011; 2014; Öpengin & Haig 2014; Gündoğdu 2017 û 2019). Di vê çarçoveyê da D Hekarîyê (Colemêrg, Geve, Şemzînan, Çel) jî ji xebatên berfireh ên zimannasîyê dûr maye, tenê çend meqe û pirtûkên rêzimanê da bi awayekê kurt li ser hin taybetîyên vê devokê rawestane. Wek mînak:

Geoffrey Haig û Ergin Öpengin (2015) di meqeleya xwe ya bi navê “Kurmanji Kurdish in Turkey: structure, varieties, and status” da, di beşa “Şemzînan variety of Southeastern Kurmanji” da li ser taybetîyên axaftina devera Şemzînan radiwestin. Heman nivîskar di xebateke din ya bi navê “Regional variation in Kurmanji: A preliminary classification of dialects” da (2014), bi berhevdanê li ser devokên Kurmancîyê rawestane û hin taybetî û cudahîyên devoka Hekarîyê jî dîyarkirine. Dîsa Gündoğdu (2019) di xebata xwe ya bi navê “Asymmetries in Kurmanji Morphosyntax” da ku di Kurmancîyê da li ser tewang û pergala awayê daçekan radiweste; bi kurtasî hin cudahîyên devoka Hekarîyê dide dîyarkirin. Ji bilî wan çend xebatên nû; Celadet Alî Bedir Han û Roger Lescot (2004) di xebata xwe ya bi navê “*Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci)*” da ji alîyê deng û peyvên ve hin awayên cuda yê devoka Hekarîyê didin dîyarkirin. Samuel A. Rhea, di xebata xwe ya bi navê “*The Brief Grammar and Vocabulary of The Kurdish Language of The Hakari District*” (“Kurteyek ji Rêziman û Ferhenga Zimanê Kurdî ya Herêma Hekarî”) (1869) da li ser devoka Hekarîyê radiweste. Rojan Hazim di kovara *Kurmancî* da bi nivîsek “Devokê Hekarîya” li gorî standardê hin cudahîyên devoka Hekarîyê dide dîyarkirin.

Ji bilî van xebatan, xebatên ku bi pergala rêzimana devoka Hekarîyê û bi rêbaza zimannasîyê ku xwedan analîzeke heralî nîn in yan jî pêş çavên me neketine.

Hekarî û Devoka Hekarîyê

Zimanê Kurdî ku di Rojhilata Navîn da, li gel zimanên Erbî, Farisî û Tirkî ji alîyê girseyek mezin ve tê axivtin. Herwiha zimanê Kurdî ji malbata zimanên Hind-Avropî û ji milê zimanên Îranî ye. Li gorî Öpengin û Haig (2014) “kurdî, têgiheke sîwanî ya komeke ziman û zaravayên bakurê rojavayê Îranê ye ku li rojavayê Îranê, bakurê Iraqê,

rojhilatê Tirkîye û Surîyeyê girseyeke di navbera 25-30 milyon kes pê dipeyivin” (neqil ji: Tan, 2018: 16). Wek hemû zimanên dinyayê zimanê Kurdî jî bi çend zaravayên cuda pêk tê û her zarava jî çend devokên cihê di nava xwe da dihevîne.

Ziman di nava demê da bi awayekî xwezayî dabeşî zaravayan û zarava jî dabeşî devokan dibin. Lê belê hin sedem hene ku zimanan bi awayekî leztir parçe dikin û zarava/devokên wî zimanî ji hev dûr dixin. Wek tê zanîn sînorên erdnigarîya ku Kurdîaxêv li ser dijîn çu wexta wek yek parçe û bi alîyê yek rêveberîyê ve nehatîye îdarekirin û zêdetir hatîye parçekirin. Di roja îroyon da jî erdnigarîya ku Kurd li ser dijîn di nava çar dewletên ji hev cuda da ya hatî dabeş kirin. Vê yekê cudahîyên mezin xistine di navbera devok û zaravayan da û ji hev dûr xistin. Dema em erdnigarîya Kurdistanê ya fîzîkî jî dinêrin ew erdnigarî jî ji bo ji hev veqetîna ziman û ji hev dûrxistina devok û zaravayan erdnigarîyek misayîd e. Ji alîyêkê din ve bikaranîna alfabeyên cuda jî ku Kurdên di nava sînorên dewletên Îran, Iraq û Sûrîyê alfabeya Aramî/Erebî û Kurdên di nava sînorên dewleta Tirkîyeyê da alfabeya Latînî bikartînin, ji bo yekbûna ziman tengasîyek pir mezin çêkirîye.

Hejmara zaravayên zimanê Kurdî li gorî zimannasan diguherin. Li ser zaravayên zimanê Kurdî yêk ji çavkanîyên herî kevin *Şerefnameya Şeref-Xanê Bedlîsî* tê hesibandin. Şerefxanê Bitlîsî (1543-1603) di *Şerefnameyê* da ‘eşîr û civakên Kurdan, ji alîyê zimanî ve wek Kurmanc, Lor, Kelhûr û Goran dabeş kirîne (Bedlîsî, 2007: 20). Mehrdad R. Izady zimanê Kurdî pêşîyê dike du beş; “Kurmancî û Pehlewani”, van jî di nava xwe da dike çend beş; “Kurmancî”; Kurmancîya jor (Bahdînî), Kurmancîya jêr (Sorani, Kelhûrî). “Pehlewani”; Gorani (Hewremani, Lakî), Zazakî (Dimilî) (Izady, 2011: 300-301). Xeznedar, jî zimanê Kurdî wek sê zaravayan dabeş dike: Kurdîya Kurmancî, Kurdîya Goranî/Zazakî, Kurdîya Lorî (Xeznedar, 2010: 50).

Lê bi gelemperî zaravayên Kurdî wek: Kurmancî, Sorani, Zazakî, Goranî (Hewramî) û Lorî tînin dabeşkirin. Herwiha zaravayên Kurdî di nava xwe da jî dabeş dibine çend devokên cuda. Di zimannasîyê da; yanî li gorî zanista ku zimanan ji alîyê ava û pêkhatina dangan, peyvan û hevokan ve dinirxîne û disenîfîne wek têgehekê “devok” wisa tê ravekirin:

Devok, ew ziman in yên ku di cihên fermî de nahên bi kar anîn, rabirdûyek wan ya nivîskî çênebûye, di ragihandinê da xwedî qadek bi sînor in, li gorî zimanê

standard xwedîyê rêzdarîyek kêr in, di dibistanan da nahên fêrkirin û awayên axivtinê yên herêmkî ne. (Aksan, 1979: 84)¹

Dema em bi vê raveyê zaravayê Kurmancî dinêrin çend devokên ji hev cuda dertên pêş. Lewra Abdurrahman Adak dibêje ku “Kurmancîya jorê devokên wekî Beyazidî, Hekarîyê, Botanî, Aştî û Badînanî di nava xwe da dihevine (Adak, 2013: 103). Dîsa Izady zaravayên Kurmancî dabeş dike çend devokan “Yunakî, Sancarî, Cudikanî, Êrfî, Botanî, Beyazidî, Hakkarî, Surçî, Qochanî, Bircandî û Elbrûz (Izady, 2011: 300,301).” Dema em ji xebata Haig û Öpengin dinêrin (2014), ew zaravayên Kurmancîyê wek pênc beşan dabeş dikin; devoka “Başûrrojilat”; Bahdînî (Hekarî, Duhok), devoka “Başûr”; (Mardîn, Batman, Dîyarbekir), devoka “Bakûr” (Mûş, Agirî, Bilis, Wan), devoka “Başûrojawa” (Semsûr, Entab, Êrfa), devoka “Bakûrojawa” (Meraş, Meletî) (Öpengin&Haig, 2014: 147-148).

Di vê çarçoveyê da her zarava û her devok di nava xwe da hin taybetîyên cuda nîşan dide. Em jî dê bi vê kontekstê li ser taybetî û cudahiyan devoka Hekarîyê rawestin.

Erdnigarîya devera Hekarîyê di dîrokê da ku bakur ve dikeve binê Gola Wanê, li alîyê rojhilatê ve digehe Rizayîyê (Urmîye), li alîyê rojavayê ve digehe Cizîrê û li başûr ve jî digehe Duhok, Dîyana û Zaxo. Bi awayek din em bibêjin ku devera Hekarîyê wek navend Colemêrg û navçeyên wek Geve, Şemzînan, Çelê, Elbak, Miks, Şax, Payîzava û Bêşebabê digire nav xwe. Her wiha devoka Hekarîyê jî kêr zêde li van deran tê axivtin. Lê belê xebata me, bi Hekarîya di nava sînorên sîyasî yên dewleta Tirkîyeyê da (Colemêrg, Geve, Şemzînan, Çel) bi sînokirî ye.

Divê, ev yek jî bê dîyarkirin ku zimanê Kurdî û zaravayên wê li gorî herêman bi navên cuda têne binavkirin. Herwiha mîletê Hekarîyê jî xwe wek “kurd” zimanê ku diaxivin jî wek “kurdî” dizanin û van têgehên bikartînin. Têgehên “kurmanc” û “kurmancî”yê piranî di nava gel da nahên bikaranîn. Kurmanc bo piçûkkirin û kêmdîtinê jî tête bikarînan.. Ji alîyê din ve, di nava devokên Kurmancîyê da devoka Hekarî û devoka Bahdînan her çend ji alîyê hin kesan ve wek du devokên cuda bêne dabeşkirin jî bi gelek taybetîyên xwe ve hevpar in. Ji ber vê nêzîkahîya herdu devokan û nêzîkahîya erdnigarî, li vê herêma hin kes jî xwe û zimanê xwe wek “Bahdînî/Badînî” bi nav dikin.

¹ Ji alîyê min ve ya hatî wergerandin

Bêjer û Berhevkirina Dengan

Berhevkirina datayan, di nava navçeyên Hekarîyê; Colemêrg, Gever, Şemzînan û Çelê pêk hat. Deng/data piranî me bi xwe berhev kirin lê hin deng bi alîkarî û aliyê hin hevalan ve hatin berhevkirin. Kesên ku me deng jê girtî emrê wan di nava 20 û 90ê da diguhire û ji wan 9 kes jin in û 21 kes jî mêr in. Di xebata xwe da, me deng ji 1ê heya 31ê bi jimar kirin, ji wan dangan 1-10 Gever, 11-18 Şemzînan, 19-24 Colemêrg û 25-31 Çelê en hatî berhevkirin. Di derheqê kesên ku me deng jê girtî da di tabloya (1)ê da agahî en hatî dayîn.

Tablo 1.1. Di Derheqê Bêjeran Da

Jim ar	Nav	Zayan d	*Em r	Têkilîya ewil bi Kurdîyê re	Têkilîya ewil bi Tirkîyê re	Perwerde	Cih	Dirêjah îya qeydê (dege)
1	F.A.	Mêr	61	Ji dayîkbûnê	Ji 20 salîyê	Nexwende	Gever	09.32
2	H.D.	Jin	60	Ji dayîkbûnê	Ji 20 salîyê	Nexwende	Gever	10.13
3	R.T.	Mêr	60	Ji dayîkbûnê	Ji 8 salîyê	8 salan xwandîye	Gever	05.00
4	H.M.	Mêr	71	Ji dayîkbûnê	Ji 21 salîyê	Nexwende	Gever	11.00
5	Î.A.	Mêr	65	Ji dayîkbûnê	Ji 20 salîyê	Nexwende	Gever	13.20
6	K.T.	Mêr	56	Ji dayîkbûnê	Ji 9 salîyê	8 salan xwandîye	Gever	10.00
7	S.AK	Jin	47	Ji dayîkbûnê	Ji 8 salîyê	5 salan xwandîye	Gever	05.40
8	S.AS.	Jin	70	Ji dayîkbûnê	Ji 35 salîyê	Nexwende	Gever	11.17
9	T.K.	Jin	53	Ji dayîkbûnê	Ji 20 salîyê	Nexwende	Gever	08.15
10	X.B.	Jin	68	Ji dayîkbûnê	Ji 35 salîyê	Nexwende	Gever	12.30
11	A.F	Mêr	41	Ji dayîkbûnê	Ji 20 salîyê	Nexwende	Şemzînan	04.30
12	F.D.	Mêr	50	Ji dayîkbûnê	Ji 20 salîyê	Nexwende	Şemzînan	07.30
13	F.U.	Mêr	58	Ji dayîkbûnê	Ji 8 salîyê	Nexwende	Şemzînan	05.00
14	F.D.	Mêr	68	Ji dayîkbûnê	Ji 21 salîyê	Nexwende	Şemzînan	04.30
15	L.K.	Jin	45	Ji dayîkbûnê	Ji 20 salîyê	Nexwende	Şemzînan	08.00
16	M.T.D	Mêr	32	Ji dayîkbûnê	Ji 9 salîyê	5 salan xwandîye	Şemzînan	07.30
17	M.E.	Mêr	65	Ji dayîkbûnê	Ji 20 salîyê	Nexwende	Şemzînan	06.40
18	X.S.	Jin	70	Ji dayîkbûnê	Ji 35 salîyê	Nexwende	Şemzînan	20.00
19	N.E.	Jin	54	Ji dayîkbûnê	Ji 20 salîyê	Nexwende	Colemêrg	23.00
20	H.G.	Mêr	37	Ji dayîkbûnê	Ji 6 salîyê	Zanîgeh	Colemêrg	06.30
21	A.T.	Mêr	27	Ji dayîkbûnê	Ji 7 salîyê	Zanîgeh	Colemêrg	06.30
22	E.D.	Mêr	28	Ji dayîkbûnê	Ji 6 salîyê	Zanîgeh	Colemêrg	04.45
23	M.T.	Mêr	25	Ji dayîkbûnê	Ji 6 salîyê	Zanîgeh	Colemêrg	6.00
25	E.H.Ş	Mêr	66	Ji dayîkbûnê	Ji 20 salîyê	Nexwende	Çel	05.30
26	F.G.	Jin	87	Ji dayîkbûnê	Tirkînzane	Nexwende	Çel	07.20
27	H.K.K.	Mêr	73	Ji dayîkbûnê	Ji 20 salîyê	Nexwende	Çel	22.00
28	R.B.	Mêr	52	Ji dayîkbûnê	Ji 7 salîyê	5 salan xwandîye	Çel	08.00
29	R.H	Mêr	52	Ji dayîkbûnê	Ji 7 salîyê	5 salan xwandîye	Çel	06.40
30	E.C.	Mêr	61	Ji dayîkbûnê	Ji 20 salîyê	Nexwende	Çel	03.40
31	T.K.	Mêr	71	Ji dayîkbûnê	Ji 21 salîyê	Nexwende	Çel	27.00
Nav ekî								Têhev 283.00

Ew dengên ku me ji 30 kesan girtî -ku bi tevahî 283 deqeyan pêk tên- hinek “serpêhatî”, hinek “çîrok” û hinek jî “vegotinên jîyana berê” ne. Ev dengên ku me qeyd kirî bi rêya kompûterê derbasî nivîsê kirin û her datayek bi jimarekê dîyar kir. Herwiha ku jêr jî dîyar e, me wek çavkanî jî ev “jimar” bi kar anîn.

“Bîye xulî xulîyek, bîye qîyametek, mi go e(z)² çûm bû Bilîsey.” (1)

“Em berawê gundê siniri da bîn, gundê me gundekê sinirê Îraqê.” (11)

“Carekê du kurik çûn herdu birayê êk bûn.” (19)

“Mîstek mil dev û lêvêt wi da, xûn bersînga da hate xarê.” (31)

Mînakên xwe yên ku me ji datayan girtî hemû bi awayê mînakên jor ên rêz kirî. Wek ku ji mînakên jor jî dîyar e; mînaka ewil li gorî jimareyan ji kesê 1. (F.A., Mêr, ‘emr 61, Nexwende, ji Geverê) ya hatî girtin. Mînaka duyem ji kesê 11. (A.F., Mêr, ‘emr 41, Nexwende, ji Şemzînanê), Mînaka sêyem ji kesê 19. (N.E., Jin, ‘emr 54, Nexwende, ji Colemêrgê) û Mînaka çarem ji kesê 31. (T.K., Mêr, ‘emr 71, Nexwende, ji Çelê) ên hatî girtin.³

² Di devoka Hekarîyê da gelek deng dikevin û nahên telafûz kirin. Me di xebata xwe da gelek caran ew deng di nava *kevanekê/()* da ên day diyarkirin. Herwiha ev mijar di beşa dengsazîyê da tê niqaşkirin.

³ Di vê xebatê da ji bilî mînakên ku me ji van datayan girtî, hin mînak jî me xwe bixwe dane, lê ev mînakên ku me xwe bixwe dayî jî, ji biştî pirsyarkirin û telafûzkirina çend axêverên devokê ên hatî dayîn. Di xebatê da ev mînakên ku ji aliyê me ve hatî dayîn, bi awayê *italik* ên hatî nivîsîn.

BEŞA YEKEM

DI DEVOKA HEKARÎYÊ DA DENGSAZÎ

1.1. DENGSAZÎ

Li ser zaravayên zimanê Kurdî mijarek din jî ku di nava zaravayan da guherbar e, deng in. Di nava devokên zaravayan da bi qasî zaravayan nebe jî li ser dengên, yan jî li ser dengsazîyê hin formên guherbar tên dîtin. Li ser dengsazîya Kurmancîya Hekarîyê jî li gorî devokên din ên Kurmancîyê hin cudahî tên dîtin, her çend ev cudahî bi gelemperî di pêleya devokan da bin jî, hin caran guherîn û formên pêleya zaravayan da jî tên dîtin.

Zaravayê Kurmancî ku heta salên 1930an bi alfabeya Erebî dihat nivîsîn piştî salên 1930î cihê xwe ji alfabeya Latînî ra hişt. Her çend alfabeyek Latînî ku li gorî dengên Kurmancî, hatibe amadekirin jî ev alfabe, hemû dengên zaravayê Kurmancî di xwe da nahewîne. Celadet Alî Bedirxan ku bingeha alfabeya Kurmancî ya Latînî avêtîye li gel Lescot (2004) ji aliyê dengsazîyê ve alfabeya Kurmancî ya Latînî wisa rave dikin:

Alfabeya Kurdî ya latînî alfabeyeke fonetîk e. Ew herfên ku vê alfabeyê pêk tînin ji bilî hin cudahiyên piçûk her yek xwedîyê dengê ye û qethiyen beranberê çu dengên din nahên. bê guman hemû peyv çawan tên gotin wisa tên nivîsîn; bi heman awayê, dema tên xwendin hemû herf tên bilêvkin. (Bedir Han & Lescot, 2004: 3)

Her çend Celadet û Lescot gihiştibin encamek wisa ku di Kurmancîyê da her herfek xwedîyê tenê yek dengê ye, em wisa dibînin ku di Kurmancîyê da deng gelek ji herfan zêdetir in. Herwiha di berdewama wan gotinên xwe da Bedir Han û Lescot dibêjin ku “Di alfabeya Kurdî da 31 herf û heger du herfên xwazekî (ç/h, ê/x) jî lê bên zêdekirin, 33 herfên hey” (Bedir Han & Lescot, 2004: 3,5).

Di Kurmancîyê da 31 herf û diftongek heye; ji wan herfan 8 bideng/dengdêr û 23 bêdeng/dengdar in. Di van beşên jêri da em yek bi yek li ser van dengên ranawestin gelo ka kîjan deng di kîjan pozisyonê da derdikeve û taybetiyên her dengê bi kite kiteyî analîz nakin. Emê lê binêrin ji van dengên kîjan di devoka Hekarîyê da tê bikaranîn, ji bilî van dengên çu dengên din hene ku tên bikaranîn, herwiha di navbera van dengên da guherînên çawan çêdibin û kîjan deng çî qeder tên bikaranîn, bidin dîyarkirin. Herwiha em ê devoka Hekarîyê ne tenê li gorî standard û devokên din binirxînin, emê cudahiyên navxweyî jî bidin dîyarkirin.

1.1.1. Rêjeya Degan

Ji bo rêjeya degan; data, ji çar kesên ji hev cûda hatine girtin; ku emrê wan li ser pêncehê ye û ji wan sê jin in û kesek jî mêr e. Herwiha yek ji Gevê, yek ji Çelê yek ji Colemêrgê û yek jî ji Şemzînan e. Ji van datayan hin çîrok û hin jî serpêhatî ne. Data bi tevahî 3860 peyv û 14265 degan pêk tên. Rêjeya degan a ku ji van datayan hatîye girtin bi rêjeya degan a Kurmancîya standard⁴ û devoka Torê (Kalkan, 2019: 56-60) hatîye danberhevkerin û li gorî vê danberhevkerinê hin analîz hatine kirin.

⁴ Bedir Xan & Lescot (2011), Rizgar, (2012).

Tablo 1.2. Danberheva Hejmar û Rêjeya Dengan

Tîp	DEVOKA TORÊ		XEBATA BARAN RIZGAR		C. BEDIRXAN- R. LESCOT		EV XEBATE - D. HEKARÎYÊ	
	Hejmar	% e	Hejmar	% e	Hejmar	% e	Hejmar	% e
Aa	2664	%10,68	5882	%8,1	1500	%8,5	1130	%7,92
Bb	1000	%4,02	3180	%4,4	650	%3,7	677	%4,74
Cc	65	%0,26	661	%0,9	120	%0,7	55	%0,38
Çç	489	%1,96	825	%1,1	150	%0,8	275	%1,92
Dd	1190	%4,77	2744	%3,8	840	%4,8	501	%3,51
Ee	2094	%8,41	8510	%11,7	2200	%12,4	1745	%12,23
Êê	2253	%9,03	1577	%2,2	1000	%5,7	1156	%8,10
Ff	52	%0,2	677	%0,9	150	%0,8	19	%0,13
Gg	506	%2,02	1426	%2	200	%1,1	252	%1,76
Hh	503	%2,01	1862	%2,6	350	%2	328	%2,29
Ii	2659	%10,66	6190	%8,9	1800	%10,2	1131	%7,92
Îî	875	%3,50	3855	%5,3	700	%4	411	%2,88
Jj	446	%1,78	620	%0,9	300	%1,7	168	%1,17
Kk	1188	%4,76	2590	%3,6	650	%3,7	586	%4,10
Ll	553	%2,22	2237	%3,1	450	%2,5	285	%2
Mm	807	%3,23	1888	%2,6	550	%3,1	399	%2,8
Nn	1070	%4,29	2806	%8	3300	%7,4	737	%5,16
Oo	582	%2,33	1316	%1,8	400	%2,3	75	%0,52
Pp	153	%0,62	1140	%1,6	120	%0,7	113	%0,8
Qq	113	%0,45	1002	%1,4	140	%0,8	38	%0,26
Rr	1257	%5,06	5380	%7,4	1100	%6,2	841	%5,9
Ss	366	%1,47	1914	%2,6	340	%1,9	241	%1,68
Şş	235	%0,94	1443	%2	160	%0,9	191	%1,33
Tt	648	%2,60	2459	%3,4	400	%2,3	881	%6,17
Uu	92	%0,38	797	%1,1	120	%0,2	178	%1,24
Ûû	324	%1,48	904	%1,2	450	%2,5	465	%3,25
Üü	0	%0	0	%0	0	%0	114	%0,8
Vv	472	%1,89	1363	%1,9	500	%2,8	127	%0,75
Ww	1046	%4,20	1153	%1,6	350	%2	419	%3,04
Xx	381	%1,54	1106	%1,5	340	%1,9	306	%2,14
Yy	496	%1,99	732	%1	200	%1,1	320	%2,24
Zz	309	%1,25	1283	%1,8	150	%0,8	95	%0,66
Tev.	24934	%100	72521	%100	17680	%100	14265	%100

1.1.2. Herfên Bideng


Di zimannasîyê da herfên bideng wek “dengên ku di nava valahîya devî da û ji rêya dengan da bi awayekî hêsan û bê asteng derdikevin in (Hengirmen, 2009: 383)” ên hatî ravekirin. Herwiha herfên bideng li gorî pozisyona ji devî derketinê û li gorî dirêjbûn-kurtbûnê tên senifandin. Di Kurmancîya standard yan jî Kurmancîya nivîskî da ji wan herfên bideng heşt heb tên bikaranîn. Haig & Öpengin (2015) di Kurmancîyê da van herfên bideng wek du beşan disenifînin:

Dirêj, yan jî dengên tijî: /a/ <a>; /i/ <î>; /e/ <ê>; /o/ <o>; /u/ <û>

Kurt, yan jî dengên zêf: /æ/ <e>, /ɔ/ <u>, /ɪ/ <i> (Haig & Öpengin, 2015: 9)

Husein Muhammed herfên bideng li gorî pozisyona ji devî derketinê (tab. 3) û li gorî pozisyona “ziman”î (tab. 4) wisa dabeş dike:

Tablo 1.3. Li Gorî Pozisyona Ji Devî Derketinê Herfên Bideng



Tablo 1.4. Li Gorî Pozisyona “Ziman”î Herfên Bideng⁵

	pêşîn	navendî	paşîn
girtî	î	i,u	û
nîvî	ê		o
vekirî	e		a

Çavkanî: (Muhammed, 2016: 252-253).

Dema em ji pirtûkên rêzimanê ên Kurmancî dinêrin, ji wan Samî Tan herfên bideng bi çar senifandinên cuda da dinirxîne:

⁵ Mebest ji ”nizm” yan ”vekirî” ew e ku di dema çêbûna vî dengî de ziman li binê devî ye (ne bi banê devî ve ye). Mexseda ”paşî” ew e ku ziman di dema peydabûna vî dengî de li paşîya devî ye (ne li pêşîya devî ye) (Muhammed, 2016: 252).

1. Kurtbûn – Dirêjbûn

- a. Dengdêrên dirêj: *a, ê, î, o, û*
- b. Dengên kurt: *e, i, u*

2. Li gorî cîderkê dengdêr

- a. Pêşderkî: *î, ê, e*
- b. Navderkî: *i, u*
- c. Paşderkî: *û, o, a*

3. Li gorî awayê vebûna devê mirov

- a. Gilover: *o, u, û*
- b. Nîvgirtî: *î, i, ê*
- c. Vekirî: *a, e*

4. Li gorî asta derketinê

- a. Dengdêrên bilind: *î, û, i, u*
- b. Dengdêrên navincî: *ê, o*
- c. Dengdêrên nizm: *a, e* (Tan, 2011: 38).

Dema em li gorî van senifandinan ji devoka Hekarîyê dinêrin; di devoka Hekarîyê da dengdêr (vowel) ji alîyê taybetîyên xwe ve bi heman awayê tên bikaranîn. Lê belê di devoka Hekarîyê da ji bilî van dengdêran, dengdêra “ü”/[y:] jî bi awayekî berbelav tê bikaranîn. Ji alîyê din ve, herfên bideng di devoka Hekarîyê da li gorî standardê û devokên din di nava xwe da hin çaran guherînên sistematîk û hin çaran jî guherînên taybet pêk tînin. Di heman demê da dîsa li gorî standardê û devokên din di devoka Hekarîyê da hin deng pir zêde hinek jî kêm tên bikaranîn. Em ê van dengên li gorî taybetîyên xwe û li gorî bikaranîna devoka Hekarîyê da yek bi yek analîz bikin.

[y:] <ü>

Dema em li gorî taybetîyên dengên [y:]yê dinêrin; ev ji alîyê awayê vebûna devê mirov dengê “glover” e, ji alîyê kurtbûn-dirêjbûnê ve “dirêj” e û li gorî cihê derketinê, “pêşderk” e. Her wiha di IPAYê de wek [y:] tê nivîsîn û ji ber ku dirêj e, awayê dîyarkirina wê dibe [y:].

Wek tê zanîn dengê [y:]yê ji bilî Tirkîyeyê ne di Farisîyê da ne di Erebiyê da ne jî di zaravayê Soranî yê standard da heye. Ji ber vê yekê wisa tê fikirîn ku dengê [y:] ji Tirkîyê derbazî devoka Hekarîyê bûye. Lê belê dema em erdnigarîya kurdîaxêvan

(devokên Kurmancî) dinêrin herêma ku herê ji Tirk û Tirkîaxêvan dûr Hekarî/Behdînan e. Ji alîyê din dengê [y:]yê ne tenê devoka Hekarîyê da tê dîtin.

Ne piranîya kurdîaxivan lê hejmareke mezin li çendîn deverên cuda yên Kurdistanê û di nav qisekerên sê zaravayên cuda de Û-yê wek Ü-yê dibêjin. Di kurmancî de ev awayê dengkirinê di hin devokên rojhilatî de, bi taybetî li Behdînan lê herwiha li hin deverên Botan û Hekarîyan jî heye: “dûr / dwîr, kûr / kwîr, zû / zwî, mü / mwî” li cihê ”dûr, kûr, zû, mü” yên standard. Herwiha guherîna û-yê bi ü-yê bi ti awayî ne tenê bi Behdînan ve sinordar e. Heman dîyarde di kurdîya başûrî de jî anku di devokên feylî, kelhurî, kirmaşanî û hw[d.] heye” (Muhammed, 2016: 303, 312)

Her wekî Huseyin Muhammed (2016) jî dide dîyarkirin dengê [y:] yan jî guherîna dengê [u:]yê ji ber [y:]yê ve, ne tenê li devera Hekarîyê di gelek deverên din jî tê dîtin. Ji ber vê yekê mirov nikare bibêje di Devoka Hekarîyê da hebûna dengê [y:]yê bi bandora Tirkîyê ye. Di devoka Hekarîyê da li gorî rêjeya dengên [y:] % 0,8 tê bikaranîn.

- Di nava peyvê da dengê ü/[y:]

D.H	IPA	Standard
Kûr	[k ^h y:r]	kûr
Xezûr	[xæzy:r]	xezûr
Şüre	[ʃy:ræ]	sûr

Wek ji mînakên jor jî xuya dibe, di devoka Hekarîyê da dengê ü/[y:]yê bi awayekî sîstematîk ji cihê dengê [u:]yê digire, lê belê, ev bi sedansed wisa nîn e, lewra di devoka Hekarîyê da dengê [y:]yê di hin peyvên din ên cuda û taybet⁶ da jî tê pêşberî me û herwiha dengê [u:]yê jî bi berbelavî tê bikaranîn.

- Di dawîya peyvan da dengê “ü”/[y]

⁶ Di devoka Hekarîyê de dengê [y:]yê di navên taybet de jî cih girtiye:

Bêntûr: Gundek ji girêdayî navçeya Şemzînan
Aşût: Gundek ji girêdayî Colemêrgê
Müşan: Gundek ji girêdayî navçeya Geverê
Katûne: Gundek ji girêdayî navçeya Şemzînan
Müş: Bajarê Mûşê.
Süsyân: Gundek ji girêdayî navçeya Geverê
Tixûb: Gundek ji girêdayî navçeya Çelê.

D.H	IPA	Standard
Çulü	[tʃɔly:]	çilo
Sü	[sy:]	goşe
Persü	[p ^h ærsy:]	persîv

- Li serê peyvvan dengê ü/[y:]yê

D.H	IPA	Standard
Ûz	[y:z]	geveze
Ûris	[y:rɪs]	Ûris

[a:] <a>

Dengê [a]yê di Kurmancîyê da bi awayekî standard tê bikaranîn, ev deng ji awayê vebûna devê mirov dengê “vekirî” ye, ji aliyê kurtbûn-dirêjbûnê ve “dirêj” e û li gorî cihê derketinê, “paşderk” e. Di devoka Hekarîyê da li gorî datayên ku me ji bo rêjeya dengên bikaranî, dengê [a]yê di nava dengên din da % 7,92 tê bikaranîn ku di standardê da jî % 8,5 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û % 8,1 (Rizgar, 2012) e. Dengê [a]yê li serê peyvê, nava peyvê û dawîya peyvê tê bikaranîn, lê belê herî zêde di nava peyvê da cih digire. Herwiha di devoka Hekarîyê da ji ber ku qertafa tewangê/pirjimar “an” ku gelemperî “n” dikeve, li gorî standardê li dawîya peyvê bikaranîna [a:]yê zêdetir dibe.

- Di nava peyvê da dengê [a:]

D.H	IPA	Standard
Didan	[dɪda:n]	diran
Zelam	[zæɫa:m]	zilam/mêr
Zad	[za:d]	xwarin

- Di dawîya peyvvan dengê [a:]

D.H	IPA	Standard
seva/sava	[sæva:]	sava
cuda/cida	[dʒɔda:]	cuda
Xuda	[xɔda:]	Xweda

- Li serê peyvên dengê [a:]yê

D.H	IPA	Standard
avahî	[a:va:hi:]	avahî
asin	[a:sm]	hesin
aman	[a:ma:n]	firax

[æ] <e>

Dengê [æ]yê di Kurmancîyê da heman wek dengê [a:]yê bi awayekî standard tê bikaranîn. Ev deng ji awayê vebûna devê mirov dengê “vekirî” ye, ji aliyê kurtbûn-dirêjbûnê ve “kurt” e û li gorî cihê derketinê, “navderkî” ye.

Di standardê da bikaranîna wî dengê % 12,4 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û % 11,7 (Rizgar, 2012) ye. Dema em li gorî datayên vê xebata xwe li devoka Hekarîyê dinêrin bikaranîna vî dengê % 12,23 ye. Dengê [æ]yê di Kurmancîyê û herwiha di devoka Hekarîyê da dengê herê zêde tê dîtin e; tiştê ku di Kurmancîyê da bikaranîna vî dengê zêde dike ew e ku; ji bilî peyvên di nava;

- Qertafên nedîyarîyê: “ek”, veqetandek/yekjimar/mê “ek-e”
- Di fermanîyê da qertafa /yekjimar (*her-e, wer-e, bik-e*)
- Qertafa arastebûyîne⁷ (*got-e min, hat-e mal, bêj-e wê*).
- Cînavkên wek: ” *ez, ew, em, me, we, me, te*”

Di Kurmancîyê da dengê e/[æ] ji bilî hin cînavk “em, ew, ez, ev” û çend peyvên li serê peyvê pir kêr cih digire. Ev yek di devoka Hekarîyê da jî heman wisa ye. Ev deng dawîya peyvê jî cih digire lê herê zêde di nava peyvên da tê pêşberî me.

- Di nava peyvê da dengê e/[æ]

D.H	IPA	Standard
penîr	[pæni:r]	penîr
zêlam	[zæɫa:m]	mêr
der	[dær]	derî

⁷ Di devoka Hekarîyê da ev qertafe li gorî devokên din zêdetir tê bikaranîn.

- Di dawîya peyvvan dengê [æ]

D.H	IPA	Standard
xurme	[xormæ]	xurme
fire	[firæ]	fireh
kade	[k ^h a:dæ]	kade

- Li serê peyvvan dengê [æ]

D.H	IPA	Standard
enî	[æni:]	enî
exlewîk	[æxlæwi:k]	miqilk/tawe
erzan	[ærza:n]	erzan

[e:] <ê>

Dengê [e:]yê ji awayê vebûna devê mirov dengê “nîvgirtî” ye, ji aliyê kurtbûn-dirêjbûnê ve “dirêj” e û li gorî cihê derketinê, “pêşderkî” ye. Di rêjeya dengên Kurmancî ya standard da bikaranîna vî dengî % 5,7 (Bedir Xan & Lescot, 2011) û % 2,2 (Rizgar, 2012) e. Di devoka Torê da bikaranîna vî dengî % 9,03 ye. Dema em li gorî xebata xwe ji devoka Hekarîyê dinêrin % 8,1 e. Wek tê dîtin bikaranîna dengê [e:]yê hem di xebatên (Bedir Xan & Lescot, 2011) û (Rizgar, 2012) û hem di rêjeya devokan da wek hev nîne. Sedema vê yekê jî dibe ku ji datayan be. Zêde hebûna dengê [e:]yê di devoka Hekarîyê da:

- Qertafa veqetandek/nedîyar/yekjimar/nêr “ek-ê”⁸ – *hevalek-ê baş*
- Qertafa tewang/nedîyar/yekjimar/nêr-mê: “ekê”⁹ *hevalek-ê got*
- Daçekên “*bê, jê, lê, dê*”.¹⁰
- Qertafa arastebûnê: “ê” – *çûy-ê, hat-ê*,
- Forma “*got-ê/gût-ê*” ku di devoka Hekarîyê da bi awayekî zêde tê bikaranî

- Di nava peyvê da dengê [e]

⁸ Ev yek di standartê da “ek-î” ye.

⁹ Di standartê da ji bo mê “ekê”, ji bo nêr “ekî” ye.

¹⁰ Ev daçek di standartê da jî hene, lê di devoka Hekarîyê da zêdetir tîn bikaranî.

D.H	IPA	Standard
nêr	[ne:r]	nêr
çêl	[tʃe:l]	çêlek
gêj	[ge:ʒ]	gêj

- Di dawîya peyvan dengê [e]

D.H	IPA	Standard
mê	[me:]	mê
sê	[se:]	sê
xê	[xe:]	xwê

- Li serê peyvan dengê [e]yê

D.H	IPA	Standard
êvar	[e:va:r]	êvar
êdî	[e:di:]	êdî
êş	[e:ʃ]	êş

[ɪ] <i>

Dengê [ɪ]yê ji awayê vebûna devê mirov dengêkê “nîvgirtî” ye, ji aliyê kurtbûn-dirêjbûnê ve “kurt” e û li gorî cihê derketinê, “navderkî” ye. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dangan di standardê da % 10,2 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 8,9 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 7,92 ye. herwiha di devoka Torê da jî bikaranîna vî dengî % 10,66 e. Yanî di devoka Hekarîyê da bikaranîna vî dengî hem li gorî standardê hem li gorî devokên din kêmtir dîyar e. Çend sedemên vê yekê hene;

- qertafa pirjimariyê, ku di standardê da “-in”e û di devoka Hekarîyê da zêdetir caran wek “-en” tê bikaranîn.

K.S

D.H

(1)

a. *bik-in*

bik-en

b. *bib-in*

bib-en

c. *did-in*

did-en

- di Kurmancîya Standard da bikaranîna qertafa dema niha “di”yê, lê di devoka Hekarîyê da bi gelemperî “i” dikeve û “d” hin caran ber bi “t”yê ve diguhire û peyva bera xwe ve tê kelijîn.

	K.S	D.H
(2) a.	<i>Çi di-kî</i>	<i>çit key</i>
b.	<i>Ez di-kim</i>	<i>ez êt kem/ez 't kem</i>
c.	<i>Min di-kir</i>	<i>mit kir</i>

- heman wek qertafa dema niha; di qertafa fermanîyê “bi” da jî dengê [ɪ]yê dikeve û “b” hin caran wek “p” diguhire û peyva bera xwe ve dikeliye.

	K.S	D.H
(3) a.	<i>Çi bi-kim</i>	<i>çib kem</i>
b.	<i>Xwe bi-ke mirov</i>	<i>xweb ke mirûv</i>

- bikaranîna daçeka “bi”yê “i” dikeve û “b” peyva bera xwe ve dikeliye.

	K.S	D.H
(4) a.	<i>Ne bi Xudê</i>	<i>neb Xudê</i>
b.	<i>Pare da bi hêstir</i>	<i>pareb da hêstir</i>

Dengê [ɪ]yê di Kurmancîyê da herwiha di devoka Hekarîyê da ji bilî peyvên bêyanî li serê peyvan nahê dîtin.

- Di nava peyvê da dengê [ɪ]

D.H	IPA	Standard
kirin	[kɪrɪn]	kirin
dindik	[dɪndɪk]	dendik
kitik	[kʰɪtɪk]	kitik

- Di dawîya peyvan dengê [ɪ]

D.H	IPA	Standard
hemi	[hæmɪ]	hemû
çi	[tʃʰɪ]	çi

- Li serê peyvan dengê [ɪ]

D.H	IPA	Standard
------------	------------	-----------------

insan	[insa:n]	insan
idam	[ida:m]	idam

[i:] <î>

Dengê [i:]yê ji awayê vebûna devê mirov dengê “nîvgirtî” ye, ji aliyê kurtbûn-dirêjbûnê ve “dirêj” e û li gorî cihê derketinê, “pêşderkî” ye. Bikaranîna vî dengê li gorî rêjeya dengên di standardê da % 4 (Bedir Han & Lescot, 2011), û % 5,3 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 2,88 ye. Wek tê dîtin li gorî rêjeya dengên [i:]yê di devoka Hekarîyê da ji standardê kêmtir tê bikaranîn. Sedema vê ya herê berbiçav;

- qertafa tewangê ya nêrzayîyê ye ku di standardê da “î”, di devoka Hekarîyê da “i” ye.

	K.S	D.H
(5) a.	<i>Serdar-î got</i>	<i>Serdar-i got</i>
b.	<i>nan-î bixwe</i>	<i>nan-i bixwe</i>
c.	<i>here gund-î</i>	<i>here gund-i</i>

- qertafa yekjimar/kesê duyem “î” hin caran wek “y”, carinan jî wek “i” tê bikaranîn.

	K.S	D.H
(6) a.	<i>tu dizan-î</i>	<i>tu dizan-i</i>
b.	<i>tu dê çî bik-î</i>	<i>tu dê çî'b ke-y</i>
c.	<i>tu dê bixw-î</i>	<i>tu dê xû-y</i>

- Di nava peyvê da dengê [i:]

D.H	IPA	Standard
şîr	[ʃi:r]	şîr
bîr	[bi:r]	bîr
kirîn	[k ^h iri:n]	kirîn

- Di dawîya peyvan dengê [i:]

D.H	IPA	Standard
Nêrî	[ne:ri:]	nêrî
Sêwî	[se:wi:]	sêwî

Dînatî	[di:na:ti:]	dînatî
--------	-------------	--------

- Li serê peyvên dengê [i:]

D.H	IPA	Standard
înan/înanî	[i:na:ndm]	anîn
îza	[i:za:]	ezîyet

[o] <o>

Dengê [o]yê ji awayê vebûna devê mirov dengê “gilover” e, ji aliyê kurtbûn-dirêjbûnê ve “dirêj” e û li gorî cihê derketinê, “paşderkî” ye. Dengê [o]yê di devoka Hekarîyê da bi gelemperî ber bi dengê [u:]yê ve diguhire. Ev yek nahê wê wateyê ku di devoka Hekarîyê da dengê [o]yê nîn e, lê li gorî datayên ku me ji bo rêjeya dengên bikaranî ev deng [o] bi gelemperî wek dengê [u:]yê hat telafûzkirin. Li gorî rêjeya dengên di standardê da bikaranîna dengê [o]yê % 2,3 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 1,8 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 0,52 ye.

Di nava peyvê da dengê [u:]

D.H	IPA	Standard
goşt	[goʃtʰ]	goşt
koçer	[kʰotʃʰær]	koçer
borîn	[bori:n]	borîn

Di Kurmancîyê da dengê [o] li serê peyvê pir kêmtir tê dîtin.

D.H	IPA	Standard
oxir	[oɣır]	oxir
ode	[odæ]	ode
once	[ondzæ]	once

- Di dawîya peyvên hebûna dengê [o]yê gelemperî bi tewanga banglêkirinê ye.

D.H	IPA	Standard
bo	[bo]	bo
do	[do]	dew

ho [ho] wiha

[u:] <û>

Dengê [u:]yê ji awayê vebûna devê mirov dengê “gilover” e, ji aliyê kurtbûn-dirêjbûnê ve “dirêj” e û li gorî cihê derketinê, “paşderkî” ye. Wek ku me jor jî dîyar kir di devoka Hekarîyê da ev deng gelemperî nebe jî bi awayekî sistematîk ji ber dengê [y]yê ve diguhire, lê belê ji ber ku dengê [o]yê jî ji ber dengê [u:]yê ve diguhire, di rêjeya dengên da li gorî standardê bikaranîna dengê [u:]yê zêdetir dibe. Li gorî rêjeya dengên di standardê da bikaranîna vî % 2,5 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 1,2 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 3,79 e.

-Di nava peyvê da dengê [u:]

D.H	IPA	Standard
dûtin	[du:θm]	dûtin
mûm	[mu:m]	mûm
çûn	[tʰu:n]	çûn

- Di dawîya peyvan dengê [u:]

D.H	IPA	Standard
çû	[tʰu:]	çû

- Di Kurmancîyê da li serê peyvan dengê [u:]yê nahê dîtin, peyvên ku heyî jî ji derve ketne Kurmancîyê. Di devoka Hekarîyê da jî heman tişt heye lê ji ber guherîna dengê [o]yê ber bi dengê [u:]yê, ev deng li serê peyvan jî tê dîtin.

D.H	IPA	Standard
ûtî	[u:tʰi:]	ûtî

[o] <u>

Dengê [o]yê ji awayê vebûna devê mirov dengê “gilover” e, ji aliyê kurtbûn-dirêjbûnê ve “kurt” e û li gorî cihê derketinê, “navderkî” ye. Li gorî rêjeya dengên da di standardê da bikaranîna vî % 0,2 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 1,2 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 1,24 e. Dengê [o] yê di Kurmancîyê da herwiha di devoka Hekarîyê da li serê peyvan nahê dîtin.

(i) Di nava peyvê da dengê [ɔ]

D.H	IPA	Standard
gund	[gɔnd]	gund
guh	[gɔh]	guh
duhi	[dɔhi]	duh

(ii) Di dawîya peyvan dengê [ɔ]

D.H	IPA	Standard
du	[dɔ]	du
tu	[tɔ]	tu

1.1.3. Deng Guherîna Bidengan/dengdêran

Di devoka Hekarîyê da li ser herfên bideng, hem di nava xwe da hem jî li gorî standard û devokên din hin guherîn çêdibin. Dengê [u:]yê bi awayekê sistematîk li ber [y:]yê ve diguhire. (Hazim, 1994; Öpengin & Haig, 2014).

- (7) a. *kûr* [k^hu:r] *kûr* [k^hy:r]
 b. *dûr* [du:r] *dûr* [dy:r]
 c. *hûr* [hu:r] *hûr* [hy:r]

Di vê derê da guherîna sistematîk nahê wê wateyê ku ji cihê dengê [u:]yê her dem dengê [y:] tê bikaranîn, lê bi gelemperî dengê [y:]yê ji cihê dengê [u:]yê tê bikaranîn; lewra ku me jor jî dît dengê [u:]yê bi awayekî berbelav tê bikaranîn. Ji alîyek din ve, dengê [u:]yê di hin peyvan da û di nava herêmên Hekarîyê da ji ber dengê [i:]yê ve diguhire. Wek mînak, lêkera “bûn”ê li hin caran wek “bün”, hin caran jî wek “bîn” tê bikaranîn.¹¹ Çend mînak:

- (8) a. *bûn* [bu:n] *bün* [by:n] *bîn* [bi:n]
 b. *gûz* [gu:z] *güz* [gy:z] *gîz* [gi:z]
 c. *xûn* [xu:n] *xün* [xy:n] *xîn* [xi:n]
 d. *bûk* [bu:k] *bük* [by:k] *bîk* [bi:k]

¹¹ Di vê derê da mirov nikare diyarbike, li kîjan herêmê kîjan form tê bikaranîn; lewra ev form li gorî herêman naguhirin. Her sê form jî li hemû deverên Hekarîyê tên dîtin.

e. *şûr* [ʃu:r]

şîr [ʃi:r]

Ku me jor jî dît di devoka Hekarîyê da guherîna “û”yê ber bi “ü”yê di rêjeya dengan da li gorî standardê dengê [u:]yê kêmbûye, lewra di devoka Hekarîyê da dengê [o]yê jî bi gelemperî ji ber dengê [u:]yê ve diguhire. Herwiha ev guherîn ne tenê di devoka Hekarîyê da tê dîtin; “hevberî O ya kurmancî di kurdîya başûrî¹² de bi awayekî nêzîkî sistematîkî dengê Û [u:] heye: ”rûj = roj” (Muhammed, 312).

- (9) a. *got* [got^h] *gût* [gu:t^h]
b. *bo* [bo] *bû* [bu:]
c. *kor* [kor] *kûr* [ku:r]

Di devoka Hekarîyê da li ser dengê [æ]yê ji ber dengên *din* ve çî guherînên sistematîk nahên dîtin, lê di hin peyvan da dengê [æ]yê li gel dengên [a], [ɪ] û [e:]yê hin guherîn pêk tên ku ev guherîn hin caran ji dengê [æ]yê ber bi dengên [a], [e:] û [ɪ]yê ve ye û hin caran jî ji dengên [a], [e:] û [ɪ]yê ji ber dengê [æ]yê ve ye.

Ji dengê [ɪ]yê ber bi dengê [æ]yê

K.S	D.H
<i>bik-in</i>	<i>bik-en</i>
<i>bib-in</i>	<i>bib-en</i>
<i>ghiştin</i>	<i>gehiştin</i>

Ji dengê [e]yê ber bi dengê [ɪ]yê

K.S	D.H
<i>keç</i>	<i>kiç</i>
<i>tenê</i>	<i>tîné</i>

Ji dengê [a]yê ber bi dengê [æ]yê

K.S	D.H
<i>sava</i>	<i>seva</i>

¹² Mebest ji ”kurdîya başûrî” ne kurdîya Başûrê Kurdistanê ye lê kurdîya deverên başûrî yên hem Başûrê Kurdistanê û Rojhilata Kurdistanê ne. Ew devok li Başûrê Kurdistanê li bajarên wek Xaneqîn û Mendilî, li Rojhilata Kurdistanê jî li wilayetên Kirmaşan û Îlamê tên peyivîn (Muhammed, 312).

na *ne*

Ji dengê [æ]yê ber bi dengê [a]yê

K.S **D.H**

de *da*¹³

re *ra*

Ji dengê [æ]yê ber bi dengê [e:]yê

K.S **D.H**

yek *yêk*

Ji dengê [e:]yê ber bi dengê [æ]yê

K.S **D.H**

çêrîn *çerîn*

Li navçeya Geverê, bi taybetî cihên nêzîk hidûdê “Îranê”, di hin peyvan da dengê [a]yê li ber dengê “û”yê ve diguhire.¹⁴

av - *ûv*

nav - *nûv*

Dengê [i:]yê di devoka Hekarîyê da di hin rewşên cuda da ji ber dengên [i] û [e:]yê ve diguhire.

- Di tewang/yekjimar/nêr “î” ji ber “i”yê ve diguhir e.

K.S **D.H**

- (10) a. *Serdar-î got* *Serdar-i got*
b. *Pertew-î nanê w-î xwar* *Pertew-i nanê w-i xwar*
c. *W-î çî got* *W-i çî got*

- Tewang/nedîyar/yekjimar/nêr “ek-î” ji ber “ek-ê” ve diguhire.

- (11) a. *mirovek-î nezan* *mirovek-ê nezan*
b. *beranek-î zexim* *beranek-ê zexim*
c. *hespek-î belek* *hespek-ê belek*

¹³ Di hin devokên din ên Kurmancîyê da (serhed) jî ev yek wisa ye.

¹⁴ Di hin devokên Kurmancîyê da (Botan) dengê “a”yê ji ber “o”yê diguhire,

- Cînavka pirsyarîyê “*kî*” ji ber “*kê*” ve diguhire¹⁵

- (12) a. *K-î nan xwar* *K-ê nan xwar*
 b. *K-î hat* *K-ê hat*
 c. *Kiça k-î ye* *Kiça k-ê ye*

Di devoka Hekarîyê da carînan di navbera dengên [o] û [i]yê da jî hin guherîn çêdibin. Ev guherîn hin caran ji dengê [i]yê ber bi dengê [o]yê ve ye, hin caran jî ji dengê [o]yê ber bi dengê [i]yê ve ye.

ji dengê [i]yê ber bi dengê [o]yê

- (13) a. *dijmin* *dujmin*
 b. *dijwar* *dujwar*
 c. *çi* *çu*

ji dengê [o]yê ber bi dengê [i]yê

- (14) a. *tu* *ti*
 b. *gul* *gil*
 c. *guh* *gih*¹⁶

1.1.4. Herfên Bêdeng/Dengdar

Di Kurmancîya nivîskî da 23 herfên bêdeng tên bikaranîn, lê ji 23 herfan zêdetir deng hene; lewra çend herf ji cihê du dengan tên bikaranîn û hin deng jî hene ku ji Erebiyê ketine Kurmancî. Ev yek di devoka Hekarîyê da jî heman wisaye, lê di rêjeya dengan da ji aliyê kêmahî-zêdehiyê ve rewş diguhire. Yanî li gorî standar û devokên din hin deng devoka Hekarîyê da zêde tên bikaranîn û hin deng kêma tên bikaranîn.

Tîp	IPA	Mînak
b	[b]	<i>baş, bira, bes</i>
c	[dʒ]	<i>cûwan, camêr, cemed</i>
ç	[tʰ]	<i>çar, çi, çûn</i>

¹⁵ Ev yek her çend bi gelemperî wisabe jî mînakên forma “*kî*” jî tên dîtin.

-*Kî derê ye*

-*kîşki got*

¹⁶ Ev guherîn bi gelemperî nîn in, lê li devera Şemzînan gelek kes peyva “*gul*”ê wek “*gil*/[gɪɫ]” telafûz dikin. Li devera Gevê hin gund/Eşîr peyva “*guh*”ê wek “*gih*/[gɪh]” telafuz dikin. Hwd.

ç	[tʃ]	<i>çîya, çêl, çira</i>
d	[d]	<i>dar, dest, dem</i>
f	[f]	<i>firavîn, fenge, feqîr</i>
g	[g]	<i>gul, ga, gewr</i>
h	[h]	<i>hêk, hiş, hevîr</i>
h	[ħ]	<i>hilûk, hêştir, hemî</i>
j	[ʒ]	<i>jar, jêr, jar</i>
k	[k ^h]	<i>kanî, kes, kar</i>
k	[k]	<i>kew, kakil, kil</i>
l	[l]	<i>lêv, law, landik</i>
l	[ɫ]	<i>mal, nal, çal</i>
m	[m]	<i>mar, mere, mirin</i>
n	[n]	<i>nan, nêr, nav</i>
p	[p ^h]	<i>paş, per, pûş</i>
p	[p]	<i>piling, penîr, parî</i>
q	[q]	<i>qirêj, qer, qelûn</i>
r	[r]	<i>bira, erê, were</i>
r	[r]	<i>rast, rê, renî</i>
s	[s]	<i>sêv, ser, sîng</i>
ş	[ʃ]	<i>şîn, şêr, şe</i>
t	[t ^h]	<i>tinê, tewin, toz</i>
t	[t]	<i>tivir, tarî, tezî</i>
v	[v]	<i>vîyan, şev, evîn</i>
w	[w]	<i>welat, war, were</i>
x	[x]	<i>xurme, xem, xulam</i>

x	[ɣ]	<i>xerîb, moxel, exleyîk</i>
y	[j]	<i>yar, yek, dayîk</i>
z	[z]	<i>ziman, zanîn, zîrek</i>

Tablo 1.5. Konsonantên/Bêdengên Kurdî

CIH AWA	dulêvî	lêvî- didanî	pidûyî	paş- pidûyî	ban- devî	paş- devî	ser- gewrî	ziman- nokî	qirrikî
bêvilî	m		n						
seknî									
-bêlerz	p p̣ p̣		t t' ṭ ṭ			k ḳ		q	?
-bilerz	b ḅ		d			g			
xîşokên									
vizok									
-bêlerz			s ş	ş		x			
-bilerz			z ẓ	j		ḫ			
xîşokên									
nevizok									
-bêlerz		f		ç ç̣ c			h̄		h
-bilerz		v							
jenok			r ṛ						
tengav	w		l ḷ		y				

Çavkanî: (Muhammed, 2016: 11).

Husein Muhammed ji aliyê taybetîyên dangan ve herfên bêdeng ên Kurmancî wek di tabloyê da dîyare disenifine¹⁷. Di dengsazîyê da tîpên bêdeng li gorî taybetîyên xwe bi çend awayên cûda tene dabeşkirin; wek ji aliyê cihê derketinê, ji aliyê şeweya derketinê, li gorî asta derketinê... hwd. Em li vir yek bi yek li ser taybetîyên dangan ranewestin, em ê bi gelemperî di çarçoweya dengsazîya Kurmancîyê da di devoka Hekarîyê da bikaranînan dangan binirxînin.

¹⁷ Ji ber ku di Kurmancîyê da li ser rêzimanê termînolojîyek standart nîn e, di vê tabloyê da jî hin têgehên cuda tene dîtin.

B [b]

Tîpeke xwedî yek deng e. Cotlêvî, bilerz û bibend¹⁸ e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dengan di standardê da %3,7 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 4,4 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 4,74 e. Li serê peyvê, nava peyvê û dawîya peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>banewank</i>	<i>bab</i>	<i>simbore</i>
<i>bezîn</i>	<i>adab</i>	<i>cûbir</i>
<i>benîşt</i>	<i>şeb</i>	<i>şerbik</i>

Dengê [b]yê di zimanên Îranî da dengê guherbar e, herwiha di Kurmancî û devokên Kurmancîyê da jî hin mînakên guherînê xuya dibin. Guherbarîya dengê [b]yê bi gelemperî li gel dengên [w]/[v], [m] û [f]yê ye.

Di hin devokên Kurmancîyê da, di hin peyvên da herfên v/w di devoka Hekarîyê da “b” tê bikaranîn

- (15) a. *Bav – bab*
b. *Kitêv – kitêb*

Hind peyvên ku di erebîyê derbazî Kurmancîyê bûy, dengê [b] ber bi [f] guherîye. Di devoka Hekarîyê da, di heman peyvên da cihê [b]yê dengê [w]yê tê bikaranîn.

	K.S		D.H
(16)	a. - ”hefs” ji erebî ”هفس حبس”	-	<i>hews</i>
	b. - ”zeft” ji erebî ”زفت ضبط”	-	<i>zewt</i>
	(Muhammed, 2016: 75)		
	c. - heft	-	<i>hewt</i>

Herwiha di devoka Hekarîyê da gelek caran dengê guherbar [f]/[w] dikeve.

¹⁸ Wek têgeh ”bend”, ew e ku di dema derketina vî dengî da hewa pêşî bi temamî tê girtin/rawestandî û paşî bi yek car tê berdan.

- (17) a. *zeft* - *zewt* - *zat*
 b. *heft* - *hewt* - *hat*

Di Kurmancîyê da, di hin rewşên cuda da, [b] li ber [p]yê ve diguhire. Ev yek di devoka Hekarîyê da zêdetir dîyar dibe.

- (18) a. *bi wê, bi wi, bi wan* - *pê*
 b. *bi heva ve* - *p'heva ve*
 c. *ez bi şûl im* - *ezê-p şûl im*
 d. *biçûk* - *piçûk*

C [dʒ]

Tîpeka xwedî yek deng e. Arikî¹⁹, bêlerz û bibend e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dangan di standardê da % 0,7 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 0,9 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 0,38 e. Ev deng li gorî dengên din di Kurmancîyê da herwiha di devoka Hekarîyê da jî kêmtê bikaranîn. Li serê peyvê, nava peyvê û dawîya peyvê cih digire. Serê peyvê:

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>cûwan</i>	<i>pênc</i>	<i>bacan</i>
<i>camêr</i>	<i>merc</i>	<i>bincan</i>
<i>cindî</i>	<i>kinc</i>	<i>pancar</i>

Di devoka Hekarîyê da çu guherînên berbiçav ên deng [dʒ]yê li gel dengên din nahên dîtin.

Ç [tʃ^h]-[tʃ]

Tîpeka xwedî du deng e. Pêşarkî²⁰, bêlerz û bixiş²¹ e. Cudahîya herdu dangan; yek [tʃ^h] bipif e; “çil, çav, çalakî”, yek [tʃ] bêpif e “çem, çîya, çira”; yanî di bilêvkirina dengê [tʃ^h]ê da pif /helm devî derdikeve, lê bilêvkirina dengê [tʃ]ê bêpif û bêhelm çêdibe. Bikaranîna vê tîpê (herdu dangan) li gorî rêjeya dangan di standardê da % 0,8 (Bedir Xan

¹⁹ ”arikî”; yanî ku di dema gotina vî dengî da ziman bi arika/panika devî dikeve û bi wî awayî deng ji devî derikeve.

²⁰ ”pêşarikî”; yanî ku di dema gotina vî dengî da ziman bi pêşarika/pêşpanika devî dikeve û bi wî awayî deng ji devî derikeve.

²¹ Têgeha “bixiş” ew e ku di dema gotina vî dengî da ji ber awayê devî, deng xişinekê jî bi xwe ra derdixîne.

& Lescot, 2011), û 1,1 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 1,92 ye. Wek di rêjeya dengan da xuya dibe ev deng di devoka Hekarîyê da ji zêdetir standardê tê bikaranîn. Dema em ji dengguherînê dinêrin çî sedemên wisa dîyar nabin ku van dengan “[tʰ], [t]” di devoka Hekarîyê da zêde bikin. Herwiha di devoka Torê da jî bikaranîna vî dengî % 1,96 e, yanî di devoka Torê da jî ev deng ji bervajî standardê bi qasî devoka Hekarîyê tê bikaranîn.

Di devoka Hekarîyê da dengê [tʰ]yê li serê peyvê û dawîya peyvê cih digire lê dema dikeve nava peyvê bi gelemperî ji ber dengê [t]yê ve diguhire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>çawa</i>	<i>hirç</i> [hɪrtʰ]	<i>hirça reş</i> [hɪrtʰa: ræʃ]
<i>çandin</i>	<i>pirç</i> [pʰɪrtʰ]	<i>pirça reş</i> [pʰɪrtʰa: ræʃ]
<i>çê</i>	<i>püç</i> [pʰy:tʰ]	<i>püçatî</i> [pʰy:tʰa:ti:]

Di devoka Hekarîyê da dengê [t]yê li serê peyvê û nava peyvê cih digire lê dema dikeve dawîya peyvê bi gelemperî ji ber dengê [tʰ]yê ve diguhire.²²

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>çîya</i>	<i>kiç</i> [kɪtʰ]	<i>kiça min</i> [kɪtʰa: mɪn]
<i>çira</i>	<i>pirç</i> [pʰɪrtʰ]	<i>pirça reş</i> [pʰɪrtʰa: ræʃ]
<i>çêl</i>	<i>püç</i> [pʰy:tʰ]	<i>püçatî</i> [pʰy:tʰa:ti:]

Dema em ji alîyê guherbarîyê ve vî dengî dinêrin, di devoka Hekarîyê da hem di nava xwe da hem li gorî devokên din hin guherînên tîn dîtin. Ji wan guherînanan yek: “[tʰ]” li ber [k]yê ye. Ev yek jî bi taybetî di peyva pirsyarîyê “çî” da tê dîtin. Wek:

(19) a. *e(z) dê ku kem wêrê?* (27)

(çî)

b. *be ez ku lêb kem* (31)

(çî),

c. *ku lê hat* (19)

²² Ev yek di hemû dengên “bipif” da (ç, p, k, t) wisa ye.

(çi)

Ev guheherîn li hemû deverên Hekarîyê nahê dîtîn, bi taybetî Çel, Colemêrg û hin deverên Şemzînan ên nêzîk sînorên “Iraqê”, dertêpêş.

D [d]

Tîpeka xwedî yek deng e. Pêşarkî, bilerz û bibend e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dangan di standardê da % 4,8 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 3,8 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da %3,52 e. Di devoka Hekarîyê da li gorî standardê ev deng kêma xuya dike, sedema vê yekê, dengê [d]yê hin caran ber bi [t]yê ve diguhire. Ev deng li serê peyvê, nava peyvê û dawîya peyvê cih digire. Li gorî Muhammed²³ “di peyvên xwemalî yên xwerû da, li nav û dawîya peyvê, peydabûna dengê [d] di Kurmancîyê da bisinor e. Li nav û dawîya di peyvên xwemalî da [d] tenê li pey [n]yê cih digire.” Di Kurmancîyê da peydabûna dengê [d]yê bi gelemperî wisa be jî, gelek mînakên bervajî vê yekê hene; (didan, peyda, hêdî...).

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>dar</i>	<i>derd</i>	<i>bendik</i>
<i>didan</i>	<i>gund</i>	<i>girde</i>
<i>difîn</i>	<i>erd</i>	<i>şidandin</i>

Di devoka Hekarîyê da li ser dengê [d]yê guherînên berbiçav nahên dîtîn. Lê mînakên taybet hene ku tenê li ser peyvekê pêk tên. Wek mînak di hemû devokên Kurmancîyê da peyva “diran” di devoka Hekarîyê da wek “didan” e. Yanî di navbera dengê [d] û [r]yê da guherîn çêbûye.

Carinan [d] li ber [t]yê ve diguhire. Ev guherîn piranî li ser qertafan pêk tê. Di devoka Hekarîyê da qertafa dema niha “di” bi gelemperî ji lêkerê diqetîyê û peyva bera xwe ve tê zeliqîn û di vê zeliqînê da “i” dikeve û [d] jî hin caran wek xwe dimîne û hin caran jî ber bi [t]yê ve diguhire.

(20)

- a. Çi *di-kî* çit key
- b. Ez *di-çim* ez êt çim

²³ <https://zimannas.files.wordpress.com/2016/08/dengnasi1.pdf> .(Tikandin: 22.02.20).

c. *Ew nanî di-xwe ew ê nanit xwet*

Li devera Geverê hin kes qertafa dema niha “di”yê rasterast wek “ti” yê bikartînin.

- (21) a. *Ez tiçim*
b. *Wan tikir*
c. *Me tixar*

Di Kurmancîyê da [d]ya ku ji piştî [r]yê cih digire dikeve ev yek di devoka Hekarîyê da jî heman wisa ye, lê li devera Şemzînan hin cihên nêzîk sînore Îraqê heman wek zaravayên din ên Kurdîyê [d] neketiye. Wek:

(22) *bird(in), kird(in), mird(in), xward(in), zerd*

“- **kurmancî**: bir_(in), kir_(in), mir_(in), xwar_(in), zer

- **soranî**: bird(in), kird(in), mird(in), xward(in), zerd

- **zazakî**: berd(en), kerd(en), merd(en), werd(en), zerd

- **farisî**: bord(en), kerd(en), mord(en), xward(en), zerd” (Muhammed, 2016: 99)

F [f]

Tîpeke xwedî yek deng e. Lêvdiranî²⁴, bêlerz û bixiş e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dangan di standardê da % 0,8 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 0,9 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 0,13 ye. Di Kurmancîyê da hebûna vî dengî her çend li gorî dengên din kêm be jî; li serê peyvê, nava peyvê û dawîya peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>fire</i>	<i>puf</i>	<i>difin</i>
<i>fam</i>	<i>tuf</i>	<i>nifin</i>
<i>firavîn</i>	<i>kef</i>	<i>befir</i>

Dengê [f]yê di devoka Hekarîyê da dema ji pêşîya [t] cih digire li ber dengê “w”yê ve diguhire.

(23)

²⁴ Lêvdiranî; yanî di dema gotina vî dengî de diranên jorî dikevin li ser lêva jêrî û deng bi vî awayî tê telafûzkirin.

- | | |
|-------------------|----------------|
| a. <i>şikeft</i> | <i>şikewt</i> |
| b. <i>heft</i> | <i>hewt</i> |
| c. <i>mizgeft</i> | <i>mizgewt</i> |
| d. <i>keftin</i> | <i>kewtin</i> |

Li devera Gever û Colemêrgê di hin peyvvan da guherîna dengê [v]yê ber bi [f]yê tê dîtîn.

(24)

- | | |
|-------------------|----------------|
| a. <i>mirov</i> | <i>mirof</i> |
| b. <i>nevêtin</i> | <i>nefêtin</i> |

G [g]

Tîpeka xwedî yek deng e. Paşarkî²⁵, bilerz û bibend e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dengan di standardê da % 1,1 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 2,0 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 1,76 e. Li serê peyvê, nava peyvê û dawîya peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>gêj</i>	<i>sîng</i>	<i>agir</i>
<i>gotin</i>	<i>pelg</i>	<i>hingivîn</i>
<i>gir</i>	<i>hing</i>	<i>sergûn</i>

Di devoka Hekarîyê da li ser dengê [g]yê li gel dengên din çu guherîn nahên dîtîn. Lê li ser dengê [g]yê tişta ku bê dîyarkirin ew e: dengê [g]yê bi awayekî asayî li serê peyvê û nava peyvê cih digire, dema em dawîya peyvê dinêrin di Kurmancîyê da bi gelemperî dengê [g]yê bi dengê [n]yê ra wek: “ng” cih digire. (Muhammed, 2016: 112). Lê di devoka Hekarîyê da di dawîya dengê [r]yê jî tê dîtîn, wek “gurg, mêrg, berg”.

H [h], [ħ]

Ev tîp di Kurmancîyê da ji cihê du dengan tê nivîsîn. Ji wan dengan yek di IPAyê da wek [ħ] tê nîşandan. Li gorî Barry (2019) her çend jî wisa bê fikirîn ku ew peyvên dengên qirkî (faranjîal) di xwe da dihewînin yek ser ji Erebiyê derbazî Kurmancîyê bûne, ev yek bi gelemperî nerast e. Baryy (2019) dibêje ku lewra; 1- ev yek dibe ku di qertafên

²⁵ Paşarkî; yanî di dema gotina vî dengî da ziman xwe dikêşe paşiya arikê û deng bi vî awayî tê telafûzkirin.

dengên nizim û lêvî an jî dengên gulover û navîn di xwe da di hewînî xwe bi xwe derketibin meydanê. 2- dibe ku dengên qirkî bi hebûna rewşên mûsaît derketibin meydanê wek: [h]-[h̄]. 3- hebûna wan rewşên awarte jî divê di çarçoveya têkilîya dengên din ên qirkî da bîn nirxandin. Ev deng di alfabeya Erebkî da wek “ح” tê nîşandan û ji alîyê taybetîyên dangan ve pêşqirkî, bêlerz û bixiş e. Dengê din [h] li gorî dengê [h̄]yê dengê sivik û tenik e; qirkî, bi lerz û bixiş e. Bikaranîna van dangan li gorî rêjeya dangan di standardê da % 2.0 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 2,6 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 2,29 e.

Dengê [h]yê liserê peyvê, nava peyvê û davîya peyvê:

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>hewt</i>	<i>metih</i>	<i>behs</i>
<i>hemi</i>	<i>rih</i>	<i>behir</i>
<i>hişk</i>	<i>seh</i>	<i>sehir</i>

Dengê [h̄]yê liserê peyvê, nava peyvê û davîya peyvê:

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>hevîr</i>	<i>deh</i>	<i>mahîn</i>
<i>hijîr</i>	<i>meh</i>	<i>dohîn</i>
<i>hêvên</i>	<i>guh</i>	<i>têgehiştin</i>

Ji alîyê deng guherînê ve dengê [h]yê di devoka Hekarîyê da hin caran dikewe.

Wek:

(25)	-	<i>Pehn</i>	<i>pen</i>	<i>pan</i>
	-	<i>Tehl</i>	<i>tel</i>	<i>tal</i>
	-	<i>Bêhn</i>		<i>bên</i>
	-	<i>Cih</i>		<i>cî</i>
	-	<i>Fireh</i>		<i>fire</i>
	-	<i>Hesin</i>		<i>asin</i>

Hin caran jî dengê [h] ji peyvan tê zêdekirin.

(26)	a.	<i>Erê</i>	<i>he(r)ê</i>
	b.	<i>Ne erê</i>	<i>niherê</i>

J [ʒ]

Tîpeka xwedî yek deng e. Diranî, bilerz û bixiş e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dangan di standardê da % 1,7 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 0,9 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 1,17 ye. Li serê peyvê, nava peyvê û dawîya peyvê tê bikaranîn.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>jin</i>	<i>mij</i>	<i>nijinîn</i>
<i>jêr</i>	<i>gêj</i>	<i>bêjînk</i>
<i>jajî</i>	<i>dirêj</i>	<i>bijartin</i>

Di devoka Hekarîyê da hin mînakên guherîna dengê [ʒ]yê ji ber [ʃ]yê ve tîn dîtin. Ev guherîn jî pîranî li ser daçeka “ji” û gihaneka “jî”yê pêk tê.

- (27) a. *Xuda ji te razî bît* – *Xuda-ş te razî bît*
 b. *Ewi jî xar* – *ewi-ş xar*

K [k^h],[k]

Tîpa “k”yê jî di elfabeya Kurmancî da xwedîyê du dengên cuda ye. Cudahîya van dangan jî dîsa wek dengên tîpa “ç” yê yek [k^h] bi pif e, ya din [k] bêpif. Herdu deng jî; paşarkî, bêlerz û bibend in. Bikaranîna van dangan li gorî rêjeya dangan di standardê da % 3,7 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 3,6 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 4,1 e.

Di devoka Hekarîyê da dengê [k^h]yê li serê peyvê û dawîya peyvê cih digire lê dema dikeve nava peyvê bi gelemperî li ber [k]yê ve diguhire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>Kirs</i>	<i>dindik</i> [dɪndɪk ^h]	<i>dindika reş</i> [dɪndɪka: ræʃ]
<i>ker</i>	<i>nîsk</i> [ni:sk ^h]	<i>nîska reş</i> [ni:ska: ræʃ]
<i>kaş</i>	<i>nivîşk</i> [nɪvi:ʃk ^h]	<i>nivîşkê pezi</i> [nɪvi:ʃke: pæzi]

Di devoka Hekarîyê da dengê [k]yê li serê peyvê û nava peyvê cih digire lê dema dikeve dawîya peyvê bi gelemperî ji ber dengê [k^h]yê ve diguhire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>kil</i>	<i>dindik</i> [dɪndɪk ^h]	<i>dindika reş</i> [dɪndɪka: ræʃ]
<i>kirin</i>	<i>nîsk</i> [ni:sk ^h]	<i>nîska reş</i> [ni:ska: ræʃ]
<i>kakil</i>	<i>nivîşk</i> [nɪvi:ʃk ^h]	<i>nivîşkê pezi</i> [nɪvi:ʃke: pæzi]

Di devoka Hekarîyê da dengên [k] yê hem di nava deverên Hekarîyê da hem li gorî devokên din li ber hin dengên din ve diguhire.²⁶

[k] - [q]²⁷

(28) a.	<i>dîkil</i>	<i>dîqil</i>
b.	<i>kilav</i>	<i>qilav</i>
c.	<i>qutan</i>	<i>Kutan</i>
d.	<i>dakutîn</i>	<i>daqutîn</i>
e.	<i>zik</i>	<i>ziq</i>

L [l], [ɫ]

Tîpeke xwedî du deng e. Dengê [l], pêşarkî, bilerz û şimitok e. Dengê din [ɫ]; arikî, bilerz û şimitok e. Bikaranîna van dengên li gorî rêjeya dengên di standardê da % 2,5 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 3,1 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 2.0 ye. Di Kurmancîyê da bi gelemperî dengê [l]yê tê bikaranîn, lê dema em devoka Hekarîyê dinêrin, bi taybetî devera Şemzînan ji bandora zaravayê Soranî dengê [ɫ]yê jî li gorî deverên din zêde tê bikaranîn.

Dengê [l]yê li serê peyvê, nava peyvê û dawîya peyvê.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>lerizîn</i>	<i>gul</i>	<i>cilik</i>
<i>ling</i>	<i>dil</i>	<i>xulam</i>
<i>landik</i>	<i>mil</i>	<i>qelandin</i>

²⁶ Ji bo guherîna “k” û “ç”yê binêr r. 29

²⁷ Di devoka Hekarîyê da guherîna dengê “k”yê li gel dengê “q” bi gelmperî guherînek navxweyî ye, lê mirov nikare bibêje navçeyekê dengê “k” li navçeyek din ber bi dengê “q”yê ve diguhire, lewra di heman navçeyê da hin kes dibêjin “dîkil” hin kes dibêjin, “dîqil”, hin kes dibêjin “zik” hin kes wek “ziq” telafûz dikin.

Wek ku me got dengê [t̪]yê di Kurmancîyê da kê m tê dîtin, lê belê di devoka Hekarîyê da bi taybetî li devera Şemzînan di gelek peyvvan “*gul, dil, bila*” da dengê [l]yê wek dengê “[t̪]”yê tê telifûz kirin. Ev yek ji bandora zaravayê Soranîyê ye, lewra heman peyv di zaravayê Soranîyê da jî bi dengê “[t̪]”yê tîn telifûz kirin. Herwiha di Kurmancîyê da jî hin peyvên wek “*mal, çalakî, nalîn, sal*” bi dengê “[t̪]”yê tîn telifûz kirin.

Di devokên din ên Kurmancîyê da, di hin peyvvan da dengê [r]yê li ber dengê [l]yê ve diguhire

“**l**” – “**r**”

(29)	K.S.	D.H
	<i>a. wergirtin</i>	<i>welgirtin</i>
	<i>b. bira</i>	<i>bila</i>
	<i>c. gustîr</i>	<i>gustîl</i>

M [m]

Tîpeka xwedî yek deng e. Cotlêvî, difnî, bilerz û bibend e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dengan di standardê da % 3,1 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 2,6 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 2,8 e. Di Kurmancîyê da herwiha di devoka Hekarîyê da li serê peyvê, dawîya peyvê û nava peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>maş</i>	<i>em</i>	<i>hemi</i>
<i>mal</i>	<i>dem</i>	<i>çemandin</i>
<i>miherm</i>	<i>xulam</i>	<i>germahî</i>

Di zaravayên Kurmancîyê da di navbera dengê “m”yê li gel dengê “v”yê guherîn çêdibin. Di devoka Hekarîyê da jî mînakek wek; “*nimêj*” û “*nivêj*”ê tê dîtin.

N [n],[ŋ]

Tîpeka xwedî du deng e. Dengê yekemîn [n] pêşarkî, difnî,²⁸ bibend û bilerz e. Dengê din [ŋ] paşarkî, difnî, bibend û bilerz e. Di Kurmancîyê da dengê [ŋ]yê bi

²⁸ Mebest ji “difnî”(nasal: ñ/ŋ), deng ji cihê ku valahîya dev û difinê digehin hev de derdikeve ye.

gelemperî berîya dengê [g]yê tê bikaranîn, yan jî em dikarin bibêjin ji bandora dengê [g]yê dengê [n]paşarkî derdikeve. (deng, sîng, ling). Bikaranîna van dengan li gorî rêjeya dengan di standardê da % 7,4 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û % 8,0 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 5,1 e. Li gorî standardê di devoka Hekarîyê da kêmbûna van dengan ku emê jêr bibînin; (i) veqetandeka pirjimar “ên” ber bi “et”ê ve, (ii) ji tewanga pirjimarê “an”ê “n” dikeve.

Dengê [n]yê li serê peyvê, dawîya peyvê û nava peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>nan</i>	<i>dan</i>	<i>sindan</i>
<i>nedilkî</i>	<i>dîn</i>	<i>binewşî</i>
<i>nivîn</i>	<i>şîn</i>	<i>cindî</i>

Di devoka Hekarîyê da li ser dengê [n]yê guherîna herê berbiçav bi dengê [t]yê ra tê dîtin, ew jî tenê li ser qertafên veqetandekê yên pirjimarîyê “ên” “êt” pêk tê. Lê mirov nikare rasterast vê yekê wek dengguherînê şîrove bike, lewra dibe ku bikaranînek giştî a qertafa pirjimarîyê be, herwiha di kilasîkên Kurdî/Kurmancî da jî gelek caran qertafa veqetandeka pirjimarîyê wek “êt” tê bi kar anîn.²⁹

- (30) a. *heval-ên min* *heval-êt min*
 b. *mirov-ên min* *mirov-êt min*
 c. *zarok-ên wan* *zarok-êt wan*

Di devoka Hekarîyê da dengê [n]yê, gelek caran ji qertafa tewangê ya pirjimar dikewe.

- (31) a. *Çend mirov-an got* *Çend mirov-a got*

²⁹ Turk-*êt* ti bê mest û bêeman “ba” kêşe û tîr û keman
 Êriş bire qesra cebîn xelqê Tetarî rast û çep (Hekarî, 2011: 120)
 Mîn nedî hemrengê rûy-*êt* gul di nêv bax û rezan
 Leb ji leb ser ger helînê dê bibêjî mu’cizan
 Bêhişim Batey dinasim nexmesazê nexmeyan
 Macinê tûtîzeban û bulbilê baxê guran
 Ew dinasîtin newaya ‘endelibê Xoşebê (Adak, 2013: 389)

<i>b</i>	<i>Piçûk-an xwar</i>	<i>Piçûk-a xwar</i>
<i>c</i>	<i>Çûn zozan-an</i>	<i>Çûne zozan-a</i>

P [p],[p^h]

Ev tîp jî di alfabeya Kurmancî da xwedî du dengên cuda ye. Cudahîya wan dengane dîsa wek dengên tîpên “ç” û “k” yê yek [p^h] bipif e û ya din [p] bêpif. Herdu deng jî cotlêvî, bibend û bêlerz in. Bikaranîna van dengan li gorî rêjeya dengan di standardê da % 0,7 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 1,6 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 0,8 e.. Dengê [p]yê li serê peyvê, dawîya peyvê û nava peyvê cih digire, lê zêdeyî li serê peyvan tê pêşberî me. Herwiha [p]ya bipif [p^h], bi gelemperî nava peyvê nahê bikaranîn.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>per</i>	<i>hesp</i> [hæsp ^h]	<i>hespê reş</i> [hæspe: ræʃ]
<i>pirç</i>	<i>qesp</i> [qæsp ^h]	<i>qespa reş</i> [qæspa: ræʃ]
<i>peşk</i>	<i>dilop</i> [dɪɒp ^h]	<i>dilopa avê</i> [d ^h ɪɒpa: a:ve:]

Di devoka Hekarîyê da dengê [p]yê li serê peyvê û nava peyvê cih digire lê dema dikeve dawîya peyvê bi gelemperî ji ber dengê [p^h]yê ve diguhire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>parî</i>	<i>hesp</i> [hæsp ^h]	<i>hespê reş</i> [hæspe: ræʃ]
<i>pez</i>	<i>qesp</i> [qæsp ^h]	<i>qespa reş</i> [qæspa: ræʃ]
<i>penîr</i>	<i>dilop</i> [dɪɒp ^h]	<i>dilopa avê</i> [d ^h ɪɒpa: a:ve:]

Q [q]

Tîpek xwedî yek deng pêşqirkî³⁰, bêlerz û bibend e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dengan di standardê da % 0,8 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 1,4 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 0,26 e. Li serê peyvê, nava peyvê û dawîya peyvê cih digire.³¹

Dengê [q]yê li serê peyvê, dawîya peyvê û nava peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>qirêj</i>	<i>deq</i>	<i>çeqandin</i>
<i>qesp</i>	<i>şeq</i>	<i>dîqil</i>

³⁰ Mebest ji ”pêşqirkî” deng ji pêşiya qirikê derdikeve.

³¹ Ji bo guherîna dengê q-k: binêr. r. 35

qelandin

beq

çiqil

R [r],[r]

Tîpek xwedî du deng e. Dengê [r] arikî, bilerz û şimitok e. Dengê din [r] arikî, bilerz û bixiş e. Bikaranîna van dengan li gorî rêjeya dengan di standardê da % 6,2 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 7,4 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 5,9 e. Di Kurmancîyê da bi gelemperî li serê peyvê dengê [r]yê bicih dibe, yan jî em dikarin bibêjin dengê [r]yê li serê peyvê cih nagire. Ev deng [r] piranî di nava peyvê û dawîya peyvê dertê pêş. (Haig & Öpengin, 2015; Thackston, 2006; Gündoğdu, 2016b) Ev yek di devoka Hekarîyê da jî wisa ye, lê hin rewşên cuda jî hene.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>Rast</i> [ra:st ^h]	<i>birin</i> [bırın]	<i>bar</i> [ba:r]
<i>Renî</i> [ræni:]	<i>mirin</i> [mırın]	<i>girar</i> [gıra:r]
<i>Rejü</i> [ræzy:]	<i>erê</i> [ære:]	<i>mirar</i> [mıra:r]

Di devoka Hekarîyê da ji bilî devera Şemzînan, deverên din Colemêrg, Çel û Gever bi gelemperî nebe jî dengê [r]yê dema di nava peyvê û dawîya peyvê cih digire, bi awayekî pir tenik tê telafûz kirin ku hin caran wek dengê “[r]”³²yê tê berguhê mirov; ji ber ku ev deng nêzîk dengê “y”yê derdikeve, hin caran me dengê “y”yê bikaranî. Herwiha hin caran jî dengê [r]yê qet nahê bihîstin. Lê ji ber ku me bi gelemperî ev deng “[r]” neguherî û heman wek xwe nivîsî; di rêjeya dengan da li gorî standardê ferqek mezin nederket meydanê.³³

(32)	<i>a</i>	<i>Erê</i>	<i>eyê</i>	<i>eê</i>
	<i>b.</i>	<i>Mirîşk</i>	<i>mîyîşk</i>	<i>mîûşk</i>
	<i>c.</i>	<i>Sor e</i>	<i>so ye</i>	<i>so e</i>
	<i>d.</i>	<i>Were</i>	<i>weye</i>	<i>wee</i>

(33) Dayka wan em(r)ê xudê ki(r)ibü babê wan jî sax bü (25)

(34) He(r)du çûn, hespê min lu wê de(r)ê, ewê dî hate pêşyê. (6)

(35) Em gi(r)îyan kewtin wesa, bîst kutekan em bi(r)in meytebê qeyda me çêki(r)in(21)

³² https://tr.wiktionary.org/wiki/Dosya:Palatal_lateral_approximant.ogg

³³ Ji bo guherîna “l” û “r”yê binêr. r. 36

S [s]

Tîpeka xwedî yek deng e. Arikî, bêlerz û bixiş e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dangan di standardê da % 1,9 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 2,6 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 1,68 e. Di devoka Hekarîyê da li gorî standardê bikaranîna vî dengî kêma xuya dike, lê dema em ji devoka Torê dinêrin bikaranîna vî dengî ji devoka Hekarîyê jî kêmtir xuya dike. Ev deng li serê peyvê, dawîya peyvê û nava peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>simaq</i>	<i>kes</i>	<i>masî</i>
<i>sîr</i>	<i>bernîyas</i>	<i>asin</i>
<i>sor</i>	<i>kêmas</i>	<i>nasîn</i>

Ş [ʃ]

Tîpeka yek deng e. Diranî (alveolar), bêlerz û bixiş e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dangan di standardê da % 0,9 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 2,0 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 1,33 ye. Li serê peyvê, dawîya peyvê û nava peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>şêr</i>	<i>mêş</i>	<i>êşlig</i>
<i>şitil</i>	<i>maş</i>	<i>binewşî</i>
<i>şile</i>	<i>hewş</i>	<i>teşî</i>

Ji bo guherîna dengê “ş” li gel “j”yê binêr. r. 34

T [tʰ],[t]

Tîpeka xwedî du deng e. Cudahîya wan dengane dîsa wek dengên tîpên “[tʰ]/ [tʰ]” , “[k]/[kʰ]” û “[p]/[pʰ]”yê yek [tʰ] bipif e, ya din [t] bêpif. Pêşarkî, bêlerz û bibend e. Bikaranîna van dangan li gorî rêjeya dangan di standardê da % 2,3 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 3,4 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 6,17 ye. Ev deng di devoka Torê da jî % 2,60 tê dîtin.

Dema em li gorî standardê û devoka Torê li devoka Hekarîyê dinêrin dengên [t]yê pir zêde xuya dike. Sedema vê yekê;

- di devoka Hekarîyê da; veqetandek/pirjimar “ên” wek “êt” tê bikaranîn.

(36) *a heval-ên min heval-êt min*

<i>b</i>	<i>sêv-ên min</i>	<i>sêv-êt min</i>
<i>c</i>	<i>y-ên baş</i>	<i>y-êt baş</i>

- veqetandeka kesandinê/yekjimar kesê sêyem “-t” tê bikaranîn. Ev bikaranîn jî di kilasîkên Kurdî/Kurmancî da formek berbelav e.³⁴

(37)	<i>a.</i>	<i>ew diçe</i>	<i>ew diçît</i>
	<i>b</i>	<i>ew dibêje</i>	<i>ew dibêjît</i>
	<i>c</i>	<i>ew tê</i>	<i>ew têt</i>

- di qertafa dema niha “di” da, bi gelemperî “i” dikeve [d] hin caran wek xwe dimîne û hin caran jî ber bi [t]yê ve diguhire û peyva bera xwe ve dizeliqe.

(38)	<i>a</i>	<i>Ez dibêjim</i>	<i>Ezît bêjim/ ez êt bêjim</i>
	<i>b</i>	<i>Wî digo</i>	<i>Wît got</i>
	<i>c</i>	<i>Wê dixwar</i>	<i>Wêt xwar</i>

Ji van denga “t”ya bipif [t^h], bi gelemperî nava peyvê nahê bikaranîn û di nava peyvê da ber bi “t”ya bêpif [t] ve diguhire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>teji</i>	<i>dest</i> [dæst ^h]	<i>destê wê</i> [dæste: we:]
<i>trî</i>	<i>heşt</i> [hæʃt ^h]	<i>heştta got</i> [hæʃta: got ^h]
<i>tirs</i>	<i>ket</i> [k ^h æt ^h]	<i>ketin</i> [k ^h æt ^h ɪn]

Di devoka Hekarîyê da dengê [t]yê li serê peyvê û nava peyvê cih digire lê dema dikeve dawîya peyvê bi gelemperî ji ber dengê [t^h]yê ve diguhire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>tivir</i>	<i>dest</i> [dæst ^h]	<i>destê wê</i> [dæste: we:]
<i>tewir</i>	<i>heşt</i> [hæʃt ^h]	<i>heştta got</i> [hæʃta: got ^h]
<i>tenî</i>	<i>ket</i> [k ^h æt ^h]	<i>ketin</i> [k ^h æt ^h ɪn]

³⁴ Ew meyl ko dê bik-*it* we meftûn
Ew Leyl ko dê bik-*it* we Mecnûn
Mecnûn ko neb-*it* ‘edilê Leylê
Leylê ku dik-*it* bi Leyl meylê? (Xanî, 2004, 98)

V [v]

Tîpeka xwedî yek deng e. Lêvdiranî,³⁵ bilerz û bixiş e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dangan di standardê da % 2,8 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 1,9 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 0,77 e. Sedema kêmhêbûna vî dengî di devoka Hekarîyê da; bi taybetî ji devera Şemzînan û ber bi Colemêrg û Çelê ve, ev deng [v] ji ber dengê [w]yê ve diguhire. Ev guherîn bi heman awayê li gorî standardê di devoka Hekarîyê da dengê [w]yê zêde dike.

Dengê [v]yê li serê peyvê, dawîya peyvê û nava peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>veşartin</i>	<i>şev</i>	<i>hevîr</i>
<i>varik</i>	<i>heyv</i>	<i>hevî</i>
<i>vajîbûn</i>	<i>nav</i>	<i>navik</i>

Y [j]

Tîpeka xwedî yek deng e. Kokdiranî, şimitok û bilerz e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dangan di standardê da % 1,1 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 1,0 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 2,24 e. Di Kurmancîyê da ev deng di nava peyvên da pir kêmhêbûn cih digire, bi gelemperî di nava qertafan da û wek dengê kelijînê tê bikaranîn. Li gorî standardê di devoka Hekarîyê da zêde bûyîna dengê [j]yê;

- qertafa kesê sêyem “î” hin caran wek “y”/[j] diguhire.

(39)

<i>a</i>	<i>Tu çî dik-î</i>	<i>çit ke-y</i>
<i>b</i>	<i>Tu dixw-î</i>	<i>tu dixû-y</i>

- di dema borî da dengê [j]yê gelek caran ji pêşîya qertafa pirjimarîyê cih digire.

(40)

<i>a</i>	<i>Em diçûn</i>	<i>Em diçûyn</i>
<i>b</i>	<i>Em dê lê din</i>	<i>Em dê lê deyn</i>
<i>c</i>	<i>Ew dê nanî xwen</i>	<i>Ew dê nani xûyn</i>

³⁵ Diranên seri dikevin li ser lêva bini û deng bi vî awayî derdikeve.

- dema peyv bi herfên bideng diqedîyên tewanga nêrzayî “î/i” wek “y”/[j] tê bikaranîn

(41)	<i>a</i>	<i>xuda xwast</i>	<i>xuday xwas</i>
	<i>b</i>	<i>mela got</i>	<i>melay got</i>
	<i>c</i>	<i>se xwar</i>	<i>sey xwar</i>

- herwiha ku me di dengê “r”yê da jî dîyar kir, dengê “[r]” gelek caran ber bi dengê [ʀ]³⁶yê ve diguhire; ji ber ku dengê [ʀ] yê nêzîk dengê [j]yê derdikeve hin caran me dengê “y”yê bikaranî.

(42)	<i>a</i>	<i>Erê</i>	<i>eyê</i>	<i>eê</i>
	<i>b</i>	<i>Mirîşk</i>	<i>mîyîşk</i>	<i>mîîşk</i>
	<i>c</i>	<i>Were</i>	<i>weye</i>	<i>wee</i>

Li serê peyvê û nava peyvê berbelav tê bikaranîn, lê dawîya peyvê pir kêr cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>yar</i>		<i>lîyan</i>
<i>yek</i>		<i>neynik</i>
<i>yanî</i>		<i>dayîk</i>

Di devoka Hekarîyê da dengê [j] hin caran bi dengê [w]yê ra diguhire. Ev yek jî di peywira kelîjînê da pêk tê.

(43)	<i>a</i>	<i>birayê min</i>	<i>birawê min</i>
	<i>b</i>	<i>kayê bîne</i>	<i>kawê bîne</i>
	<i>c</i>	<i>em berawê gundê siniri da bîn</i>	(11)

- Dengê [j]yê gelek caran di peywira kelîjînê da dikewe.

(44)	<i>a</i>	<i>gayê me</i>	<i>gaê me</i>
	<i>b</i>	<i>birayê wi</i>	<i>biraê wi</i>
	<i>c</i>	<i>bayê qiblê</i>	<i>baê qiblê</i>

³⁶ https://tr.wiktionary.org/wiki/Dosya:Palatal_lateral_approximant.ogg (Erişim Tarihi: 15.07.2020).

X [x],[ɣ]

Tîpek xwedî du deng e. Dengê [x] pêşqirkî, bêlerz û bixiş e. Dengê din [ɣ] qirkî, bilerz û bixiş e. Bikaranîna van dengan li gorî rêjeya dengan di standardê da % 1,9 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 1,5 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 2,14 ye. Di devoka Hekarîyê da dengê [ɣ]ê li gorî dengê [x]yê pir kêmtir bikaranîn.

Dengê “[ɣ]”yê li serê peyvê, dawîya peyvê û nava peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>xerîb</i>	<i>bax</i>	<i>moxel</i>
<i>xurbet</i>	<i>qelex</i>	<i>exleyîk</i>
		<i>dûxawe</i>

Dengê “[x]”yê li serê peyvê, dawîya peyvê û nava peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>xulam</i>	<i>berx</i>	<i>şulxe</i>
<i>xelat</i>	<i>ax</i>	<i>dexil</i>
<i>xem</i>	<i>tax</i>	<i>kuxik</i>

W [w]

Tîpeka xwedî yek deng e. Lêvî, bilerz e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dengan di standardê da % 2,0 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 1,6 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 3,02 ye. Ku me di dengê [v]yê da jî dîyar kiribû di devoka Hekarîyê da sedema zêdebûna dengê “[w]yê; guherîna li gel dengê [v]yê ye.

Dengê “[w]”yê li serê peyvê, dawîya peyvê û nava peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>were</i>	<i>ew</i>	<i>ewe</i>
<i>war</i>	<i>kew</i>	<i>hewe</i>
<i>welat</i>	<i>law</i>	<i>cûwan</i>

Z [z]

Tîpeka xwedî yek deng e. Kokdiranî³⁷, bilerz û bixiş e. Bikaranîna vî dengî li gorî rêjeya dengan di standardê da % 0,8 (Bedir Xan & Lescot, 2011), û 1,8 (Rizgar, 2012) e û di devoka Hekarîyê da % 0,66 e.

Dengê “[z]”yê li serê peyvê, dawîya peyvê û nava peyvê cih digire.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>zer</i>	<i>güz</i>	<i>bizin</i>
<i>zêr</i>	<i>diz</i>	<i>mezin</i>
<i>zanîn</i>	<i>pez</i>	<i>dizîn</i>

[ʔ] eyn

Di Kurmancîyê da li hemberî dengê “[ʔ]” çî tîp nehatine dîyar kirin. Di erebîyê da ev deng wek “ع” û di Kurmancîyê da jî li serê dengên “[a],[æ],[i],[ɪ]” bi “apostrofê (’)” tê dîyarkirin. Ev deng bi gelemperî li ser û nava peyvê cih digire, dawîya peyvê nahê dîtin.

Serê Peyvê	Dawîya Peyvê	Nava Peyvê
<i>‘ezman</i>		<i>si’et</i>
<i>‘insan</i>		<i>cir’et</i>
<i>‘ar</i>		<i>t’ebet</i>

Dîftonga “xw”yê

Di devoka Hekarîyê da hebûna dîftonga “xwe”yê li gorî navçeyan diguhire. Li devera Şemzînan ev dîftong qet nahê dîtin, lê li Geverê ber bi Colemêrg û Çelê ve hebûna dîftonga “xw”yê xurttir dibe; lê dîsa jî li gorî standard û devokên din ên Kurmancîyê pir kêmtir tê bikaranîn. Di devoka Hekarîyê da bi gelemperî ji dîftonga “xw”yê dengê [w]yê dikeve û li gorî dengê ji dû [w]yê guherîn çêdibe;

- Dengê ji dû [w]yê [æ]be; [æ]ber bi [u:]yê ve diguhire.³⁸

(45) *a* *xwe* *xû*

³⁷ Mebest ji “kokdiranî” bilêv kirina vî dengî da, serê zimanî dikeve binê diranên jêr.

³⁸ Di vê derê da hin mînakê dengê “u”yê jî hene; Xuda, xudan...

b *xwelî* *xûlî*

c *xweş* *xûş*³⁹

- Dengê ji dû [w]yê [a] be; [a] heman wek xwe dimîne.

(46) *a* *xwar* *xar*

b *xwarza* *xarza*

c *xwandin* *xandin*

- Dengê ji dû [w]yê [i:]be; [i:] yan ber bi [y:]yê ve diguhire, yan jî wek xwe dimîne.

(47) *a* *xwîşk* *xüşk/xîşk*

b *xwîn* *xün/xîn*

- Dengê ji dû [w]yê [e:] be; [e:] wek xwe dimîne.

(48) *a* *xwê* *xê*

Di asta devokên Kurmancîyê da li ser dengnasîyê; cudahî, form û guherînên asta zaravayan da nebin jî gelek rewşên awarte tên dîtin. Dema em ji devoka Hekarîyê dinêrin li gorî devokên din ên Kurmancîyê û li gorî standardê wek devoka herê cuda tê dîtin. Me jî di vê beşê da li ser dengnasîyê sedan sed nebe jî di devoka Hekarîyê da rewşên awarte dîyarkirin. Ji van rewşên awarte yê herê ber bi çav; hebûna dengê [y:]yê ku bi gelemperî ji cihê dengê [u:]yê digire, kêmbûna dengê [o]yê ku bi gelemperî ber bi dengê [u:]yê ve diguhire, ji aliyê Geverê ber bi Colemêrg û Çelê ve ketina dengê [r]yê, bi taybêti li aliyê Şemzînan neyînîya dîftonga “xw”yê û dengê [v]yê. Hwd. hêj bi % rewşên awarte. Ji aliyê din me ji çar navçeyên Herkarîyê ji çar datayên ji hev cuda rêjeya dengên derêxist û li gorî vê rêjeyê di devoka Hekarîyê da hebûna dengên analîz kir. Ji bo mînak ji ber veqetandeka pirjimarîyê di devoka Hekarîyê da dengê [t]yê zêde dibe û dengê [n]yê kêmbûna dibe.

Herwiha li gorî navçeyan bi xebatên tengtir, dê gelek cudahîyên din derbêna pêş, lê kêmbûna zêde di devoka Hekarîyê da me cih da rewşên herê awarte.

³⁹ Di vê guherîna da hin caran dengê “o”yê jî derdikeve; xo, xolî, xoş...

BEŞA DUYEM

MORFOSENTAKS

2.1. NAVDÊR

Navdêr ew cûre peyv in ên ku li hemberî tişt, hêman an jî heyberekê tên. Navdêr ji gelek alîyan ve tên analîzkirin lê em dê di bin vî sernavî da li ser guherbarîya navdêran rawestin. Di Kurmancîyê da hin cûre peyv hene neguherbar in, yanî di her rewşê da wek xwe dimînin hin cûre peyv jî hene guherbar in. Navdêr jî ji wan cûre peyvên guherbar in ku li gorî hin taybetî û li gorî rewşê diguhirin. C.A. Bedir Xan guherbarîya navdêran di Kurmancîyê da bi zayend û mêjer (Bedir Xan, 1994: 32). Lê zimannasên nûjen guherbarîya navdêrên Kurmancî bi çend awayan nîşan didin: “Navdêr li gorî zayend, mêjer, dîyarî û rewşê/case diguhirin” (Haig, 2008: 205). Ev guherbarîye gelek caran tenê di hêman/qertafekê da xuya dibe, yanî heman hêman/qertaf hem dîyarî û nedîyarî, hem mêjer, hem zayend û hem jî rewşa navdêrê dide dîyarkirin. Emê di bin vê sernavê da li ser guherbarîya navdêrên Kurmancî û di devoka Hekarîyê da rewşên asayî û rewşên awarte rawestin û bi mînakên cihê analîz bikin.

2.2. ZAYEND

Di xebatên rêzimanê ên Kurmancîyê da û ji alîyê zimannasan ve di Kurmancîyê da zayenda rêzimanî bi gelemperî wisa ya hatîye te’rîfkirin. Navdêr bi awayekî xwezayî xwedîyê du zayendên “nêr-mê”tîyê ne. Cudahîya navdêran rasterast di ravekirin û tewanga yekjimarîyê da derdikeve pêş. Di rewşa pirjimarî da hemû cudahîyên zayendê ji meydanê radibin (Bedir Han & Lescot, 2004 rupel; Tan, 2011: rupel; Ocek, 2014: rupel; Haig & Öpengin, 2015).” Ji alîyê din ve zayenda bîyolojîk ku zayenda civakî ye nêrtî-mêyîtîya tiştên jîndar dide dîyarkirin. Di xwezayê de her cure jîndar bi nêr û mê wek xwedîyê du zayendan cih digire. Her wiha “hin caran zayenda rêzimanî li gorî wateyê li peyvan tê barkirin: peyvên wek “mam”, “mehîn” ku xwedîyê zayendeke bîyolojîk in, zayenda rêzimanî jî heman li gorî wê zayenda bîyolojîk ji peyvan tê barkirin.” (Haig & Öpengin, 2015: 16). Di vê beşê da em dê bi gelemperî li ser zayenda rêzimanî rawestin. Gelo di devoka Hekarîyê da “zayend çawa dîyar dibe?”, rewşên asayî û bi taybetî jî rewşên awarte bi mînakan bidin dîyarkirin.

2.2.1. Zayenda Rêzimanî

Di Kurmancîyê da her tiştêk/peyvek xwedîyê zayenda rêzimanî ye ev zayend di “beşên axaftinê yên mîna navdêr û cînavkan da derdikeve pêş (Tan, 2011: 55).” Lê zayenda peyvan di rewşa xwerû de nedîyare. Dema em dibêjin “dar”, “ber”, “der”, “guh”, “dest”, “çav”, “kitêb”, “qelem”, “hesen”, “mîrza”, “zîn”, “gul” hwd. ji van peyvan her yek xwedîyê zayendekê ye lê di rewşa xwerû de em nizanin ka zayenda wan peyvan çi ye. Zayenda rêzimanî ya peyvan yanî nêr û mêtîya wan bi du awayan tê dîyarkirin; yek bi veqetandekê (îzafe/ravekê) yek jî bi tewangê.

Di Kurmancîya standard⁴⁰ da qertafên zayenda rêzimanî (qertafên veqetandek û tewangê) di rewşa dîyar û nedîyar da bi vî awayî ne. (tab. 6.)

Tablo 2.1. Di Kurmancîyê Da Qertafên Zayenda Rêzimanî.

	Yekjimar				Pirjimar	
	Mêza		Nêrza		Dîyar	Nedîyar
	Dîyar	Nedy r.	Dîyr	Nedyr .		
Veqetandek	-a	-e	-ê	-î	-ên	-ine
Tewang	-ê		-î		-an	
Bang lê kirin	-ê		-o		-în/-ino	

Çavkanî: Haig-Öpengin (2014)

Veqetandek: yekjimar/nêr-“ê”, yekjimar/mê-“a”, pirjimar: *ên*

(49) a. Çîyay-ê bilind

b. Jin-a delal

c. kew-ên nêr (Bedir Xan, 1994: 43)

⁴⁰ Ez di xebata xwe da Kurmancîya standart di çarçoweya van berheman da dinirxînim:
Bedir Xan, Celadet Alî (1994) - Bingehên Gramera Kurdmancî,
Bedir Han, C.- Lescot, R., (2001). Kûrtçe Grameri (Kurmanci Lehçesi),
Tan S. (2011)– Rêzimana Kurmancî,
Haig, G. & Öpengin, E.(2014). Gender in Kurdish Structural,
Haig, G. & Öpengin, E.(2015). Kurmanji Kurdish in Turkey: structure, varieties, and status,
Ocek, N. (2014). Waneyên Rêzimana Kurmancî.

Veqetandeka nedîyar: yekjimar/nêr-“*ek-î*”, yekjimar/mê-“*ek-e*”, pirjimar: *ine*

- (50) a. hesp-*ek-î* delal hat
b. mehîn-*ek-e* delal hat
c. hesp-*ine* delal hatin (Bedir Xan, 1994: 46-47)

Tewang: nêr-“*î*”,mê- “*ê*”, pirjimar: *an*

- (51) a. Rojhat-*î* xanî ava kir.
b. Şoreş li dibistan-*ê* ye
c. Şivan-*an* pez çêrand (Ocek, 2014: 59,60,61)

Tewanga nedîyar: yekjimar/nêr-“*ek-î*”, yekjimar/mê-“*ek-ê*”, pirjimar: *-in-an*

Her çend jî Haîg û Öpenginî di vê tabloyê (Tab.6) da cih nedabin qertafa pirjimara nedîyar “in” di gelek devokên Kurmancîyê da ji bo pirjimara nedîyar qertafa “in”ê tê bikaranîn, herwiha Celadet Alî Bedirxan û di gelek pirtûkên din ên rêzimanê da jî ev qertaf wek standard a hatî dîtin.

- (52) a. Heval-*ek-î* ji min re got
b. Gul-*ek-ê* bide min
c. Heval-*in-an* îşev gelekî xebat kir (Tan, 2011: 91-92)

Tewanga bang lê kirinê: nêr-“*o*”, mê-“*ê*”, pirjimar: *-în-ino*

- (53) a. Xort-*o*
b. Dotmam-*ê*
c. Xwişk-*ino* (Bedir Han- Lescot, 2001: 97)

Di devoka Hekarîyê da bi gelemperî nebe jî zayend wek Kurmancîya standard derdikeve pêş. Hin xebatên ku li ser devoka Hekarîyê hatîye kirin di xebata Rheayî da ji bo zayenda Kurmancîyê (mebest devoka Hekarîyê) dibêje ku “Di Kurdîyê da ‘zayend’ jî bilî nav/peyvên cuda ji bo ajel û insanan û ji bilî bikaranîna peyvên “nêr-mê” zayend

dîyar nabe” (Rhea, 1869: 120). Di berdewamê da Samuel A. Reha ji bo guherbarîya navdêran dibêje di Kurdîyê da navdêr tenê di yek rewşê da diguhirin; ew jî bi rêya “ê” û “a”yê çêdibe, lê vê guherbarîyê bi zayendê ve girênade. Ev jî vê yekê dide dîyarkirin ku li gorî Rheayî di Kurdîyê/D.H da ji bilî zayenda bîyolojîk zayenda rêzimanî nîn e. Me di tabloya jor da (tab. 6) qertafên zayenda rêzimanî ên Kurmancîya standard dabûn dîyarkirin. Di vê tabloya jêr da (tab. 7) jî di devoka Hekarîyê da qertafên zayenda rêzimanî nîşan dane. Wek tê dîtin hin cihan da tenê deng diguhirin, lê hin cihan da hin qertaf qet nehatine nîşandan. Em ê di beşên jêr da; hem li ser rewşên wekhev û hem jî li ser rewşên avarte rawestînin û mînakên cûr bi cûr bi kitekit analîz bikin.

Tablo 2.2. Di Devoka Hekarîyê da qertafên zayenda rêzimanî

	Yekjimar				Pirjimar	
	Mêza		Nêrza		Dîyar	Nedîyar
	Dîya r	Nedyr.	Dîyr	Nedy r.		
k Veqetande	-a	-e	-ê	-ê	-êt/êd	-
Tewang	-ê	ê	-i	ê	-an/a	
Bang lê kirin	-ê		-o		-	

Veqetandek: yekjimar/nêr-“ê”, yekjimar/mê-“a”, pirjimar: êt/êd

(54) a. xelk-ê colemêrgê

b. miraz-a me

c. kurtan-êt dewara (19)

Veqetandeka nedîyar: yekjimar/nêr-“ek-ê”, yekjimar/mê-“ek-e”, pirjimar:

(55) a. Kovl-ek-ê dara

b. Pîr-ek-e miroxwer (10)

Tewang: nêr-“î”, mê- “ê”, pirjimar: a/an

- (56) a. Kes şeytan-*i* dirohîntir nebî
 b. Kiçk-*ê* goti ez hest kem
 c. Wezîr gel herdu xulam-*a* hatnewe (16)

Tewanga nedîyar: yekjimar/nêr-“*ek-ê*”, yekjimar/mê-“*ek-ê*”, pirjimar: *-an*

- (57) a. çûne çolem-*ek-ê*
 b. heta rast-*ek-ê* çûn (27)
 c. *hind mirov-an*

Tewanga bang lê kirinê: nêr-“*o*”, mê-“*ê*”, pirjimar: *-în/-ino*

- (58) Bêtê bab-*o* hun çi şolt ken (27)
 (59) Gût day-*ê* şevêk rojekan mi quran xitim kir (27)

2.3. RAVEK/EZAFE

Ravek, ji kome navên du yan jî ji duyan zêdetir peyvên ku ji hev ve girêdayî re tê gotin. Ji bo ravekirina peyvekê pêdivî hin peyvên din heye, ev yek jî bi rêya qertafên veqetandekê çêdibe. Qertafên veqetandekê “hem wek qertafên bi girêdayî peyvê hem jî di rewşa serbixwe da dertên pêş.” (Haig & Öpengin, 2015: 22) Ew qertaf di rewşa yekjimar da zayenda peyva raveberê jî dîyar dikin lê qertafa pirjimarîyê zayendê radike. Di pirtûkên rêzimanê ên kurmancîyê da qertafên veqetandekê wek: *-a* mê, *-ê* nêr û *-ên* pirjimar ên hatîye dîyarkirin.

- | | | | |
|------|------------------------|--------------------------|-----------------------|
| (60) | a. <i>gul-a sor</i> | <i>kurmancîy-a başûr</i> | <i>ax-a me,</i> |
| | b. <i>dil-ê min</i> | <i>ziman-ê kurdî</i> | <i>çîyay-ê simbil</i> |
| | c. <i>heval-ên baş</i> | <i>nivîs-ên xweş</i> | <i>mirov-ên delal</i> |

Di van mînakên de zayenda peyvên raveber “gul, kurmancî, bûk, ziman, dil, çîya” bi ravekirinê ên dîyar bûyî. Dema ev peyvên raveber bi tenê serê xwe tînin bilêvkirin zayenda wan dîyar nabe. Lê bi ravekirinê em dibînin ku zayenda peyvên *gul*, “kurmancî” û “ax” mê ye. Zayenda peyvên “ziman”, “dil” û “çîya” jî nêr e. Di hersê ravekên “heval-ên baş”, “nivîs-ên xweş” û “mirov-ên delal” da ji ber ku raveberê qertafa pirjimarîyê girtî ye, zayend nedîyar e.

Her wekî di mînakên jor da dîyar e; mînaka (62) ravekên “giranety-a wi” û “hesp-ê wi” giranetî mê ye, hesp nêr e. Lewra peyva “giranetî” bi alîkarîya veqetandeka /-a/ û peyva “hesp” jî bi alîkarîya veqetandeka /-ê/yê yên hatî ravekirin. Heman tişt di mînakên din da jî dîyare ku li gor zayenda rêzimanî peyvên mê bi /-a/ û peyvên nêr jî bi /-ê/yê yên hatî ravekirin. Wek tê dîtin zayenda bi veqetandekê heman wek Kurmancîya standard pêk tê. Ku me jor da dîyarkirin û di mînakan da jî dîyar e veqetandeka pirjimarîyê wek “êr” ya hatî bikaranîn.

Di devoka Hekarîyê da her çend veqetandeka yekjimar ji alîyê zayendê ve heman wek ya standard be jî, hin tiştên awarte hene ku divê mirov bide dîyarkirin.

- (i) Di nava civaka Hekarîyê da di formên rêzimanî da ji mezinan li ber civanan ve hin guherîn çêdibin. Yek ji wan guherînan jî zayend e ku, di nava kesên mezin da zayend çiqas jî bi awayekî xurt bê parastin, di nava civanan da zayend cudahîya xwe hêdî hêdî winda dike. Em dikarin bibêjin ev guherîn ji bandora Tirkîyê ye, ji ber ku bi awayekê dijber kesek çiqas tirkîaxêv be, dema Kurmancî diaxive zayenda rêzimanî ew qas tevlihev dike. Ev guherîna zayendî li gorî tewangê di veqetandekê da kêmtir e lê di nava civanan da car caran mirov li hemberî tevlihevkirina zayenda bi veqetandekê tê.

Wek mînak: peyva “*ser*” di devoka Hekarîyê da ji alîyê zayendê ve peyveke nêrza ye. Ê dema kesekê/a emirborî vê peyvê rave dike, bê fikirîn wek: *Ser-ê min têşît*. rave dike. Lê di nava civakê da temen çiqas piçûk bibe, tirkî axivtin jî ew qas zêde dibe. Ev yek ji alîyê zayendê ve tevlihevîyekê derdixîne meydanê.⁴¹ Yanî mirov bi awayekî asayî li hemberî “*ser-a min têşît*” tê.

- (66) a *ser-a min têşît*.
 b *bab-a min hat*
 c *xwîn difn-ê wê hat*

- (ii) Ji alîyê zayendê ve gelek peyv hene ku di devoka Hekarîyê da zayenda wan bervajî devokên din ên Kurmancîyê ye. Ji ber vê yekê veqetandek jî li gorî

⁴¹ Ji bandora têkilîya tevlihev a duzimanîyê rêwşên wisa derdikevin meydanê.

zayenda peyvvan diguhirin û di vê derê da tevlihevîyek dikeve navbera devoka Hekarî û devokên din.

Mînak: “sîng”, di devoka Hekarîyê da peyveke xwedî zayenda nêr e, lê belê di devokên din ên Kurmancîyê da ev peyv wek mê derdikeve pêşîya me. Yanî peyva “sîng” di devoka Hekarîyê da bi “-ê”yê û di devokên din da bi “-a”yê tê ravekirin.

Devoka Hekarîyê	Kurmancîya Standard⁴²
<i>sîng-ê min</i>	<i>sîng-a min</i>
<i>qelem-ê reş</i>	<i>qelem-a reş</i>
<i>beden-ê mirov</i>	<i>beden-a mirov</i>
<i>keny-a min</i>	<i>ken-ê min</i>
<i>hesab-a min</i>	<i>hesab-ê min</i>

2.3.1. Raveka Zincîrî

Di raveka zincîrî da ji yekê zêdetir raveber û ji yeke zêdetir raveker cih digirin û zayenda hemû hêmanên ku di erka raveberê da ne, xuya dibe.

(67) Selîm-ê biray-ê Salhay-ê hersê hatibîn. (17)
 Veq.N Veq.N

(68) Nihe miraz-a me keçk-ê mast-ê çêlan e. (19)
 Veq.M Veq.N Veq.N

(69) Deng-ê sey-êt êkmal-a seri yê tête mi. (1)
 Veq.N Veq.P Veq.M

Not:

Qertafên “veqetandekê” ku hin caran ne wek qertaf bi awayekî serbixwe di hevokê da cih digirin. Haig û Öpengin (2015) vê hêmanê wek “Free or demonstrative ezafes/

⁴² Di vê derê da mebest ne tenê Kurmancîya standart e, mînak ji devokên din ên Kurmancîyê hatine nîşan dan.

Veqetandekên serbixwe an jî raveker⁴³ bi nav diken. Lê Celadet Alî Bedir Xan vê hêmanê li gorî rêzimana Firansîzî dinirxîne û rasterast wek cînavk dibîne:

Gramera frensîzî dibeje ko zimanê frensîzî veqetandekên xwe ji pronaveke latînî girtine. Gelo me yên xwe, ev bejeyên hûr, ji kû girtine? Li gora tedqîqatên ko heta niho min çêkirine, me jî veqetandekên xwe ji hin pronavan girtine, lê ne ji pronavine bîyanî, ji pronavine xwe. Belê, veqetandekên me en binavkirî ji pronavine me ên îşarkî bi der hatine. Hervvekî pêşdetir de bête gotin "yê, ya, yên" pronavine îşarkî ne û veqetandekên me ên binavkirî ji wan hatine pê. Di esl û bingehî de gava ev pronav diketin pêşîya navderekê û dibûn rengdêrine îşarkî "di" yek dikete navbera wan û navderê. Mesela gotina "Hespê Soro" di eslê xwe de "Hespê di Soro" (1) ye. Bêdîro, pronavên "yê, ya, yen" di şiklê "ê, a, ên" de bûne veqetandek û bi paşîya navdêran ve zeliqîne. (Bedir Xan,1994:50)

Dema em ji devoka Hekarîyê dinêrin, ev hêman ji bilî peywira xwe ya ravekirinê; hin caran taybetîyên cînavkan didin dîyar kirin û hin caran jî wek dîyardeyek demê tên pêşberî me. Lê çî di erka cînavkan da bin û çî jî di erka dîyardeyên demê da bin, bi peywira xwe ya *veqetandekbûnê* her dem zayend û mêjera hêmana ku ji têkildar e didin dîyar kirin.

Ji van herdu rewşên cuda;

- (i) Cînavkbûna vê hêmanê; di hevokê da heman wek cînavkan pêk tê, yanî ev hêman cihê navdêran digirin û hemû taybetîyên wan diêxin serxwe, lê belê dema ev hêman erka cînavkan digirin ser xwe, ji veqetandekbûna xwe naguhirin, yanî di heman demê da erka veqetandekê jî diînin cih. Ji ber vê yekê mirov nikare vê hêmanê rasterast wek cînavk bibîne. Lê belê Celadet Alî Bedir Xan (1994) van hêmanan wek cînavkên îşarkî bi nav dîke û van wek bingeha qertafên veqetandekê dibîne. Qanatê Kurdo (1981) wek "cînavkên eleqetîyê (peyvendîyê)" bi nav dîke û dibêje: "eleqetî û peyvendîya navan (xeberan) li cumleda nîşan dikin û wan bi hevra girê didin."(Kurdo: 72;). Ev hêma di pirtûkên rêzimanê da jî wek "cînavkên xwedîtîyê" tên binavkirin.

⁴³ Ez jî di vê xebata xwe da vê hêmanê wek binavkirina Haig-Öpengin bikartînim. Lewra ev hêman hemû taybetîyên (mêjer, zayend) veqetandekê li ser xwe digire.

bingeha xwe ji qertafên veqetandekê ne, lê li gorî vê avanîyê, ne wek veqetandek, zêdeyî wek parçeyek lêker/pêveberê hereket dikin” (Haig, 2008: 269). Di berdewamê da Haig (2008) ji MacKenzie (1961) neqil dike, ku Kenzie van hêmanan rasterast wek dîyardeyên *rewşa berdewamîyê* dibîne. Mînakên ku Haig ji bo vê rewşê dide;

- (74) a “az-ê mûsafir im” (MacKenzie 1961, neqil Haig, 2008: 269)
 b “Xatûn-a min **ya** l hêvî-ya te” (Blau 1975, neqil Haig, 2008: 269)
 c “du sêv **wêt** livirê he-in” (Haig, 2008: 269)

Ev mînakên ku Haigî day her çend ji hevokên lêkerî nebin jî bi van hêmanên “**ê, ya, wêt**” dema niha didin dîyarkirin. Wek; “ez **vê gavê** mûsafir im” (a), “xatûna min **a niha** hêvîya te ye” (b), “du sêv **vê gavê** li virê hene” (c).

Ayhan Geverî (2017) di gotara xwe ya binavê “*Sê Tabloyên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî Yên Derheq Kêşana Lêkeran de*”, di “*Tesrîfa Fi’îlan -1*” ya Rehmî Hekarî da wê hêmanê bi awayê “*wê*” û rasterast bi erka dema niha da dide dîyarkirin. Geverî ku ji Rehmî Hekarî neqil dike vê hêmanê wek cudahîyekê di navbera dema niha û dema fireh da dide dîyarkirin û van mînanan dide:

Dema fireh	Dema Niha
Dibezim	wê dibezim
Didim	wê didim
Dikim	wê dikim
Diêxim	wê diêxim (rûpela xebatê...)

Geverî di dewamê da dibêje ku “Ev ferqa dema fireh û dema niha di gelek lehçeyên kurmançî de nîne, lê kurmançîya Hekaryan û Badînî de û herwiha li nav şairên edebîyata kurdî ya klasîk de heye (Geverî, 2017: 150-151).” Ji Edebîyata Klasîk a Kurdî çend mînanan dide, yek ji wan mînanan:

“**Wê diket** mexlete her dem bi herîfan bi cedel

Bi du caman ji xwe bin sîretê Ebyedwesiwas” (Geverî, 2017: 151).

Dema îro em ji devoka Hekarîyê dinêrin bi gelemperî nebe jî ji cihê qalibê “wê”yê û di heman erkê da qalibên “ê-yê/a-ya” tên bikaranîn. Ev hêman xwe li gorî zayenda kirdeyê diguhere, heger kirde nêrza be hêman wek “ê/yê” lê heger kirde mêza be wek “a/ya” diguhire. Lê belê ew qalib li herêma Şemzînan li ber herêma Çelê ve bi gelemperî nebe jî hin mînakên zayend guherîna li ber nêrzabûnê tên dîtin. Yanî kirde bi peyvek mêza be jî wê hêmanê wek zayenda nêrza dide dîyarkirin. Ev pirsên jêr di nava herêmên Hekarîyê da ji çend kesên cuda hatin pirsîn. :

- (75) a. *Befr a têt*
 b. *Dayka min a têt*
 c. *Babê min ê têt*

Di wan mînakan da hêmana “a-ê” li gorî zayenda tiştê hereket dîke diguhire. Mînaka (a) da jiber ku “*befir*” peyvek mêza ye “a” hatîye bikaranîn. Di mînakên (b-c) da jî ev hêman heman li gorî zayenda kirdeyê guherîye. Yanî, *dayik/mê/a* û *bab/nêr/ê*.

Ji devokê çend mînak:

- (76) Deng-ê wan ê têt. (1)
 Veq.N Veq.s.N D.n
- (77) Befr-ek-e wetû ya têt. (1)
 Q.n.Veq.M Veq.s.M D.n
- (78) Pez-ek-e küvî ya-t çît. (14)
 Q.n.Veq.m Veq.s.M D.n
- (79) Cerg-ê kafira yê bo-d sujît. (17)
 Veq.N Veq.s.N D.n

Di mînakan da wek tê dîtin hevok di dema niha da yên hatî gotin û hemû veqetandekên serbixwe ji aliyê zayend û jimarê ve li gorî kirdeyê yên guherî. Em kirdeyê wek cînavkekê bikarbînin jî, ev hêman bi heman awayê dê zayenda kirdeyê bide dîyarkirin. Ev yek di mînaka MacKenzîye da jî tê dîtin; “az-ê mûsafîr im” (MacKenzie 1961, neqil Haig, 2008: 269). Em ji hêmana “ê”yê dizanin ku kesê mûsafîr ji aliyê zayendê ve “nêrza”e. Heger ku gotiba “*ez a mûsafîr im*” ev car kirde dibû *mêza/jin*. Di van mînakên jêr da; mînaka (80) “Nûke jî yê neşêm xû îskana çayê jîb xûmewe.” Em bi vê hêmana “yê” dizanin kesê ku vê gotinê dibêjê *nêrza/mêr* e.

(80) Nûke jî yê neşêm xû îskana çayê jîb xûmewe. (18)
Veq.S.N

Bi gelemperî ev hêman li gorî kirdeyê hereket dike. Lê mînakên tevlihevkirina zayendê jî kêr nîn in. Bi gelemperî tevlihevî an jî guherîn ji zayenda mê ber bi nêrzayîyê ve ye. Ku ew gotinên jêr ji navçeya Çelê ji devê jinek 51 salî derketine.

(81) *Befr ê têt*

(82) *Dayka min ê têt*

(83) *Babê min ê têt*

Zayenda cînavkê her çî be, veqetandeka serbixwe wek nêr hereket dike.

Heta niha ew mînakên ku me day, hemû ew mînak in yê ku dema niha ji dema fireh cuda dikin. Lê belê ev hêman ne tenê wek dîyardeyên dema niha tèn bikaranîn. Di dema borî da jî ji pêşîya lêkerê cih digire û herwiha zayenda kirdeyê dide dîyarkirin. Haig ku ji MacKenzie neqil dike; ew di devoka Bahdînan da vê rewşê wek formek nû ya zimanê Kurdî dibîne û “dibêje ku ev yek, bi zêdekirina “î/y”yê ji rayeya lêkerê ya dema borî pêk tê”. (MacKenzie 1961a, neqil Haig, 2008: 270-271). Haig, vê formê jî dîsa mînakek ji Kenzie dide dîyarkirin;

(84) “...çî bîa? Got-ê: sindok-**a** şkan**-î**.” (MacKenzie 1962, neqil Haig, 2008: 271).

Wek tê dîtîn lêker li ser rayeya dema borî “şikand”ê ye û hêmana “î”yê lê hatîye zêdekirin. Herwiha dîyardeya “**a**”yê jî heman pêşîya lêkerê cih digire.⁴⁴ Ev yek di devoka Hekarîyê da jî bi heman awayê ye, lê piranî ji cihê “î/y”yê dengê “î”yê tê bikaranîn.

(85) Av-a wê ya kewt-i-ye dev-ê min (27)
Veq.M Veq.S.M D.B.Y Veq.N

(86) Bê**n-a** wi ya hat-i. (31)
Veq.M Veq.Srb.M D.B.Y

Di vê mînaka jêr (87) da her çend jî ji bera hêmana “yê” ravekek hebe jî, vê hêmanê ne li gorî ravebera raveka bera xwe hereket kirîye, ji ber ku di vê hevokê de ravek ne di

⁴⁴ Ev form di devoka Hekarîyê da, bi *dema borîya dûdar* pêk tê. Yan jî em bibêjin *dema borîya dûdar* di devoka Hekarîyê da bi vî awayî pêk tê. (binêr. R.).

erka kirdeyê da ye, peyva ku di erka kirdeyê da “*kamil*”e û ev hêman jî li gorî kirdeyê hereket dike.

(87) Kamil-i kiç-a xo yê daye kurê Arisi (18)
Tew.N Veq.M Veq.Srb.N

Her çend me li jor, da dîyarkirin ku ev hêman ji alîyê jimar û zayendê ve li gorî kirdeyê diguhire, lê di devokê da hin rewşên awarte jî tên pêşberî me. Feqet ev rewşa awarte tenê ji alîyê zayendê ve ye, ji alîyê mêjerê ve ev paraleltîye her dem asayî ye. Di mînaka jêr (88) da ev awartebûyîn bi awayekî vekirî xuya dibe. Di hevokê da *kirde/kiçik* peyveke mêza ye, lê veqetandeka serbixwe “*yê*” kirdeyê wek nêrza dide dîyarkirin.

(88) Berê xwed detê, kiçik leng nîn e, yê taxivîtin. (27)
kirde.M Veq.S.N

Li jêri heman hevok ji alîyê du kesan ve ya hatî gotin û di mînaka (89)an da veqetandeka serbixwe li gorî kirdeyê, ku kirde/bên peyvek mêzaye ya guherî lê di mînaka (90)an da em heman guherînê nabînin. Yanî kirde çend jî peyvek mêza be, veqetandeka serbixwe di rewşa nêrzayî da ya may.

(89) Bên-a mirova yê têt. (15)
Veq.M Veq.S.N

(90) Bên-a insana ya tête mi (9)
Veq.M Veq.S.M

Di van herdu mînanan da (89,90) ev yek bi awayekê vekirî xuya dibe ku; ji devê du kesan heman mînak/gotin derketine û di mînaka/gotina (90)an da hêmana “*ya/yê*” heman ligorî kirdeyê hereket kirîye, lê di mînaka/gotina (89)an da kirde herçend jî peyveke mêza be, ev hêman wek nêrza “*yê*” guherîye.

(91) Bên-a goşt-ê te yê têt. (10)
Veq.M Veq.N Veq.S.N D.N

Di mînaka (91)an da kirde ji ravekeke zincîrî pêk tê, yanî di kirdeyê da du raveber cih digirin, lêkera hevokê “*hatin*” di dema niha da “*têt*” e û tiştê ku tê “*bên*” e, lê belê ji ber ku kirde ji du raveberan pêk tê veqetandeka serbixwe “*yê*” ya may di bin bandora ravebera herê nêzîk “*goşt*” da û zayenda vê peyvê ya girti.

Not:

Ev hêman hin caran wek hokerekê hereket dîke û navbeyna demekê dide dîyarkirin. Di heman demê da li gorî zayenda kesê ku tê qest kirin diguhire. Di mînaka (92)an da jî dîyar e ku karekî hatîye kirin û ev hêman “yê” wateya ji dema kirinê heya dema gotinê têxîte hevokê.

(92) yê min ew kifte xari. (17)
(ji wê demê heta niha)

2.3.2 Ji piştî qertafên nedîyarîyê veqetandek

Di Kurmancîya standard da ji piştî qertafên nedîyarîyê qertafên veqetandekê *ek-e/mê/yekjimar*, *ek-î/nêr/yekjimar* û *-ine/pirjimar* ne. Di devoka Hekarîyê da ev qertaf wek: *ek-e/mê/yekjimar*, *ek-ê/nêr/yekjimar*. Yanî yekjimara mê “*ek-e*” heman wek standardê ye, lê yekjimara nêr “*ek-î*” ji ber “*ek-ê*” ve diguhire û qertafa pirjimarîyê nahê bikaranîn. Di xebata Hazimî (1994) da ji bo veqetandeka nedîyar du mînak hatine dayîn lê wek “halê xuyayî” hatine binavkirin. Ji wan mînakan em dibînin ku mebesta wî veqetandekên nedîyarîyê ne.

- i. “Ez rastî mêrikekî reşesmer hatim
- ii. Ez rastî jineke delal hatim” (Hazim, 1994: 144)

Di van mînakan da dîyare ku li gorî Hazimî veqetandekên nedîyarîyê heman wek Kurmancîya standard tînin bikaranîn. Lê belê di xebata xwe da ku me jêri yê dayî dîyarkirin di devoka Hekarîyê da veqetandekên nedîyarîyê *ek-e/mê/yekjimar*, *ek-ê/nêr/yekjimar* in.

Kurmancîya standard	Devoka Hekarîyê
Mê: ... <i>-ek-e</i>	Mê: ... <i>ek-e</i>
Nêr: ... <i>-ek-î</i>	Nêr: ... <i>ek-ê</i>
Pirjimar: ... <i>-ine</i>	pirjimar: ...

Di rewşa asayî da heman wek Kurmancîya standard: **peyv + qertafa nedîyarîyê + qertafên veqetandekê. Wek:** *peyv-ek-e/ê*

(93) Pîr-ek-e miroxwer tête wêrê. (10)
Q.n+veq.M

(94) dê rabiban qoşqan-ek-e xebüsê çêkiriban. (2)
Q.n+veq.M

(95) her sal bo xwe cot-ek-ê reşka da çêkirin. (2)
Q.n+Veq.N

Wek tê dîtin qertafên veqetandekê ji piştî qertafên nedîyarîyê li gorî zayenda peyvê diguhirin.

Hin caran, ji piştî qertafa nedîyarîyê “ek”, qertafên veqetandekê “e,ê” nahên bikaranîn. yanî ravek bi qertafa nedîyarîyê “ek” tê çêkirin.

(96) Aletirîk-ek... piçûk dest-ê mi da hebû.(3)

(97) Siwar-ê dewar-ek... reş bû. (6)

Di van herdu mînakên da; mînaka (96) “Aletirîk-ek... piçûk”, di ravebera vê ravekê da “*Aletirîk*” ji piştî qertafa nedîyarîyê “ek” divê qertafa veqetandekê hatiba bikaranîn, lê belê tenê bi qertafa nedîyarîyê ravek hatiye çêkirin. Heman tişt di mînaka (97)an da jî tê ber çav; di raveka “dewar-ek... reş” da ravek tene bi qertafa nedîyarîyê ya hatiye çêkirin.

Di van mînakên jêr da ji piştî qertafa nedîyarîyê ji aliyê zayendê ve tevlihevîyek derdikeve meydanê. Di mînaka (98)an da ji ber ku peyva “befr”ê ji aliyê zayendê ve mêza ye, ji piştî qertafa nedîyarîyê “ek” qertafa veqetandekê ya mêza “e” ya hati û bi awayekî asayî “Veqetandeka serbixwe” “ya” jî bi mêzayî ya hatiye bikaranîn. Lê bele di mînakên (99) û (100)an da “Veqetandeka serbixwe” li gorî zayenda qertafa veqetandekê naguhere.

(98) Befr-ek-e weto ya têt. (1)
Q.nd + Veq.M Veq.S.M

(99) a. Mal-ek... tinê yê wê derê. (9)
q.nd +... Veq. S.N

(100) Nêrîtê bir-ek-e pezi yê werdi. (25)
 Q.nd +Veq.M Veq.N

Di mînaka (99) da raveka “mal-ek... tinê” jiber ku peyva “mal”ê di devoka Hekarîyê da mêza ye, divê ji piştî qertafa nedîyarîyê “ek” veqetandek mêza “e” hatiba bikaranîn û li gorî vê veqetandeka mêza divê veqetandeka serbixwe jî bi awayê mêza hatiba bikaranîn, lêbelê hem qertafa veqetandekê nehatîye bikaranîn û hem jî veqetandeka serbixwe bi awayê nêrza ya hatî bikaranîn.

Di mînaka (100)an da veqetandek bi awayekî asayî ya hatî bikaranîn lê bandor li ser veqetandeka serbixwe nekirîye û ji alîyê zayendê ve di navbera veqetandekên qertafî û veqetandeka serbixwe da tevlihevîyek çêbûye. yanî heman peyvê veqetandek qertafî bi mêza dide dîyarkirin lê veqetandeka serbixwe bi nêrza dide dîyarkirin.

2.4. TEWANG

Peyva “tewang”ê bi wateya xwe ya şênber, ji tewandinê, çemandinê û xarkirinê tê. Dema em ji alîyê zimanî ve yan jî di nava termînolojîya zimannasîyê de lê dinêrin, tewang, tê wê wateyê ku peyvekê ji wateya xwe ya resen ber bi wateyek din ve tewandin an jî guherînê. Herwiha “zimanê Kurdmancî (jî) zimanekî tewangbar e. Yanî bêjeyên wî di qîsetê de weke xwe namînin û li gora cihê ko di qîsetê de di kevinê û wezîfa ko li ser xwe di girin tene tewandin û hin parkît bi wan ve dibin, an hin tîpên wan bi tîpine din diguhêrin” (Bedir-xan, 2002: 57). Emê di bin vê sernavê da, gelo ka Kurmancîyê da tewangbarî çawa pêk tê û taybetîyên tewanga Kurmancîyê çi ne? Herwiha li gorî tewangbarîya Kurmancîyê di devoka Hekarîyê da peyv di kîjan rewşê da ditewin û li gorî Kurmancîya standard di devoka Hekarîyê da rewşên awarte û fonksîyonên cuda hene? Ev yeke li ser datayên ji devoka Hekarîyê dê bê analîzkirin.

Wek ku me jor jî da dîyarkirin, zimanê Kurdî zimanek ji malbata Hind-Avropî û ji milê zimanên Îranî ye. Ji ber vê yekê zimanê Kurdî gelek taybetîyên zimanên Hind-Avropî di nava xwe de dihewîne. Ji wan taybetîyan yek jî tewangbarî ye. yanî zimanê kurdî jî wek zimanên Îngilîzî, Fransîzî, Almanî hwd. zimanek tewangbar e. Peyva *tewangê* bi wateya xwe ya şênber, ji tewandinê, çemandinê û xarkirinê tê. Dema em ji alîyê zimanî ve yan jî di nava termînolojîya zimannasîyê de lê dinêrin, tewang, tê wê

wateyê ku peyvekê ji wateya xwe ya resen ber bi wateyek din ve tewandin û guherîn e. “Tewang bi wateya xwe ya gelemperî bi mebesta nîşandana dem, kes, rawe, zayend û rewşê, guherîna teşe û dirûvê bêjeyan e. Tewanga ku di îngilîzî de jê re “inflection/inflexion” tê gotin ji bo nîşandana kategorîyên rêzimanî yên mîna dem, rawe, bang, kes, mêjer, zayend û rewşê ye. Ew jî dibe du beş; 1- kêşana lêkeran ango “conjugation”. 2- Tewanga navdêr, cînavk û rengdêran ango “declension⁴⁵” (Tan, 2011, p. 89).

Celadet Alî Bedir-xan tewanga ku di zimanê Kurdî de bi wateya xwe ya “*declination*”ê ve hatîye bikaranîn wisa te’rîf kirîye:

Zimanê kurdmancî zimanekî tewangbar e. Yanî bêjeyên wî di qisetê de weke xwe namînin û li gora cihê ko di qisetê de di kevin ê, û wezîfa ko li ser xwe di girin têne tewandin û hin parkît bi wan ve dibin, an hin tîpên wan bi tîpine din diguhêrin. (Bedir-xan, 2002, p. 57)

Zimanê Kurdî/Kurmancî xwedîyê taybetîya zayendê ye, ku her peyvek bi awayekî xwezayî, zayenda xwe di nava xwe de dihewîne. Lê peyv bi tenê serê xwe halê xwerû da ne. Di hin rewşên cuda de zayenda wan dîyardibe. Ji wan rewşan yek *tewang/oblique* e ku hem zayenda peyvan dide dîyarkirin hem jî yekjimarî û pirjimarîya wan dîyar dibe. Herwiha zayend tenê di halê yekjimarîyê de derdikeve, di halê pirjimarîyê da nedîyare.

Kurmancîya standard

Mê: ... -ê

Nêr: ... -î

Pirjimar: ... -an

Devoka Hekarîyê

Mê: ...-ê

Nêr: ...-î

pirjimar: ... an/a

Li gorî Kurmancîya standard di devoka Hekarîyê de li ser qertafên tewangê hin guherîn çêdibin. Hazim (1994) di xebata xwe da ji bo qertafên tewangê ya pirjimar dîyar dîke ku gelek caran li şûna **an** tenê **a** têt bikaranîn. Lê li gorî Rheyî pirjimarîya peyvan mebest tewanga pirjimar bi qertafa “an”ê pêk tê. Rhea van mînakan dide. “Mal-an, mirov-an, hesp-an.” (Rhea, 1869:120). Hazim ji bo qertafên tewanga yekjimar jî dibêje: “Heke

⁴⁵ *Declination*: rewşa guherbar a navdêr, heyber, rengdêr, jimar û cînavkan ya li gorî bûyer, zayend û hejmarê ye. (Bussmann et al., 1996, p. 277)

cins û hal xûyayî be, ji bo mêr şuna «î», «i» bi kar têt...” (Hazim, 1994: 145) û piştî çend mînakên tewandina yekjimra nêr, wisa dibêje: “Lê belê heke di halê xûyayî û yekanî da be «î» bi kar têt.” Û van mînan dide.

“Hespekî boz, darekî stûr.” (Hazim, 1994: 145)

Di van mînan da dîyare ku mebesta wî qertafên tewanga nedîyarîyê ne. Xebata Hazim (1994) ji serî heya dawîyê di navbera rave û mînan da tevlihevîyek xuya dibe.

Li gorî dataya ku me berhev û analîz kirî bi gelemperî ji qertafa pirjimariyê/plural “*an*”ê hin caran “*n*” dikeve, tenê wek “*a*” dimîne. Qertafa yekjimariyê ya nêr/masculine “*i*” bi gelemperî wek “*i*”yê tê bikaranîn. Qertafa yekjimariyê ya mê/ feminine “*e*” bi heman awayê standard tê bikaranîn.

Standard

Hevalî got

Hevalê got

Hevalan got

Hekarî

Hevalî got

Hevalê got

Hevala got

Not:

Di devoka Hekarîyê da taybetî jî li herêma Şemzînan hin caran ji bo tewanga yekjimara nêr “*i*”yê mînakên “*y*”yê jî dîyar dibin. Wek:

(101) serê mela-*y* (16)

(102) here wi gund-e-*y* (14)

Di van mînan da ji cihê “mela-*i*”, mela-*y* û ji cihê “gund-*i*” gund-e-*y* hatîye bikaranîn.

2.4.1. Tewanga qertafên nedîyarîyê

Di Kurmancîyê de peyv di halê xwerû de dîyar in, dema qertafên nebinavkirî “ek” (yekjimar) û “in” (pirjimar) digirin, dikevin rewşa nedîyar. Herwiha “di Kurmancî de ne tenê navdêr û cînavk, qertafên nebinavkirinê “-ek” û “-in” jî ditewin ango qertafên tewangê werdigirin û dibin “-ekê” (yekjimar/mê), “-ekî” (yekjimar/nêr) û “-inan”

(pirjimar)”. (Tan, 2011: 91). Lê belê dema em ji devoka Hekarîyê dinêrin ji piştî qertafa yekjimara nedîyar “**ek**” peyv xwedî zayenda mê be jî nêr be jî herdem bi qertafa mê “**ê**”yê tê tewandin⁴⁶. Vê yekê Hazim (1994) jî dîyardike ku di rewşa nedîyar da ji bo zayenda nêr û mê “**ê**” têt bikaranîn. Dema em pirjimarîyê dinêrin ji bo rewşa nedîyar çu qertaf nahên bikaranîn lê ji berîya peyva ku di rewşa pirjimar da ditewe hin peyvên wek: “hin, çend, gelek...” têt bikaranîn.

Kurmancîya standard

Mê: ... *-ek-ê*

Nêr: ... *-ek-î*

Pirjimar: ... *-in-an*

Devoka Hekarîyê

Mê: ... *ek-ê*

Nêr: ... *ek-ê*

pirjimar: ... *-an/a*

Wek:

⁴⁶ Ev yek di hin devokên Kurmancîyê yên din da jî tê pêşberîme ku di wan devokan da rasterast zayenda mêzayî ji ber zayande nêrzayîyê ve diguhire. Gündoğdu (2018) dîyardike ku di devoka Serhed/Mûşê da tewanga nedîyarîya mê *-ek-ê* ber bi nêrzabûnê *-ek-î* ve diguhire û vê mînakê dide: “*Zemane berê, em tev di mal-ekî da rudiniştin mîna naha nebû, naha gava ku kurik mezin dibe dizewice û cehê dibe, diçe mal-ekî din digire.*”(r.56). Wek di vê mînakê da dîyar e ku Gündoğdu (2018) bixwe jî dîyardike di devoka Serhed/Mûşê da ev guherîn ji piştî qertafên nedîyarîyê yên veqetandekê (*ek-e* ji ber *ek-î*) û jî ji piştî qertafên nedîyarîyê yên tewangê (*ek-ê* ji ber *ek-î*) çêdibe. Herwiha di herdu rewşan da jî zayenda mê ji ber zayenda nêr ve diguhire û ji piştî vê guherînê di navbera zayenda nêr û zayenda mê da çî cudahî namînin.

Lê dema em ji devoka Hekarîyê dinerin rewşek cuda der tê pêş. Di devoka Hekarîyê da:

tewang/nêr-*i*

tewang/mê-*ê*

tewang/nedîyar/nêr/*ek-ê*

tewang/nedîyar/mê/*ek-ê*

Veqetandek/nêr-*ê*

Veqetandek/mê-*a*

Veqetandek/nedîyar/nêr-*ek-ê*

Veqetandek/nedîyar/mê-*ek-e*

Wek tê dîtîn tenê di navbera qertafên tewanga nedîyar da wekhevîyek heye, vê yeke jî mirov nikare bibêje gelo ka zayend ji mêzayîyê ji ber nêrzayîyê ve yan ji nêrzayîyê ji ber mêzayîyê guherîye. Lewra ev wekhevî dibe;

-ji bandora veqetandek/nêr-*ê* û veqetandek/nedîyar/nêr-*ek-ê* çêbibe,

-dibe ku ji bandora tewang/mê-*ê* çêbibe

-yan jî dibe ku bandora hêsan bilêvkirinek fonolojîk be.

	Kurmancîya Standard	Devoka Hekarîyê
Nêr:	Heval-ek- <i>î</i> got	Heval-ek- <i>ê</i> got
Mê:	Heval-ek- <i>ê</i> got	Heval-ek- <i>ê</i> got
Pirjimar:	Heval-in- <i>an</i> got	<i>Hin</i> Heval- <i>a</i> got

Wek li jor jî dîyar e, di devoka Hekarîyê da, di rewşa yekjimar da ji piştî qertafa nedîyarîyê peyv her dem bi “ê”yê tê tewandin. Yanî di vê rewşê da zayend nedîyar e.

- (103) Çûne se rûbar-ek-*ê* (14)
- (104) Beran-ek-*ê* de mi (1)
- (105) Mêrik-ek-*ê* jî dewar naltkirin.(19)
- (106) memleket-ek-*ê* mirovek hebî (16)

Di van hevokan de peyvên “rûbar, beran, mêrik, memleket” li gorî zayenda Kurmancî nêrza ne, lê belê ji ber ku pêşîya qertafa tewangê, qertafa nebinavkirinê “**ek**” girtine ser xwe bi qertafa yekjimara mê “ê”yê ên hatî tewandin. Lewra di devoka Hekarîyê de peyv di rewşa nebinavkirî da bi qertafa nêrza “î/i”yê natewin. Ji piştî qertafa nedîyarîyê tewandina peyvên mêza jî bi heman awayê ye. Wek:

- (107) Car-ek-*ê* çûne der-ek-*ê* (19)
- (108) nav deşt-ek-*ê* t’rûniştin (26)

2.4.2. Tewanga Cînavkan

Di Kurmancîyê de cînavk/pronav jî tewangbarin. yanî pronav jî bi du cureyan pêk tên ku cureyek xwerû yek jî tewandî ye.

Yekjimar		Pirjimar	
Xwerû	Tewandî	Xwerû	Tewandî
Ez	min	em	me
Tu	te	hûn	we
Ew	wî(n)/wê(m)	ew	wan

Ev vî(n)/vê(m) ev van

Di devoka Hekarîyê da li gorî standarda Kurmancî li ser pronavan çend guherîn derdikevin pêş. Wek:

- Yekjimara kesê sêyem a nêr tewandî “**wî**” bi gelemperî wek “**wi/ewi**” diguhire.
- Pirjimara kesê duyem a xwerû “**hûn**” hin caran wek “**hing**”, hin caran jî tenê dengê “**û**” diguhire wek “**hun**” û “**hün**” tê telafûzkirin.
- Pirjimara kesê duyem a tewandî “**we**” hin herêmên Hekarîyê wek “**hewe**” hin herêman jî wek “**hingo**” tê bikaranîn. Hin cihan jî bi heman qalibê “**we**” tê bikaranîn.
- Hin herêman ji bo pirjimara kesê duyem a tewandî û pirjimara kesê duyem a xwerû heman cînavkê “**hingo**”yê bikartînin
- Pirjimara kesê sêyem “**wan**” hin caran wek “**ewan**” diguhire.
- Her wiha di yekjimara kesê yekem a xwerû “**ez**”ê de hin caran “**z**” dikeve wek “**e**” tê telafûzkirin û di yekjimara kesê yekem a tewandî “**min**”ê de “**n**” dikeve wek “**mi**” tê telafuzkirin.

Em ê ji bo guherîna cînavkan di beşên jêr da yek bi yek mînakên rêz bikin.

2.5. FONKSYONÊN TEWANGÊ

Tewandina peyvan di çend rewşên cuda da; li gorî rêzkirina hevokê, li gorî peywir û erka peyvan a di hevokê da û li gorî cih girtina peyvan a di hevokê da derdikeve meydanê. Herwiha peyva tewandî li gorî van rewşan fonksiyonên cuda digire ser xwe. Haig û Opengin (2015) peyv tewandina Kurmancî di pênc rewşên cuda da ên dîyarkirî.

- I. Biresera (direct object) lêkera gerguhêz a dema niha.
- II. Argumana girtîyar/bigir yan jî hedefê a ku bi dû tevger û neqilkirinekê ji piştî pêveberê cih digire.
- III. Hêmanên ji piştî pêşdaçekan cih digirin.
- IV. Di ezafeyê de hêmana xwedî/raveker. (Possessor)
- V. Kirdeya lêkera gerguhêz a dema borî. (Haig & Öpengin, 2015: 17)

Niha em dê bi awayekî gelemper di van rewşên jêr da tewangbarîya Kurmancîyê analîz bikin û bi mînakan lê binêrin gelo ka di devoka Hekarîyê da li gorî standardê rewşên cuda hene yan bi her awayê ve wekhev e.

- Di rewşa ergatîvî da tewang
- Di rewşa akûzîtîf da tewang
- Di hêmana ji piştî lêkerê da cih digire tewang
- Di ravekerê da tewang
- Di hêmana ji piştî pêşdaçekan da cih digire tewang

Di Kurmancîyê da hevok bi du awayan li gorî du pergala tîpî sazîkirin; yek ji wan pergala an jî rewşa ergatîvî ye, ya din rêzîkirina akûzîtîf e.

Kurmancî, ku wek Kurdîya Bakur tê zanîn, zimanekî Îranî ye ku hêj pergala ergatîvîyê di nava xwe da dihewîne û hem xwedî pergala hevok rêzîkirina akûzîtîf hem jî ya ergatîvî ye. Di wî zimanî de hemû hevokên ku li ser koka lêkera dema fireh hatî sazîkirin, pergala akûzîtîf û hevokên gerguhêz ên dema borî da jî pergala ergatîvî heye. (Gündoğdu, 2017: 47)

Îca li gorî vê yekê, di rizîkirina ergatîvîyê de “kirde/subject”; di rizîkirina akûzîtîfîyê de jî “bireser/object” tê tewandin. Em ê pêşîyê li gorî rêzîkirina hevokê pişt re li gorî rewşên din tewanga navdêran bidin dîyarîkirin.

2.5.1. Di rewşa *ergatîvî* de tewang

Wek ku me jorî jî dîyar kir, di Kurmancîyê de hevok bi du awayan tîpî rêzîkirin. Rêzîkirina ergatîvî ku yek ji wan rêzîkirina ye, di pirtûkên rêzîmana Kurmancî de wisa tê te’rîfkirin: “Di zimanên ergatîv de di hevokên lêkerên gerguhêz de lêker dikeve bin bandora bireserê. Ango lêker li gorî bireserê tê kişandin û kesandin.” (Tan, 2011: 85). “Ergatîvî, di demên borî de, lêkerên gerguhêz li gorî bireserê kişandin e.” (Yıldırım, 2013, p. 77). “Ergatîvî ew e ku di navbera bireserê û lêkerê de hevahengîyek çêdibe. Yanî di hevokên bi lêkerên gerguhêz de lêker dikeve bin bandora bireserê, yekjimarî û pirjimarîya bireserê di lêkerê de dîyardibe.” (Ocek, 2014, p. 53). Di zimannasîyê de ergatîvî yan jî pergala ergatîvîyê; Dixon (1994) “Rêzîkirina ergatîvî, wek rewşa wekhevîya taybetîyên morfosîntakssayî ên biresera hevoka gerguhêz [O] bi kirdeya hevoka negerguhêz [S] û

cudahîya kirdara hevoka gerguhêz [A] te'rîf dike⁴⁷". (neqil ji Gündoğdu: 2017, (Haig, 2008)). Dîsa (Gündoğdu, 2017: 49) di Kurmancîyê da ergatîvîya wek standard tê qebûlkin; "kirde, qertafa tewangê (oblique) digire, bireser jî di halê xwerû (direct) da ye û lêker girêdayî qetafa kesandinê ya bireserê dimîne." Li gorî wan te'rîfan rêzkirina ergatîvî wisa dertê pêş.

- (109) **ez** çû-**m** (negerguhêz)
 (110) wî **ez** dît-**im** (gerguhêz)

Di van mînan de kirdeya hevoka negerguhêz (109) "ez" û biresera hevoka gerguhêz (110) "ez" di heman rewşê de ne. Lê belê kirdara/agent hevoka gerguhêz (110) "wî" di rewşek cuda da maye. Yanî kirdeya hevoka negerguhêz (109) "ez" û biresera hevoka gerguhêz (110) "ez" di halê xwerû da ne, lê kirdara hevoka gerguhêz (110) "wî" di halê tewandî da ye.

Bi kurtasî ergatîvî cure rêzkirineke hevokan, pergaleke hevoksazîyê ye. Hevok li ser sê hêmanên bingehîn tînin sazkin; *kirde/subje, bireser/obje û lêker/verb*. **Ji wan hêmanan kirde her dem tewandî, bireser xwerû û lêker li gorî bireserê diguhire**. Ji ber ku ev pergala hevoksazîyê yanî ergatîvî di Kurmancîyê da tenê di dema borî da derdikeve meydanê, Kurmancî wek zimanek nîv-ergatîvî tê hesabandin.

Wek tê dîtin, di pergala ergatîvîyê da kirde her dem tewandî ye. Niha em ê li gorî hevokên jêr li devoka Hekarîyê binêrin, gelo di vê devokê de jî di hevok rêzkirina ergatîvî da, kîjan hêman ditewin, li gorî standardê rewşên awarte hene, yan na?

Rêzkirina Ergatîvî: kirde=tewandî, bireser=xwerû/netewandî, lêker (di dema borî da) li gorî bireserê hereket dike.

- (111) Serdar-*i* sêv xwar.

Krd. Tew. Brs. Xwr. Yek.J. Dm. Bor.

⁴⁷ S: Subjet = Kirde

O: Object = Bireser

A: Agent = kirdar, çêker, aktor

P: Patient = ya bandor lê tê kirin

(112) Serdar-*i* sêv xwar-*in*

Krd. Tew. Brs. Xwr. pir.J. Dm. Bor.

Di mînakên (111-112) da kirde “serdar” tewandî, bireser “sêv” xwerû û lêker “xwarin” ji aliyê jimarê ve bi girêdayî bireserê maye. Hevokên jêri jî bi heman pergala ergatîvîyê ên hatî saz kirin.

(113) *Me* bar nekiribû. (8)

Krd.Tew. Brs.Xwr. Yek.J.Dm.Bor.

(114) *Me* bar-**t** bir-**in** (1)

Krd.Tew. Brs.Xwr. Pir.J.Dm.Bor

(115) *Pîr-ê* du kur hebû-*n*. (19)

Krd.Tew.M Brs. Xwr. Pir.J. Dm. Bor.

Di hevokên (113-114)an da Kirde/”**me**” tewandî, bireser/bar xwerû û lêker/”**bir**” ne li gorî kirde/”**me**”yê, li gorî mêjera bireserê ya hatî kişandin. Herwiha dema em lêkerê dinêrin dîyar dibe ku biresera hevoka (113) yekjimar û biresera hevoka (114) Pirjimar e. Di hevoka (115)an da kirde/”**pîr**” tewandî, bireser/”**nan**” xwerû û lêker/”**hebûn**” ne li gorî kirde/”**pîrê**”, li gorî mêjera bireserê ya hatî kişandin. Yanî lêker li gorî bireserê diguhire.

Di Kurmancîya standard da dema borîya dûdar wek “ji bo bûyereke berî niha di demeke nedîyar da pêk hatibe tê bikaranîn.” (Ocek, 2014: 224) û ji bo vê demê ji Ocek mînakek wisa hatîye dayîn.

(116) *Wan* dar biri-*ne* û firoti-*ne*. (Ocek, 2014: 224)

Dema em di çarçoweya pergala ergatîvîyê da ji vê mînakê dinêrin her tişt asayî ye. Yanî kirde/*wan* tewandî, bireser/*dar* xwerû û lêker/*birin/firotin* li gorî bireserê hatine kişandin û em di kişandina lêkeran da dizanin ku bireser pijimar e. Heman hevokê em li gorî devoka Hekarîyê saz bikin.

(117) *Wan* dar *êt* biri û *yê-t* firot-*i*.

Wek tê dîtin kirde/*wan* tewandî, bireser/*dar* xwerû. Lê belê dema em lêkerê dinêrin têkilîyek di navbera lêker û bireserê de nîn e. Yanî lêker nemaye di bin bandora bireserê da û li gorî bireserê nehatîye kişandin. Mêjera bireserê di veqetandeka serbixwe “*êt/yêt*”

da tê pêşberî me. Di mînakên jêr da em ê bibînin ku zayenda bireserê jî di veqetandeka serbixwe da xuya dibe. (mirov dikare bibêje ku veqetandekên serbixwe vê rewşê da peyvira tewangê bikar tînin.)

(118) Nalbend-*i* ez ê nalkir-*i*.(25)
Krd.Tew.N Brs. Xwr. Veq.S.N. Pir.J. Dm. Bor.

Di vê hevokê (118) da kirde/nalbend tewandî, bireser/*ez* xwerû, lêker di dema borî da û li gorî kesên sêyemîn a hatî kişandin. Herwiha mêjer û zayenda bireserê di veqetandeka serbixwe da xuya bûye.

Ev hevokên jêr ku li gorî pergala ergatîvî ên hatî sazkirin, divê kirde bê tewandin. Lê belê qerafa tewangê ya nêranî “î” ya ketî û kirde di rewşa xwerû da yên may.

(119) Mûsa pêxember(...) goştê wê keland (14)

(120) Paşa(...) meznêt gundi hemi xirkirnewe. (16)

Di devoka Hekarîyê da ji bilî vê rewşa awarte ku me di mînakên (119), (120)ê da daye dîyarkirin; “*Kirde_{xwerû} Bireser_{xwerû} Lêker_{dema borî}*”, di rewşa ergatîvî da bi gelemperî hevok wek; *Kirde_{tewandî} Bireser_{xwerû} Lêker_{dema borî}* tê sazkirin. Lê belê di nava nîfşê nû da ku zêdetir zimanê Kurdî(Kumancî) bi zimanê Tirkî diaxivin hin rewşên awarte tên dîtin ku heman rewş di hin devokên din ên Kurmancîyê da jî hene. Wek mînak Gündoğdu (2017) di Kurmancîya Mûşê da li ser pergala ergatîvîyê rewşên awarte wisa nîşan dîke:

(121) a *Kirde_{tewandî} Bireser_{tewandî} LêkerØ*

b *Kirde_{tewandî} Bireser_{tewandî} Lêker_{girêdayî Kirdeyê}*

c *Pj.K.3 Bireser_{tewandî} Lêker_{girêdayî Kirdeyê}*

d *Kirde_{xwerû} Bireser_{tewandî} Lêker_{girêdayî Kirdeyê}*

Di devoka Hekarîyê da jî, temen çî qeder biçûk bibe, Tirkî axavtin zêde dibe û bi girêdayî vê yekê qalibên wisa tên dîtin.

(122) a “Min te dît” (min tu dîtî)

b “min avê vexwar” (min av vexwar)

c “ez gul îna-m” (min gul anîn)

d “ûçaxê bumbe-yan hûwêt”⁴⁸ (ûçaxê bumbe avêtin)

2.5.2. Di Rewşa Akûzatîvî da Tewang

Wek ku me jor jî dîyarkiribû di rêzkirina akuzatîv de hêmana ku ditewe her dem bireser/obje ye. niha jî em ê li gorî vê fonksyonê devoka Hekarîyê binirxînin gelo ka di vê devokê de li gorî rêzkirina akuzatîf hêmana ditewe her dem bireser e? “Hevok rêzkirina akuzatîf, ji bervajî rêzkirina ergatîvî wekhevîya kirde (subject [S]) û kirdar (agent [A]) ye û bireser (object) di rewşek cuda de (rewşa tewandî) ye.” (Dixon 1994) neqil ji: (Haig, 2008: 18). Herwiha lêker li gorî kirdeyê hereket dike.

- (123) **Ez** wî dibîn-**im** (gerguhêz)
K.Xwer Brs. Tew. Dm.N
- (124) **Ez** diç-**im** (negeguhêz)
K.xwer dm.N

Di van hevokan de ya ewil gerguhêz û ya duyem negerguhêz e. Hevoka ewil da kirdar/agent “**ez**” û di hevoka duyem da ku negerguhêz e, kirde/subject “**ez**” di heman rewşê da, yanî di rewşa xwerû da ne û herdu hevokan da jî lêker bi kirde/kirdarê ve girêdayî ye. Lê belê biresera/object hevoka (123) “**wî**” di rewşek cuda yanî di rewşa tewandî de ye. Herwiha di rêzkirina akuzatîf de bireser/object her dem di rewşa tewandî de ye.

Niha em ê bi çend hevokan, di devoka Hekarîyê de û li gorî rêzkirina akuzatîf tewandina bireserê dîyar bikin.

Rêzkirina akûzatîf: kirde/kirdar=xwerû, **bireser=tewandî**, lêker girêdayî kirde/kirdarê ye.

- (125) Ez ber-a't nas-**im**.(1)
- (126) Em mar-a rêzke-**y-n** (7)
- (127) Em rêk-ê peydanak-**en**.(1)
- (128) Tu hêstirek-ê nade-**y-e** mi (19)

⁴⁸ Ev mînak di nava devera Hekarîyê da, rasterat ji aliyê min ve yên hatî bihîstin.

Di hevokên (125-126)an da bireser “*ber, mar*” bi qertafa pirjimarîyê “**an**”ê (ku di devoka Hekarîyê de “**n**” dikeve û wek “**a**” tê bikaranîn) yên hatî tewandin.

Di hevokên (127,128) an da bireser/object “*rêk, hêstir*” bi qertafa yekjimara mê “**ê**”yê yên hatî tewandin. Herwiha di hemû hevokan da kirde xwerû û lêker bi girêdayî kirdeyê ya may.

Herêma Rûbarokê (Nav Gerdîyan) ku li ser sînori û nêzîk Soranê cih digire ji alîyê rêzehevoka akûzîtîf ve hin rewşên awarte xuya dibin. Ji wan rewşên awarte yek; ku me jor jî dîyar kiribû; ji bo pirjimara kesê sêyem hem ji bo rewşa tewandî hem jî ji bo rewşa xwerû heman cînavka “*hingo*” tê bikaranîn. Ji ber ku ev cînavk ji herêma Şemzînan bi gelemperî di rewşa tewandî da tê bikaranîn, di pergala akûzîtîf da tevlihevîyek derdikeve meydanê.

(129) *Hingo nan xar.* (pergala ergatîvî)

Krd.Tew. Brs.Xwr. Y.J.dm.Bor.

(130) *Hingo hatin.* (pergala akûzâtîf)

Krd. Tew. Yk.J.dm.Bor.

2.5.3. Tewandina Hêmanên Di Dawîya Lêkerê Da Cih Digirin

Hin lêker hene ku di nava xwe de taybetîya “ji ber cihekê ve hereket û ji ber bigirekê ve neqilkirinekê” dihewînin û ew hêmana bigir û cihî wek nîşan/hedef her dem dikeve paşîya pêveberê. Ew “argumana girtîyar/bigir yan jî hedefê a ku di dawîya tevger û neqilkirinekê ji piştî pêveberê cih digire”(Haig & Öpengin, 2015: 17) her dem di halê tewandî da ye.

(131) *vila dê deye me* (14)

(132) *Şêxê Evdilqadir çû cot-i* (27)

(133) *çû bin pêyêt şêr-i* (30)

(134) *ez nabêjme kes-ê* (7)

(135) *gote jink-ê* (7)

(136) *carekê çûne derek-ê.*(19)

(137) *Em hatîne duryan-ê* (1)

(138) Tu hêstirekê nadeye mi (19)

Di van hevokan de wek pêveber lêkera “dayîn” (131-138), “çûn” (132,133,136), “hatin” (137) û “gotin” (134-135) ji ber taybetîya “ji ber cihekê ve hereket û ji ber bigirekê ve neqilkirin”ê wek hedef/nîşan hêmanek a ji piştî xwe dîyarkirî. Di lêkerên “hatin” û “çûn”ê de taybetîya ji ber cihekê ve tevger/heretekek dîyar dibe û pêveber wek hedef hêmanekê ji piştî xwe nîşan dike. Di lêkerên “gotin” û “dayîn”ê de jî taybetîya neqilkirinê dertê pêş û tiştêk ji ber kesekê ve tê neqilkirin. Herwiha cihê ku jiber tê hereketkirin û kêsê/a ku tiştêk jê re tê neqil kirin her dem ji piştî pêveberê cih digire û di halê tewandî de ye. Wek di mînakên me da jî dîyar e ku:

Di hevoka ewil (131) de tiştêk ji ber kesekê “**me**” ve tê neqilkirin û ew kes “**me**” wek hedef ji piştî lêker/dayînê cih digire û di halê tewandî de ye.

Di hevokên (134-135)an de “gotinek” ji ber kesekê “**kes, jinik**” ve tê neqilkirin û ew “kes” û “jinik” wek hedef ji piştî lêkerê cihê girtî û bi “ê”yê ên hatî tewandin.

Di hevokên (132,133,136,137)an de kesek ji ber cihekê ve hereket dike û ew cih “*cot, bin pêyêt şêr, duryan, derek*” wek hedef ên ketî paşîya lêkerê û (132,133) bi “î”yê, (134,135) jî bi “ê”yê yên hatî tewandin.

Not:

Dem ferq nake, hêmanên di dawîya lêkerê de cih digirin, di dema fireh/niha de jî di dema borî de jî ditewin.

Min gotibû *te*/ Min gotibûye *te*

Min ê gotîye *te*

Min gote *te*

Ez da bêjime *te*

Ez’ d bêjime *te*

Ez êt bêjime *te*

Ez dê bêjime *te*

Not:

Di devoka Hekarîyê da hin caran hêmana di dawîya lêkerê tê, li gorî mêjera bireser û kirdeyê wek “**ê/nê**” tê kurt kirin û bi lêkerê ve tê zeliqandin. Ew hêman bi qalibê “**wê/wî û wan**” yanî rewşa tewandî de der tê pêş û di heman demê da di rewşa ergatîv da li gorî bireserê û di rewşa akûzîtîf da jî li gorî kirdeyê hereket dike.

- (139) a. Min nan da-y-ê – min nan-ek da wi/wê/wan
b. Min nan da-nê – min du nan da-n wi/wê/wan
- (140) Mi hinde nan day-ê (1)
- (141) me ber tûwêt-**nê**. (11)
- (142) şovani pezek day-ê.(17)
- (143) Meznê wan got-ê (7)
- (144) xanyêt du qat da-**nê** (27)

Di van hevokan de jî dîsa di navbera du cih/kesan de neqilkirin û hereketek heye. Lê belê cihê ku ji ber tê hereketkirin û tiştek jê re tê neqilkirin li gorî mêjera bireserê wek “**ê/nê**”yê yên hatî kurt kirin û bi lêkerê ve hatine zeliqandin. Wek di van mînakên de dîyardibe ku:

Di hevokên (140,142,144,)an da tiştek ji yekî re tê dayîn, zayend û mêjera wan kesên ku tiştek jê ra tê dayîn nedîyar e, yanî em dikarin bibêjin: “Mi hinde nan da **wê**”, “Mi hinde nan da **wî**” û “Mi hinde nan da **wan**”. Wek tê dîtin hêmana jê re tiştek tê dayîn her dem di rewşa tewandî de ye. Lê belê mêjera têştta ku tê dayîn (bireser) di qertafên “yekjimar-ê”, “pirjimar-**nê**”ê dîyar e.

Di pergala akûzîtîf da heman tişt ji bo kirdeyê bi cih e. Ji ber ku di pergala akûzîtîf da lêker li gorî kirdeyê diguhire, ew qertafên “yekjimar-ê”, “pirjimar-**nê**”ê li gorî mêjera kirdeyê diguhirin.

- (145) a. $\widehat{\text{Ez çû-m-ê}}$ – ez çûme nan-i
b. $\widehat{\text{Em çû-nê}}$ – em çûne nan-i

- (146) Mi’b de-**nê** (18)

(147) Em neşêy-*nê* (26)

Di van mînanan da (145a,145b) jî qertafên “yekjimar/*ê*”, “pirjimar/*nê*”ê li gorî mêjera kirdeyê guherîne. Di mînaka 146. da kirde (hûn) nedîyar e.

Awarte:

Em di devoka Hekarîyê da bi taybetî jî li herêma Colemêrg û Çelê hin mînakên awarete jî dibînin ku hêmana ji piştî lêkerê cih digire natewe.

(148) Ez birme mal-Ø (19)

(149) piştî em hatîye Çel-Ø (28)

(150) em hatin Colemêrg-Ø (21)

2.5.4. Tewandina bi Daçekan

Daçek ji wan cureyên bêjeyan in yên ku bi tenê serê xwe bê wate û dema li gel cure bêjeyên din tên bikaranîn wateyan digirin ser xwe û wateyan ji cure bêjeyên din bardikin. Di Kurmancîyê de daçek dibin sê cure: paşdaçek, pêşdaçek û bazindaçek. Pêşdaçek yanî daçekên ku berîya peyvan cih digirin her dem peyva paşîya xwe ditewînin. Di devoka Hekarîyê de wek pêşdaçek bi gelemperî “**bo**” û “**gel**” tên bikaranîn. Berbelav nebin jî daçeka “**ji**” wek “**j,ş**” daçeka “**li**” wek “**l**” tê kurtkirin û bi peyva berîya xwe ve tê zeliqandin û wisa tê bikaranîn. Her wiha di daçeka “**ber**” de jî hin caran “**r**” dikeve û wek “**be**” tê bikaranîn.

(151) rabî *be* pencer-ê,

Di daçeka “**ber**”ê de “**r**” ketîye û wek “**be**”yê ya hatî telafûzkirin, herwiha peyva paşîya xwe “**pencere**” ku zayenda wê mê ye, bi “**ê**”yê ya tewandî.

(152) em jî maynewe-*l* Deraw-ê (1)

(153) te çî-*l* dinyay-ê dat vêtin (7)

Di wan herdu hevokan (152,153) da daçeka “**li**” bi peyva berîya xwe ve ya hatî zeliqandin û peyva paşîya xwe jî ku zayenda wan mê ye bi “**ê**”yê a tewandî.

(154) Xuda-ş **te** razî bît (14)

(155) carek dî duay-ş Xuda-y xast (14)

Ku me jorî jî dîyar kirîbû, daçeka “ji” hin caran wek “ş” tê guherîn û bi peyva berîya xwe ve tê zeliqandin. Di wan hevokan de jî daçeka “ji” ku wek “ş”yê a hatî guherîn û peyva dawîya xwe (154) “te”, û (155) Xuda-“y” ên tewandî.

(156) *gel* kiçik-ê (16)

(157) Xudê kerem ê *gel me* kiri (18)

Di hevokên (156,157)an de daçeka “gel”ê peyvên paşîya xwe (156) “kiçik” ku zayenda wê mê ye bi “ê”yê û (157) pronav bi rewşa tewandî da “me” a hatî bikaranîn.

(158) eve bo min, eve bo te, eve jî bo wi yê nana dî xari (14)

Di vê mînakê de jî ku dîyar e ji ber daçeka “bo”yê peyvên paşîya daçekê ên ketî di rewşa tewandî de.

Not:

Di devoka Hekarîyê da (ev yek gelek devokên din ên Kurmancîyê da jî heye) hin caran daçek û hêmana ji piştî daçekê bi hev ve dizeliqin û wek yek hêman tînan bikaranîn. wek: *jê, tê, lê, pê*. Di vê zeliqandinê da hêmana ji piştî daçekê her dem di rewşa tewandî da ye.

(159) Êdî çu *pê* ve nehat. (31)

(bi wê/wi)

(160) Xendek bî ez ketime *tê* da (18)

(di xendek-ê)

(161) Derê mi *jê* ve kir îna (19)

(ji wê/wi)

(162) *Lê*’d det heta şivik *pê* ye hür hür bît. (9)

(li wê/wi)

(bi wê/wi)

2.5.5. Tewandina bi ezafe/ravekê

Di ezafeyê/ravekê da du hêman cih digirin yek ji wan raveber, yek jî raveker e. Raveber, qertafa veqetandekê digire û ji ravekerê ve tê girêdan. Hêmana xwedî/raveker jî ji bilî hevalnavên çawanîyê her dem qertafên tewangê digirin û di rewşa tewandî de ne.

(163) Kiras-ê Zîlan-ê

Q.Veq.N Q.Tew.M

(164) Çav-ên Perwer-î

Q.Veq.Pj. Q.Tew.N.

(165) Mirov-ên gund-an

Q.Veq.Pj. Q.Tew.pj.

Di herdu mînakên (163,164)an da hêmana xwedî/raveker “zîlan, perwer” di rewşa tewandî da ne, ku “zîlan” bi qertafa tewangê ya mê “ê”yê û *perwer* bi qertafa tewangê ya nêr “î”yê hatine tewandin. Di raveka (165)an da jî hêmana raveber/gund bi qertafa tewangê ya pirjimarîyê “an”ê hatîye tewandin.

(166) Me kar-ê mêvan-**an** kir. (19)

(167) Bir-ek-e golk-**a** hatne nav zewyê (30)

(168) Ez dê hewt bira-êt **te** kujim (9)

(169) kuro av-a **min** bên bo bênê kêmbû. (32)

2.5.6. Di Rewşa Banglêkirinê Da Tewang,

Di Kurmancîyê da qertafên banglêkirinê;

Nêrza *o*

Mêza *ê*

Pirjimar *no*

Ji van qertafan yê yekjimar “ê-o” di devoka Hekarîyê da tên bikaranîn lê qertafa pirjimarîyê “no” di vê devokê da nahê dîtin.

(170) Xal-o ew hun kut ken? (19)

(171) Kiç-ê, kanê bo mi pîçe cebla hêkê çêken (4)

Bikaranîna qertafên banglêkirinê di devoka Hekarîyê da li ser tewangê hin rewşên awarte ên anîye meydane;

- (i) Navên taybet gelek caran tene kurt kirin û di rewşa banglêkirinê da nebe jî bi qertafên banglêkirinê “ê”, “o”⁴⁹ tên tewandin. Piştî wê tewandinê hewce

⁴⁹ Ev deng devoka Hekarîyê da bi gelemperî ber bi dengê “û”yê ve diguhire. Di beşa dengnasîyê da li ser vê yekê hatîye rawestan.

tewandinek din nahê dîtin. Ev yek di peyvên nêrza da xuya dibe lê di peyvên mêza da xuya nabe, lewra qertafa tewangê ya mêza û qertafa banglêkirinê ya mêza bi heman herfê “ê”yê pêk tên. Wek:

(172) Mend-o gotê, ez bera’t nasim (1)

Di vê hevokê de her çend rewşa banglêkirinê nebe jî “mendîh” wek “mend” ê hatî kurtkirin û bi “o”yê ê hatî tewandin. di hevokê da hewceyî bi tewandinek din nemaye.

(ii) Di devoka Hekarîyê da qertafên banglêkirinê piştî demekê bi hin navan ve ên zeliqî û di hemû rewşan da di halê tewandî da tên bikaranîn. Ev yek di hemû navên ku ji sê peyvan pêk hatî (zîn, gul, pîr, kej...) ⁵⁰ û di peyvên tên kurt kirin (leyla/leyl, fatma/fat, eyşan/eyş, memed/mem, sedat/sed, rojhat/roj...) da tê dîtin. Yanî lêker gerguhêz be jî negerguhêz be jî kirde di rewşa tewandî da ye.

(173) a Pîr-ê nan xar.
Krd.Tew.M. Brs.Xwr. Yek.J.dm.Bor.

b Pîr-ê hat.
Krd. Tew.M. Yk.J.dm.Bor.

c Gul-ê diçît
Krd. Tew.M. Yk.J.dm.fireh.

b Zîn-ê ya-t çîte lali Mem-o
Krd. Tew.M. Yk.J.dm.niha.

Çend mînakên nêrza;

(174) a Mem-o dara-t birît
Krd.Tew.N. Brs.Xwr. Yek.J.dm.Fireh.

b Mem-o yê têt
Krd. Tew.N. Yk.J.dm.nihe.

c pîr-o hate gundi
Krd. Tew.N. Yk.J.dm.Bor.

Not:

Di bin vê mijarê da divê ev yek jî bê dîyarkirin ku qertafên banglêkirinê di devoka Hekarîyê da ji bilî banglêkirin û tewandinê wateya kesandinê jî diêxe kirdeyê. Wek

⁵⁰ Di Kurmancîyê da navên nêrza ku bi sê peyvan pêk tên nîn in. Lê gelek bernavkên ku ji sê herfan pêktên hene “şîn, sor, boz...” ev bernavk jî dema ku ji kesan tên bi navkirin vê formê pêk tînin;

- Boz-o hat
- Reş-o çû
- Sor-o dikenî

mînak; dema tê gotin “*teyr hat*” em di vê hevokê da dizanin ku tişta ku hatî ajala ku difire yanî cûre cûcikek e. Lê dema tê gotin “*teyr-o hat*”, rewş diguhire û em dizanin kesê ku hatî ne ajal, kesayetek e.

(175) a “Çêl hat” (ajal),

b “Çêl-ê hat” (kesayet)

(176) a “Roj derket” (tav)

b “Roj-o derket” (kesayet)

2.6. CÎNAVK

Di pirtûkên rêzimanê da cînavk wek: “cûre peyvên ku di nava hevokê da cihê navdêran digirin û hemû taybetîyên navdêran digirin ser xwe” ên hatî ravekirin. Yanî cînavk di nava hevokê da cihê navdêran digirin û taybetîyên navdêran yên wek; zayend, mêjer, rewş, tewangbarî hwd. digirin ser xwe. Em ê dibin vê sernavê da li ser cûreyên cînavka rawestin û di devoka Hekarîyê da cînavk, rewş û bikaranînen awarte bidin dîyarkirin.

Di pirtûkên rêzimanê ên Kurmancîyê⁵¹ da cûreyên cînavkan bi gelemperî wek; cînavkên kesane, cînavkên nîşandarîyê, cînavkên xwedîtîyê, cînavkên nedîyar, cînavkên girêkî, cînavkên pirsîyarî, cînavkên vejerok. hwd. tên dabeşkirin.

2.6.1. Cînavkên Kesane

Ev cûre cînavk, ji bo ku di hevokê da cihê kesan digirin wek cînavkên kesane ên hatî binavkirin. Di kurmancîyê de cînavk, ji du cûreyên cûda pêk tînin. Ji wan cûreyek xwerû û cûreya din jî tewandî ye. Tewangbarîya cînavkan jî dîsa heman wek tewangbarîya navdêran dertê pêş. Yanî cînavk jî heman wek navdêran dema di wan rewşên jêr da cih digire tê tewandin.

- Di rewşa ergatîvî da “*kirde*”
- Di rewşa akûzîtîf da “*bireser*”
- Hêmana ku ji piştî lêkerê cih digire
- Di ravekirin/ezafeyê da “*raveker*”

⁵¹ Bedir Xan, Celadet Alî (1994) - Bingehên Gramera Kurdmancî, Tan S. (2011)– Rêzimana Kurmancî, Ocek, N. (2014). Waneyên Rêzimana Kurmancî.

- Hêmanên ji piştî daçekan cih digirin

Yekjimar		Pirjimar	
Xwerû	Tewandî	Xwerû	Tewandî
Ez	min	em	me
Tu	te	hûn	we
Ew	wî(n)/wê(m)	ew	wan

Di devoka Hekarîyê da li gorî standarda Kurmancî li ser cînavkan çend guherîn derdikevin pêş. Herwiha hin caran di nava herêma Hekarîyê da jî rewşên cûda xuya dibin.

Tablo 2.3. Cînavkên kesane di Devoka Hekarîyê da.

Yekjimar		Pirjimar	
Xwerû	Tewandî	Xwerû	Tewandî
<i>ez/e</i>	<i>min/mi</i>	<i>em</i>	<i>me</i>
<i>Tu</i>	<i>te</i>	<i>hun/hûn/hin/hing</i>	<i>we/hewe/hingo</i>
<i>Ew</i>	<i>(e)wi-(e)wê</i>	<i>ew</i>	<i>(e)wan</i>

Çawa ku di devoka Hekarîyê qertafa tewangê yekjimar/nêr “**i**” bi gelemperî ber bi “**i**”yê ve diguhire bi heman awayê cînavka yekjimara kesê sêyem a nêr tewandî “**wî**” bi gelemperî wek “**wî**” diguhire.

(177) Çû Colemêrgê îşê **wi** hebû. (19)

(178) Êkê pêyê **wi** girt, êkê destê **wi** girt, êkê düwê **wi** girt, êkê sitûhê **wi** girt.

(25)

Pirjimara kesê duyem a xwerû “**hûn**” li Colemêrgê û Çelê tenê dengê “**û**” diguhire wek “**hun**” û “**hûn**” tê telafûzkirin, li herêma Şemzînan bi gelemperî wek “**hing**”, li Geverê li gorî eşîran “**hun**” û “**hûn**”, “**hing**” û “**hin**” tê bikaranîn.

(179) ew jît bêtê babo **hun** çî şolt ken. (27)

(180) e nizanim ka **hûn** golikêt kîj çelê ne (31)

(181) bêjît xudê e nizanim **hin** jî çî tiştin (9)

(182) **hing** bo welêt ken (18)

Pirjimara kesê duyem a tewandî “**we**” hin herêmên Hekarîyê (Colemêrg, Çel, Gever) wek “**hewe**” li herêma Şemzînan wek “**hingo/engo**” tê bikaranîn. lê di nava xelkê da forma “**we**” jî tê bikaranîn.

(183) Ez dê bo **hewe** serhatîya pîra mirov xwer bêjim. (19)

(184) **E** jî şitê **hewe** dê gel **hewe** şolkem. (27)

(185) Hing nizanin, **hingo** nekiryê. (11)

Herwiha herêma Rûbarokê/Nav Gerdîya ku nêzik sînorê Dîyana/Soran cih digire; hin caran hem ji bo pirjimara kesê duyem a tewandî “**we**” hem jî ji bo pirjimara kesê duyem a xwerû “**hûn**” heman cînavka “**hingo**” tê bikaranîn.

(186) **hingo nan xwar**

(187) **hingo kengî hatin**

Hin caran pirjimara kesê sêyem a tewandî “**wan**” wek “**ewan**” û yekjimara kesê sêyem a tewandî “**wi/wê**” wek “**ewi-ewê**” diguhire.

(188) **Ewan** lê da ew kuşt (14)

(189) **Ewê** jî hema bendekêt xwe yêt daran danane ser êk (27)

(190) **Ewi** îna pîyêt min ew ê dî kirin. (6)

Bi gelemperî nebe jî di yekjimara kesê yekem a xwerû “**ez**”ê da “**z**” dikeve wek “**e**” tê telafûzkirin û di yekjimara kesê yekem a tewandî “**min**”ê de “**n**” dikeve wek “**mi**” tê telafuzkirin.⁵²

(191) gotê, **e** çûme ser guhüşkê, **mi** guhüşk bo daqutan, **mi** kir nekir bo **mi** hinde guhüşk nehêlan. (19)

2.6.2. Cînavkên Nîşandarîyê

Cînavkên nîşandarîyê ew cûre cînavkin ên ku mirov bi wan tiştêkî nîşan dide, yan jî bi wan tiştêkî tê nîşandan. Ev cûre cînavk heman wek cînavkên kesane dibin du cûre ku cûreyek tewandî yek xwerû ye. Di pirtûkên rêzimanan da ev cînavk wisa hatine xuya kirin.

⁵² Ev yek di gelek devokên Kurmancîyê da tê dîtin.

	Yekjimar		Pirjimar	
	Xwerû	Tewandî	Xwerû	Tewandî
Dûr	Ew	wî(n)/wê(m)	ew	wan
Nêzîk	Ev	vî/(n)/vê(m)	ev	van

Wek tê dîtin cînavkên nîşandariyê yên xwerû “ew-ev” in. Yên tewandî “wî/vî-wê/vê-wan” nin ku ev cînavk “pêşiyê ji cînavkên xwerû tewîyane û wek ewî, ewê, ewan, evî, evê, evan çêbûne. Piştî jî “e”ya destpêka wan ketîye, ev bûye; “vî”, “vê”, “van” û ew bûye “wî”, “wê”, “wan”.”(Tan, 2011: 129). Di Kurmancîya standard da cînavkên nîşandarê yên xwerû û yên tewandî li gorî nîşandana tiştên nêzîk û tiştên dûr dibin du cûre, ev cudahî di dengên “w” û “v”yê da derdikevin pêş. Di nîşandana tiştên nêzîk da dengê “v”yê û nîşandana tiştên dûr da dengê “w”yê tê bikaranîn.

Dema em ji devoka Hekarîyê dinêrin hem bi Kurmancîya standard ra yek nîn e, hem jî di nava xwe da xwedîyê standardekê nîn e. “Li herêma Şemzînan cînavkeke nîşandarê tenê heye ew jî “ew” e. Sedema vê jî li herêma Şemzînan neyînîya cûdahîya dengên “v” û “w” yê, ji bo nîşandana tiştên nêzîk qertafên “-e” û “-ene” tên bikaranîn. (Haig & Öpengin: 2015:)

Tablo 2.4. Cînavkên Nîşandariyê û dîyardeyên nêzîkatîyê li Şemzînan

	Yekjimar			Pirjimar	
	Xwerû Nêr/Mê	Tewandî		Xwerû	Tewandî
		Nêr	Mê		
Dûr	ew	ewî	ewê	ew	ewan
Nêzîk	ewe	wîhi/ewîhi	wêhê/ewîhê	ewene/ ewete (ne)	Ewane / Ewa(n)tene

(Haig & Öpengin, 2015: 43)

Ev tablo (9) ji bo hemû dewerên Hekarîyê bicih e, lê herêm bi herêm hin formên cuda jî tên bikaranîn. Her çend jî li hin herêmên Hekarîyê cudahîya dengên “v” û “w”yê hebe jî, dîsa jî ji bo ji hev cudakirina nêzîk û dûratîyê “ev” û “ew” nahên bikaranîn; bi

gelemperî formên heman wek herêma Şemzînan tên dîtin. Di rewşa xwerû da hemû herêmên Hekarîyê wekhev e; yekjimar/dûr/*ew*, yekjimar/nêzîk/*ewe*⁵³ tên bikaranîn.

	Yekjimar		Pirjimar	
	Xwerû	Tewandî	Xwerû	Tewandî
Dûr	Ew	wi/ewi(n)-wê/ewê(m)	ew	wan/ewan
Nêzîk	Ewe	wi/(n)/wê(m)	ewe	wan/ewan

Di rewşa xwerû da awayê *dûr*:

Ew kê ye. *Ew* kê ne. (dûr)

(192) **ew** biravê min bû we kiri (19)

(193) **ew** rabû ser xwe. (31)

(194) **ew** bo çî ye tu tîni (10)

Di rewşa xwerû da awayê *nêzîk*:

Ew-e kê ye *Ew-e* kê ne (nêzîk)

(195) **Ewe** biraêt min in (9)

(196) Goti kuro **eve** kê serjê kirine (19)

(197) **Eve** simêt wê ne (25)

(198) Gûti la **ewe** kerê hevya me ya pare. (15)

(199) Gûti lêwestê **ewe ew** bî ha. (15)

(200) **Ewe** bo min, **ewe** bo te, **ewe** jî bo wi yê nana dî xari (14)

⁵³ Herêma Colemêrgê ji cihê dengê “w”yê dengê “v”yê jî bikartîne lê heman forma “ev-e” tê bikaranîn.

Di rewşa tewandî da awayê *dûr*

Dema em ji cînavkên nîşandarê yê **tewandî** dinêrin, di devoka Hekarîyê da dîsa li gel formên “*wi/wê, wan*” formên “*ewi/ewê, ewan*” jî bi awayekî berbelav tî bikaranîn. Di heman demê da ji bo nêzîkahî û dûrahîyê cûdahî ji “v-w”yê xuya nabe.

- (201) Mi dît **ewan** haj mi bîn (1)
- (202) **Ewi** îna pîyêt min **ewê** dî kirin (6)
- (203) **Ewê** jî hema bendekêt xwe yê daran danane ser êk (27)
- (204) **Ewi** destê xwe da gopalê xwe zivirandewe (27)
- (205) **Ewan** weto pirda mi (18)
- (206) **Ewan** destê xo nekire babê xo (17)
- (207) **Ewi** jî got nexêr ez dê xo gorî miletê xo kem (13)
- (208) **Ewan** lê da **ew** kuşt. (14)

Di rewşa tewandî da ji bo awayê *dûr* li gel van forman hin formên din jî hene wek: yekjimar/mê: *wahe/wahenê/ewahe/ewahenê*, yekjimar/nêr *wêhe/wêhenê/ewêhe/ewêhenê*, pirjimar: *wête, wêtenê, ewête, ewêtenê*

- (209) Tubla xo dirêj kirê gotê aha **wêhe** ye. (7)
- (210) Êkê nîşan da gûtê **wêhenê** ye. (27)

Di rewşa tewandî da awayê *nêzîk*:

Ji bo rewşa *nêzîk* ji bilî van cînavkên nîşandarê yê tewandî hin cûreyên cûda jî hene ku di devoka Hekarîyê da tî bikaranîn. wek: pirjimar- *wante, wanete, wane, ewane, ewante...* yekjimar- *wêhê/vêhê/, vihi/wihi, wihe/ewihê*

- (211) Gotê tu **wane**'d bîni (13)
- (212) Selik pîda bûn, yê texte, şiti **vêhê**(4)
- (213) Me reş da, kiçêt xo rabûn dane **wane** (5)
- (214) Şêr **wihet** zivirît ku rüvyekê jêlêl çite dew şêri. (30)
- (215) Xudê gel **wihe** ez dîtîm go... (3)

2.6.3. Cînavkên Vegerok

Di Kurmancîya standard da cînavkên vegerok, “xwe” û “hev/hevdu”⁵⁴ in. Cînavkên vegerok wek cînavkên kesane taybetîyên navdêran nagirin ser xwe, bi yek awayê û di hemû rewşan da heman wek xwe dimînin. Ev cînavk di devokên Kurmancîyê da tenê hêmana *kirdeyê* referans digire, lê di her fonksiyonekê da (kirde, bireser, raveker, dawîya lêkerê) tê dîtin. Ev yek di devoka Hekarîyê da jî heman wisa ye. Di devoka Hekarîyê da ji bo cînavka “xwe”yê Colemêrg û Çelê ji ber herêma Şemzînan ve ji ber ku dengê “xw”yê nahê bikaranîn, wek “**xo/xû**”yê tê telifûzkirin.

- (216) Dê risqi bo zelumê **xwe** bem. (2) (raveker)
- (217) Em dê heyata **xwe** ya berê Peyanisê bêjîn (19) (raveker)
- (218) Heke te **xwe** da nî gaê zer we... (10) (bireser)
- (219) **Xwe** hovêt erdi da (10) (kirde)
- (220) Ez dê **xû** gorî milletê **xû** kem (13) (bireser/raveker)
- (221) Min gote **xo**. (hedef/têrker)

Di heman demê da peyva “**xwe-xo/xû**” gelek caran ji derveyî cînavka vegerok û di hin fonksiyonên cuda da tê bikaranîn.

- *Ez xo Şemzîna bîm.* (wek daçek dûrahîyekê bi zêderoyî dide dîyarkirin)
- *Xo hingî heta nihe.* (wek daçek demekê ji destpêkê heta dema gotinê bi zêderoyî dide dîyarkirin)
- *Xo tu jî neşêyê.* (wek daçek rewşekê bi zêderoyî dide dîyarkirin)
- *Xo min negot nehê.* (di sererastkirina rewşên xelet hatî famkirin da tê bikaranîn)

Cînavka “hev/hevdu”ê ji bilî devoka Hekarîyê di hemû devokên Kurmancîyê da bi awayekî berbelav tê bikaranîn, di devoka Hekarîyê da ji cihê vê cînavkê her dem “*êk/yêk*” û “*êkudu*” tînin bikaranîn. Herwiha ev cînavk jî heman wek cînavka “xwe”yê ji bilî “*kirde*”yê di rewşên *bireser* û *têrker/dawîya lêkerê* da jî tê dîtin.

- (222) Sêvêt wi yêt pê ve, rengê wan **êkudu** nagirît. (27)
- (223) Mirov rûnête xarê suhbetekê gel **êk** biketin (4)

⁵⁴ Ev cînavk “hev” di hin pirtûkên rêzimanê da wek cînavka *berbihevîn* tê binavkirin.

(224) *Wan gotine êk.* (hedef/têrker)

(225) *irov êkudu-t xûn.* (bireser)

Ji ber ku gelek caran ji pêşîya cînavka “êk”ê pêşdaçekên “bi, ji, li, di”yê cih digirin bi gelemperî wek “*bi êk / pêk*”, “*ji êk / jêk*”, “*li êk / lêk*” “*di êk / têk*” tên bikaranîn. Di pirtûkên rêzimanê ên Kurmancîyê da wek cînavkên *lihevxiştî* tên binavkirin.

(226) Hate nav sipîndaran, em **jêk** vekirîn. (31)

(227) Hewt se **pêk** ve gehiştne gurgi. (25)

(228) Pîrejink jî bü, hêstîyê wê xwe **lêk** dawê. (4)

2.6.4. Cînavka Qertafi

Ev cînavk ji cihê peyvên bi dû lêkeran da tê digire û wek qertaf “ê” bi lêkeran ve dizeliqe. Peyvên ku bi dû lêkeran da cih digirin her dem di rewşa tewandî da ne û zayenda wan dîyar e. Lê belê ev cînavk dema wek qertaf tê lêkeran zayendê nade dîyarkirin.

Raste rast ji cihê cînavkên kesê sêyem yekjimar-*wê/wi* û pirjimar- *wan* digire.

(229) Zêrek dî jî da(w) -ê⁵⁵. (13)
da *wê/wi/wan*

(230) Wê derê me destekek day-ê. (3)
da *wê/wî/wan*

Ji cihê peyv/navdêran digire.

(231) Lîyanêt tê ra hati çûy êdî kes netkewt-ê. (2)
nedikewte **berfê**

Di vê mînakê da cînavka qertafi “ê” ji cihê “*berfê*” digire. yanî gotina “ne dikewte **berfê**” wek “net ket-ê” ya hatî kurtkirin.

2.6.5. Cînavkên Pirsyarîyê

Cînavkên pirsyarîyê, ew hêman in ku di hevokekê da hem peywira cînavîyê dibînin hem jî wateya pirsê ji hevokê didin barkirin. Di Kurmancîyê da cînavkên pirsyarîyê yên sereke “*kê/kî*” û “*çi/çî*” ne. Ji bilî wan çend cînavkên din ku wateya pirsê ji hevokê bardikin; “*kîjan û ku*” ne.

⁵⁵ Di devoka Hekarîyê da ji cihê dengê kelijînê “y”yê hin caran dengê “w” jî tê bikaranîn.

Ji van cînavkan di devoka Hekarîyê da ji “kê/kî”yê her dem “kê” tê bikaranîn. Ji “çî/çi”yê bi gelemperî “çi” tê bikaranîn. Herwiha hin caran “çi” wek “çu” diguhire û li aliyê Colemêrg, Çelê û hin dewerên Şemzînan ji cihê “çi”yê bi awayekî berbelav “ku” tê bikaranîn. “ku”ya di Kurmancîya standard û di hin devokên Kurmancîyê da cihan pisyar dike di devoka Hekarîyê da bi alîkarya hin paşdaçekan wek “kê û kî” tê bikaranîn. Ji cihê “kîjan”ê jî “”kîjik/kîşik” tê bikaranîn.

Kurmancîya Standard Devoka Hekarîyê

Kê/kî	Kê
Çî/Çi	Çi/Çu/Ku
Ku	Kê/Kî
Kîjan	Kîj/Kîş/Kîjik/Kîşik

- (232) Bê xeber kez nuzantê ez **kê** we me?(13)
(233) Goti kesê nezanî kanê **kê** ye? (16)
(234) Mi go b'Xudê e nizanim tu golikê **kîj** çêlê yi? (31)
(235) Digo xüşkê xüşkê zêreser **çi** ye?(8)
(236) Be ez **ku** lêb kem?(31)
(237) Go hewe **ku** kir bira, go çu ne dê ku ken?(26)
(238) Xudê e nihe jî nizanim **kîşk** e, **kîş** camêre?(6)

2.7. DAÇEK

Daçek, ji cûreyek peyvên erkdar in ku bi tinê serê xwe nahên çî wateyan lê dema bi navdêran ra tînan bikaranîn wan ji aliyên cihê ve watedar dikin. Li ser rêzimana Kurmancî cara ewil peyva “daçek”ê ji aliyê Celadet Alî Beedîrxanî ve di Hawarê da tê bikaranîn. C. A. Bedîrxan daçekan wek cureyek peyvên neguherbar tesnîf dike û van mînakên dide: *di, li, ji, di, de, ji re, der, digel, beri, paşî, pistî*. (Bedîrxan, 1998: 715). Di Kurmancîyê da daçek bi awayekî berbelav tînan bikaranîn. Dema em di Kurmancîyê da dabeşkirina daçekan dinêrin ji pêşîyê wek daçekên “xwerû”/“esil” û daçekên “navdêrî/biwêjî” ên bûy du beş. Daçekên xwerû/esil di nava xwe da û li gorî pozisyona xwe ên bûy sê beş; wek:

paşdaçek, pêşdaçek, dordaçek/bazindaçek⁵⁶. Gündoğdu (2019), vê yekê di çarçoveya zimanên derdorê/têkildar da dinirxîne; dibêje ku Kurmancî ku zimanekî Îranîye, di navbera zimanên Tirkî, Ermenî ku avaniya *paşdaçekan* di xwe da dihewînin û zimanê Aramî xwedîyê avaniya *pêşdaçekan* e, da ma ye. Ji bandora vê yekê Kurmancîyê da sê avaniyên daçekan derketine meydanê; devokên başûr, (Hekarî) bi gelemperî *pêşdaçek*, devokên Bakûr û Rojavayî *paşdaçek* û bi hevgihiştina paşdaçek û pêşdaçekan *bazindaçek* jî tên bikaranîn.⁵⁷ Daçekên biwêjî jî dibin du cûr e; yên ku tenê bi navdêrekê pêktên û yên bi navdêr û daçekek xwerû pêk tên.(Tan, 2011; Ocek, 2014; Muhammed, 2016).

Li ser daçekan, di devoka Hekarîyê da li gorî Kurmancîya standard hin guherîn derdikevin pêş ku ji wan guherînan hinek ji asta dengen da ne, hinek ji asta peyvnan da ne û hinek jî rasterast guherînen erkî ne.

Tablo 2.5. Daçek Di Devoka Hekarîyê Da

Daçekên Xwerû			Daçekên Biwêjî	
Pêşdaçek	Paşdaçek	Bazindaçek	tenê bi navdêrek	navdêr û bi daçekek xwerû
<i>li</i>	<i>da</i>	<i>di.....da</i> ⁵⁹	<i>gel</i>	<i>gel da</i>
<i>ji</i>	<i>ra</i> ⁵⁸	<i>di.....ra</i>	<i>ser</i>	<i>se(r) ra</i>
<i>di</i>	<i>ve/we</i>	<i>bi.....ve/we</i>	<i>ber</i>	<i>be(r) ra</i>
<i>bi</i>		<i>bi.....ra</i>	<i>lali</i>	<i>lali da</i>
<i>bê</i>		<i>jida</i>	<i>bin</i>	<i>bin da</i>
<i>bo</i>		<i>ji.....ve/we</i>	<i>pêş</i>	<i>pêş ve</i>
			<i>nav</i>	<i>nav da</i>
		

Daçekên xwerû, ku wek pêşdaçek, paşdaçek û bazindaçek dibin sê beş;

2.7.1. Pêşdaçek

Ew cûre daçek in ku li pêşîya navdêran cih digirin. Wek: *li, di, ji, bi, bê bo*. Ji van daçekan hinek serbixwe hinek jî herdem bi paşdaçekê ra tên bikaranîn. Di devoka Hekarîyê da **heger ku peyva berîya pêşdaçekê bi herfek bideng qetîya be, pêşdaçek**

⁵⁶ Bazindaçek (circumposition); binavkirina Samî Tan. (2018).

⁵⁷ Herwiha Gündoğdu (2019), Haig (2014) hêmana piştî lêkerê, hedef (goal)ê jî di vê çarçoveyê da dinirxînin. (binêr r. 127)

⁵⁸ Paşdaçeka “ra”yê di gelek devokên Kurmancîyê da wek “re”yê tê bikaranîn lê em dê di vê xebata xwe da her dem “ra”yê bikarbînin.

⁵⁹ Paşdaçeka “da”yê di gelek devokên Kurmancîyê da wek “de”yê tê bikaranîn lê em dê di vê xebata xwe da her dem “da”yê bikarbînin.

bi gelemperî ji peyva bera xwe ve tê zeliqandin. Bi vê zeliqandinê pêşdaçekên *li-l, di-d/t, ji-j/ş, bi-b/p* diguhirin lê pêşdaçeka *bê* her dem serbixwe dimîne.

Rewşa Asayî	Rewşa Awarte
Ez ê <i>li</i> Şemzînan	Ez ê- <i>l</i> Şemzînan
Ya <i>di</i> kitêbê da	Ya- <i>t</i> kitêbê da
Tu <i>ji</i> min dûrî	Tu- <i>j</i> min dûrî
Ez ê <i>bi</i> şûl im	Ez ê- <i>p</i> şûl im

(239) Ez ç*i-j* têlefûnê nizanim. (4)

(240) Wê bizmarê-*ş* pîyê min derêxi û paşî min bixwe. (25)

(241) Ew bîdonêt şîri me tijit kirin, me-*l* hêstirat kirin tînanandin. (19)

(242) Dayka mi jî-*t* xanî da girtibûn. (18)

(243) Min jêlêl destê xwe hovête ber, mawe-*b* destê mi (31)

(244) Ez bêje nîzîkê deh pazde rojeka dîsa mame-*l* wêrê. (6)

Hin caran peyva berîya pêşdaçekê her çend jî bi herfek bêdeng qetîya be, pêşdaçek bi peyva bera xwe ve dikeliye. Di vê kelijînê da yan herfek bideng dikeve navbera peyv û daçekê yan herfa dawîya peyvê ya bêdeng dikeve yan jî pêşdaçek rasterast bi herfa bêdenk ve tê kelijandin. wek:

(245) Goti dê hête xar-*j* be te. (10)

(246) Hinde-*j* me çine Culemêrgê, hinde-*j* me mîne gundi. (20)

(247) Kesê ha-*ş* birsumanatîyê nîn e, kesê ha-*ş* mirovanatîyê nîn e. (12)

(248) Xo kes-*t* gundi da netma (18)

(249) Tu gele-*b* xêr hati ser çava (13)

Di van hevokan da; hevokên (246,247,249)an da herfên bêdeng ên dawîya peyvên “hindek, hay, gelek” “y û k” yên ketî û pêşdaçekên “ji û bi” wek “j/ş û b” yên ji wan peyvên ve hatî kelijandin. Di hevokên (245,248)an da jî pêşdaçekên “ji, di” rasteras ji herfên bêdeng ve yên hatî kelijandin. Ji alîyê din ve û wek ku em jêr jî dibînin pêşdaçek her dem ne bi zeliqandî hin caran bi awayekî serbixwe jî tînanandin.

(250) Ew *li* wêrê ba. (3)

(251) Hêstira mi *bê* qawet e. (19)

(252) Xeberêt mezinan **li** erdi neden.(28)

(253) **Li** şehre Ehmedi derketin.(5)

(254) Hêstira **ji** Wanê tîna. (8)

(255) **Ji** ber şêr û pilingan. (27)

(256) **Bi** zor bêna wi ya hati. (31)

Bi qasî di datayên ku me berhev kirî da daçeka “di”yê herdem wek bazindaçek bi girêdayî paşdaçeka “da” û bi awayê “t/d” bi peyva bera xwe ve zeliqandî ya hatî bikaranîn.

Pêşdaçekên “bo” û “be”

Pêşdaçeka “bo” di devoka Hekarîyê da hem di erka “ji bo” hem jî di erka bazindaçeka “ji.....ra”yê da tê bikaranîn. Wateya “mexsed, armanç, hedef”ê diêxe hevokê. Lê hin caran watetya “sedem/sebeb”ê jî li hevokê bardike.

- *Min ev e bo te kirî*, (min ev e ji mexseda te kirî)

- *Bo çî tu naxwey*, (sedema nexwarina te çî ye)

(257) Vila **bo** xwe hinde tişt kirîn (3)

(vila **ji** xwe **ra** hinde tişt kirîn)

(258) **Bo** mesela insanatîyê, **bo** rehmê, **bo** îmanê, **bo** bursumanatîyê... (12)

(**ji bo** mesela insanatîyê, **ji bo** rehmê, **ji bo** îmanê, **ji bo** bursumanatîyê...)

(259) Te **bo** çî derê mi jê vekir. (19)

(te **ji ber** çî derê mi jê vekir)

Pêşdaçeka “bo”yê hin caran wateya “ji ber cihekê, hêlekê ve” jî diêxe hevokê.

(260) Ez siet nehê derketim, hatim **bo** gundi. (6)

(Ez siet nehê derketim, **ji ber** gundi **ve** hatim.)

(261) Hep sîlaha xo we bêjin hat bo memleketi.(13)

(hep sîlaha xo we bêjin *ji alîyê* memleketi *ve* hat.)

Dema em ji daçeka “be”yê dinêrin ev daçek di eslê xwe da “ber” e, ku herfa “r”ê ketî û wek “be” may. Di devoka Hekarîyê da bi gelemperî ji cihê daçeka “ji ber”ê tê bikaranîn û wateya “sedem/sebeb”ê ji hevokê bardike. Pêşdaçeka “be” hin caran wateya cihnişaniyê (ji ber, ji rex, li alî...) jî diêxe hevokê.

(262) Gundî naçinê, nevêrin çinê **be** şêr û pilingan. (27)

(gundî naçinê, nevêrin çinê *ji ber* şêr û pilingan)

(263) Hat **be** mari ra çû. (31)

(hat *ji rex* mari ra çû)

(264) Îna pezek îna dana **be** ruvî (10)

(îna pezek îna dana *pêşîya* ruvî)

Not:

Di devoka Hekarîyê da du hêman hene ku wek daçekan xuya dikin lê di eslê xwe ne daçek in, lewra ne ji alîyê demê ve, ne ji alîyê cihê ve û ne jî ji alîyê şeklê ve çî wateyeke berbiçav naêxin hevokê. Yek ji wan hêmanan “da” ye ku piranî ji alîyê Geverê herêmên nêzîk hidûdê Îranê tê bikaranîn. Ya din jî “be” ye ku di her derekê Hekarîyê bi awayekî berbelav tê bikaranîn.

Hemana “be”yê di nava hevokê da dikare her derekê cih bigre.

Ji pêşîya navdêran: **be** serdari got...

Ji pêşîya cînavkan: **be** min got...

Ji pêşîya lêkeran: **be** nehat.

Ji pêşîya daçekan: **be** bo çî nehat.

Ji pêşîya hokeran: **be** direng hat.

Ji paşîya pêweberan: ew çû **be**, ew serdar e **be**...

(265) **Be** navê dara me çî ye.(31)

(266) Babo **be** ez dê êre çikem la ez dê rabim çimewe. (4)

(267) Goti tamam, **be** heta sibeyî tête nêçîri bîne lali mi(n) (7)

(268) Em cuda kirîn **be**, **be** he kirneder bî, **be** çî bî. (18)

Dema em ji hêmana “da”yê dinêrin, ev hêman di devoka Hekarîyê da di van rewşên cuda da tê pêşberî me. Wek:

Paşdaçek: pare, yê berîkê **da**. (binêr: r. 96)

Dîyardeya demê: ez **da** pare dem. (binêr: r. 114)

Bê wate: kê pare dayê **da**.

Ji wan rewşan yek jî ew e ku heman wek hêmana “be”yê çî wateyan naêxe hevokê. Di vê rewşê da hêmana “da”yê her dem ji paşîya lêkeran cih digire.

(269) Paşa hêj sax, gotê **da** tu Xudê kes çî nebêjne Ehmedi. (5)

(270) Pîrê bêtê **da**, bihara pîrê ye, agrê xo bibe here. (9)

2.7.2. Paşdaçek

Ew cûre daçek in ku li paşîya navdêran cih digirin. Wek: *ra/re*, *da/de*, *ve*. Di devoka Hekarîyê da paşdaçek bi gelemperî bi serbixwe tên bikaranîn mînakên bazindaçekan pir kêmtên ber çav, lewra di devoka Hekarîyê da peywira bazindaçekan, paşdaçek bi tenê serê xwe dibînin. Paşdaçekên ku di devoka Hekarîyê da tên bikaranîn: **da**, **ra** û **ve** ne. Ji aliyê wateyê ve di navbera wan da cudahîyek hebe jî hin caran paşdaçeka “da” jî cihê paşdaçeka “ra”yê digire. Wek mînak:

Kitik pencerê ra çû

Kitik pencerê da çû

Lê belê ji aliyê wateyê ve paşdaçeka “ra” jî cihê paşdaçeka “da”yê nagire. Ji bo mînak: gotina “*Kitik pencerê da ket.*” Wek “*Kitik pencerê ra ket.*” nahê gotin. Ev jî vê yekê dide diyarkirin ku ji aliyê wateyê ve paşdaçeka “da”yê ji paşdaçeka “ra”yê firehtir e.

Paşdaçek bi gelemperî ji van peywirên jêr da bi cih dibin.

Da: Bi gelemperî di peywira bazindaçeka “*di....da*”yê da tê bikaranîn, lê hin caran cihê bazindaçekên “*ji.....da*” û “*di.....ra*” yê jî digire.

(i) Di peywira xwe ya gelemper “*di....da*”

(271) Ez banqê **da** şûlt kem. (28)

(ez *di* banqê *da* şûl dikim)

(272) Çi kes gundi **da** xandan nebî.(20)

(çi kes *di* gundi *da* xandan nebî)

(ii) Di peywira “di....ra”

(273) Çû xwe se xendekê **da** hovêt kiçek îna.(26)

(Çû xwe *di* se(r) xendekê *ra* avêt kiçek anî)

Ra: Bi gelemperî di peywira bazindaçeka “*ji ...ra*,”yê da tê bikaranîn. mînakên ku di erka bazindaçeka “*bi.....ra*”yê da nahên dîtin.

(274) Gûtê, wêrê **ra** çû. (31)

(Gûtê, *ji* wêrê *ra* çû.)

(275) Destê te wêrê **ra** yê şikesti. (4)

(Destê te *ji* wêrê *ra* yê şiketi)

Ve/We: *bi.....ve, ji.....ve*

(i) Di peywira bazindaçeka “*ji ve*”

(276) Dê kê **ve** çîn. (29)

(dê *ji* kê *ve* çîn)

(277) Rûvî çû dehlekê **ve** nivist. (30)

(Rûvî çû *ji* dehlekê *ve* nivist.)

(ii) Di peywira bazindaçeka “*bi ve*”

(278) zemanê berawê bîra mi da, danzde bîk kirasekê **we** yê weguhêstîyewe.(12)

(ji zemanê berê bîra mi tê danzde bûk *bi* kirasekê *ve* yê veguhêstî)

(279) pîyê xwe **ve** girêden. (2)

(*bi* pîyê xwe *ve* girêden)

2.7.3. Bazindaçek

Bazindaçek bi du hêmanan pêk tèn û yek dikeve pêşîya navdêrê û yek dikeve paşîya navdêrê, yan jî em dikarin bibêjin paşdaçek û pêşdaçek bi hev ra tèn bikaranîn. bazindaçek di devoka Hekarîyê da wek Kurmancîya standard berbelav nahên bikaranîn. Ku me jor jî dîyar kir di devoka Hekarîyê da bi gelemperî erka bazindaçekan, paşdaçek dibînin. Lê belê mînakên bazindaçekan jî hene ku li herêma Şemzînan li ber Colemêrg û Çelê ve zêdetir dibin.

(280) Ew rabî **ji** wê **ve** xwe da piş pišta birayê xwe (19)

(281) Ez mirim **ji** birsan **da** (25)

(282) Ew sûre ya-**t** Quranê **da**. (28)

(283) Te-**d** xewna xwe **da** yê dîtî(31)

(284) He-**t** malê **da** bîye.(27)

(285) E jî-**p** avê **ra** têm(31)

(286) Mar çû-**t** kuna xwe **ve**.(31)

(287) **Bi** bizmara **ve** kirban,(2)

Not:

Bazindaçeka **ji** **ra/re** ku di Kurmancîya standard da bi awayekî berbelav tê bikaranîn, di devoka Hekarîyê da qet nahê dîtin. Peywira vê bazindaçekê di devoka Hekarîyê da bi gelemperî pêşdaçeka” “*bo*”yê tê dîtin. Ku me jor jî da dîyarkirin, Gündoğdu (2019), dibêje ku bi bandora zimanê derdorê hin devokên Kurmancîyê bi gelemperî avanîya *paşdaçekan* (mîn: Meletî), hin devok avanîya *bazindaçekan* (mîn: Mûş) bikartînin, lê devokên Başûr (mîn: Hekarî) bi bandora zimanê Aramî jî avanîya *pêşdaçekan* bikartîne.

(288) Got-ê: Xudê hem hêstir **bo** mi ma hem aş **bo** mi ma.(19)

(jê **re** got: Xudê hem hêstir **ji** mi **ra** ma, hem aş **ji** mi **ra** ma)

Mîrov dikare di vê çarçoveyê da çend mînakên din jî zêde ke. Wek; bazindaçeka “*bi*.....*re*” jî di devoka Hekarîyê da nahê dîtin, ji cihê vê bazindaçekê jî pêşdaçekek biwêjî “*gel*” tê bikaranîn.

bi xwe re bibe

gel xwe bibe

(289) bêtê, kurê xwe jî **gel** xwe bibe (31)

(bê(j)tê, kurê xwe jî **bi** xwe **re** bibe)

Not:

Di devoka Hekarîyê da wek qertafekê “e” rasterast erka daçekan dibîne. Herwiha Huseyîn Muhemmed vê qertafê wek paşdaçek binavdike û dibêje: “Paşdaçekên –e û –î⁶⁰ tamamkerên hev in: -e li pey lêkeran tê bikaranîn, -î li pey birrên din yê peyvan: navdêr, rengdêr, cînavan, hoker, daçek.”(Muhammed, 2016: 68)

K.S.

D.H.

ji wê **re** got / *jê* **re** got

got-ê / got-e wê

ji min **re** got

got-e min

ji wê **re** bêje / *jê* **re** bêje

bêj-ê / bêj-e wê

ji min **re** got

got-e min

li ber gundî **ve** hat

hat-e gundi

(290) Gût-ê bendeke stranê bo min bêje. (25)

(jê re got/ ji wî/wê re got)

(291) Me ew kiçêt xo dan-e wi mirovi. (5)

(me ew kiçêt xo *ji* wî mirovî **re** dan)

2.7.4. Daçekên Biwêjî

Di Kurmancîya standard da daçekên biwêjî gelemperî bi bêjeyek û bi pêşdaçekek xwerû pêk tên. Yanî pêşdaçekên xwerû tên ba hin bêjeyan û ji aliyê peywirê ve daçekên nû avadikin. Ev cûre daçek “bi eslê xwe ji navdêr in. Di hin rewşan de ew wek navdêr û bi hemû taybetmendiyên navdêran tên bikaranîn lê carinan jî ew bi wek daçekan tev digerin û dixebitin.” (Muhammed, 2016, 37). *Wek: li ser, ji ber, bi rex, bi pêş, ji bo, li*

⁶⁰ Muhemmed ji bo “î”yê jî van mînakên dide:

- li peyv navdêran: *bangî* wan kir, *êrişî* me nekin, *nîşanî* wê da

- li pey rengdêran: hat *nêzikî* min, hûn *dûrî* wan in

- li pey cînavan: *hindî* wan, (bi) *qasî* van

- li pey hokeran: *zêdeyî* du saetan

- li pey daçeka: *li dijî* wan, *tevî* me (bi me re, li gel me)

Bi qasî ku mînakên hatî dayîn û li gorî datayên ku berhevkirî, qertafa “î” yê bi peywira daçekan di devoka Hekarîyê da bi berbelavî nahê bikaranîn.

gel... Lê dema em ji devoka Hekarîyê dinêrin, daçekên biwêjî bi gelemperî yan **bi tenê serê xwe**, yan jî **bi paşdaçekan ra** tên bikaranîn.

Bi tenê serê xwe:

- (292) Ez hovêtmê **ser** pişta hespi. (6)
- (293) Hirya xwe birba **ser** çema şuştiba. (2)
- (294) Were, Xudê dê **gel** me têştê xoyn. (10)

Bi paşdaçekan ra:

- (295) Çi qeder zeman **ser da** çûy (27)
- (296) Xelkê **wêrê ra** tê (30)
- (297) Ez **zor da** biçim dîsa befir dê qulipît (1)
- (298) **Nişkê da** paşa ciniqî(5)
- (299) Sê zêr **gel da** bîn bo rêkê(13)
- (300) Zivirî ko çil suarên **dü ve** tên (31)
- (301) Tu nebêje **pêj da** yê tatîye Gelêşim.(18)
- (302) **Piş da**, mi xo bara dî da hovêt.(18)

2.7.5. Kelijîna Daçekan bi Cînavkan ra (Contracted Adpositions)

Carînan daçek bi cînavkên kesê sêyem (wî, wê, wan) ra tên kelijîn û bi vî awayî tên bikaranîn. Haig & Öpengin (2015) vê yekê girêdidin dengsazîya Kurmancî; lewra di Kurmancîyê da peyv bi dengê [i]yê naqetin û pêkhatinek wisa derdikeve meydana. Ev bikaranîn di devoka Hekarîyê da bi awayekî berbelav tê dîtin.

Bi wê/wî/wan – pê

Ji wê/wî/wan – jê

Li wê/wî/wan – lê

Di wê/wî/wan – tê

- (303) Wan çil deste birayan ew tinê **jê** xilas bü. (31)
- (304) Revî çû birayê wi xwe **lê** negirt hêstira xwe bir u çû (19)
- (305) Dê mü ristiban dê **pê** çêkiriban heta xillas kir (2)
- (306) Kîskekê dê çêkem xir parê xo zêrê xo keme **tê** da (13)

2.8. LÊKER

Komepeyvên “lêker”î ev peyv in ku bi awayekî rêzimanî hereket, bizav, kar û rewşekê didin dîyarkirin. Ev cûre peyv di ferheng û pirtûkên rêzimanê da wek kome peyvên “kiryar, çalakdar, bizavî” tên tesnîfkirin.

Lêker li gorî pîvaneyên wekî teşeya lêkerê, erka (fonksiyona) wê, wate (semantîk) û peywira wê ya ji hêla avanîyê (bîna/voice) ve tên vekolan.” lê ji aliyê perspektîfa rêzimana klasîk ve, bi awayekî giştî lêker li sê beşan tên levakirin. mîna I) ji aliyê binyatî ve lêker (wekî lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, û lêkerên hevedudanî), II) ji aliyê avanîyê ve lêker (lêkerên têper, lêkerên teneper, lêkerên lebatî, lêkerên tebatî, lêkerên dançêker, lêkerên vegerok û lêkerên berbihevîn) û III) ji aliyê teşeyê ve (lêkerên rêzîkî û lêkerên nerêzîkî). (Farqînî, 2018: 24)

Wek tê dîtin cûre peyvên “lêker”î di gelek aliyên cuda da tên senifandin û nirxandin lê di vê beşê da em bi kitekityê li ser lêkeran ranawestin, em ê di çarçoweya taybetî û fonksyonên *lêkerê* da li ser devoka Hekarîyê rawestin û bikaranînên cuda dîyar bikin.

Lêker ji derweyî hevokê di rewşa *raderî* (infinitive) da ne. Lê dema di nava hevokê da tên bikaranîn rewşa xwe ya *rayekî* (stem) digirin û bi hin qertafan taybetîyên wek *dem*, *kes*, *raweyan* digirin ser xwe. Di Kurmancîyê da lêker di awayê *raderîn* da wekî navdêran derdikevin pêşberî mirov û “bi *raye* û *qertafekê* pêk tên”.

(307) Hat-in,
Xist-in,
Xwar-in,
Kir-in,
An-în,
Da-n, (Bedir Han & Lescot, 2004: 119).

Wek di mînakên jor da jî dîyar e, di Kurmancîyê da rader bi qertafa “in/în”ê pêk tê, lê dema rayeka lêkerê bi tîpek bideng qetîyabe “i” dikeve, tenê “n” dimîne. Di devoka Hekarîyê da jî awayê raderî heman wek Kurmancîya standardê ye.

Di Kurmancîyê da li ser senifandina binyada lêkeran wekhevî û standardek nîn e. Di pirtûkên rêzimanê û ji aliyê zimannasan ve senifandinên ji hev cuda tên pêşberî me. Ji bo mînak ji aliyê binyadê ve lêkeran, Bedir Han & Lescot (2004), lêkerên xwerû,

hevedudanî û biwêjî; Tan (2011), lêkerên xwerû û nexwerû; Ciwan (1992) lêkerên xwerû, lêkerên hevedudanî, lêkerên dariştî û lêkerên biwêjî, wek çar cûreyan dabeş dike. Haig (2002) û Gündoğdu (2016) jî di Kurmancîyê da lêkeran diken du beş; lêkerên xwerû û yên hevedudanî, herwiha lêkerên hevedudanî jî di nava xwe da û li gorî pêkhatina wan wek çar beşan dabeş dike; *nav+lêker*, *daçek+lêker*, *qertaf+lêker*, *hevalnav+lêker*. Xebatên ku li ser vê mijarê hatîye kirin da, di senifandin û binavkirinê da tevlihevîyek derxistîye meydanê; ji bo lêkerên hevedudanî, Bedir Han & Lescot dibêjin ku “lêkerên hevedudanî, bi lêkerên xwerû û ji zêdekirina hin hêmanên ji derweyî lêkeran pêk tên.” û van mînakên didin.

(308) *Da-hatin*

Pê-xistin,

Ve-xwarin,

Der-anin,

Baz-dan,

Ava kirin, (Bedir Han & Lescot, 2004: 119).

Lê belê ev danasîn û ev mînak di gelek xebat û pirtûkên rêzimanê ên Kurmancî⁶¹ da ji bo lêkerên darştî⁶² tên dayîn. Ji ber vê tevlihevîyê em jî di xebata xwe da lêkeran wek du beşan dê bisenifînin; lêkerên xwerû yên hevedudanî (tablo. 11).

Tablo 2.6. Ji aliyê avanîyê ve lêker.

Lêkerên Xwerû	Lêkerên Hevedudanî			
	nav+lêker	hevalnav+lêker	daçek+lêker	qertaf+lêker
<i>birin</i>	<i>derman dan</i>	<i>reş kirin</i>	<i>ber avêtin</i>	<i>raketin</i>
<i>kirin</i>	<i>birîndar kirin</i>	<i>xar kirin</i>	<i>têk birin</i>	<i>dakirin</i>
<i>xwarin</i>	<i>rê xistin</i>	<i>ronahî bûn</i>	<i>lêk xistin</i>	<i>vekirin</i>

⁶¹ Farqînî, Z. (2018). Ji Aliyê Binyatî ve Lêker û Lêkerên Veqetînbar di Zaravayê Kurmancî de, The Journal of Mesopotamian Studies, <http://jms.artuklu.edu.tr/tr/issue/38846/427751> (31.01.2020) Ciwan, M. (1992). Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi (kurmanc lehçesi), weşanên Jîna Nû, Balînge, r.81. Ocek, N. (2014). *Waneyên - Rezimana Kurmancî*. Van: Weşanên Sîtav. Tan, S. (2011). *Rêzimana Kurmancî*. İstanbul: Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê.

⁶² Di hin pirtûkên rêzimanê yên Kurmancîyê da lêkerên “*dariştî*” wek lêkerên “*pêkhatî*” ên hatî binavkirin.

Dem a em ji alîyê lêkersazîyê ve ji devoka Hekarîyê dinêrin bi gelemperî awayê pêkhatina lêkeran heman wek standardê ye. Lê lêkerên hevedudanî ku bi daçek û lêkeran pêk tên, di devoka Hekarîyê da pir kê m tên biikaranîn.

2.8.1. Çend Hêman û Bikaranînên Cuda

Di devoka Hekarîyê da bi gelemperî nebe jî herêm bi herêm hin qertaf û bikaranînên cuda xuya dibin. Ji wan qertafan yek “we” ye ku ji bandora zaravayê Soranî ketîye devoka Hekarîyê ku taybetî ji herêma Şemzînan tê bikaranîn, ev hêman tê gelek lêkeran û wateyên cûda ji wan bardike. Herwiha piştî qertafên kesandinê cih digire. Ev hêman “we” di sê rewşên cûda da wek paşgîrêkê tê lêkeran:

(i) Wateya “paş ve”yê diêxe lêkerê.

Bire-*we* paş ve bir

Îna-*we* paş ve anî

Da-*we* paş ve da

Çû-*we* paş ve çû

(309) Wextê gêrî zivirî-*we*, çil suaran rêke pêşyê bikuje. (31)

(310) Babê mi eyn hate-*we* cîyê xwe (19)

(311) Goti bûka xo carek dî bire-*we* çû mala xo... (16)

(312) Êca hinde ca du sala xelkit bir netîna-*we*. (2)

(313) Zînêj dew Memê rakiri birye-*we* Cizîra Botan. (29)

(314) şûna xo dîsa kêle bime-*we*, (1)

(ii) Bi peywira hêmana pêşgîra “ve”yê

Kire-*we* ve-kir

Xare-*we* ve-xwar

Şarte-*we* ve-şart

(315) La wê rojê mi telfin bo kire-*we*. (17)

(iii) Bi wateya “ber bi rewşa berê”

(316) yê çêbüye-*we* şiti min te. (4)

Di devoka Hekarîyê da dema ku lêkerên Dariştî û lêkerên Hevedudanî di dema niha da tèn bikaranîn yan jî dema qertafên neyînîyê digirin, hin caran qertafa dema niha û qertafa neyînîyê ji bervajî Kurmancîya standard tèn serê lêkerê, yanî ji berîya pêşgirê cih digirin.

Standard	Hekarî
Ra- <i>di</i> -zêm	<i>di</i> -razêm
Ra- <i>na</i> -zêm	<i>na</i> -razêm
Hil- <i>di</i> -girim	<i>di</i> -hil-girim
Hil- <i>na</i> -girim	<i>na</i> -hil-girim

(317) Ma heko, e **ne**-ra-bim bo xwe risqekêb gerim. (25)

(318) Çît xo malê da-**t** ve-şêrît. (9)

(319) Heqê xwe jî **ne**-hel-girt. (27)

(320) Hindî hatê xwej desta **ne**-der-êxist.(29)

(321) Çîte ber sîngê wi-**t** ra-westît. (27)

Li herêma Şemzînan û bi taybetî jî deverên nêzîk “sînorê Iraqê”, hin lêker di forma nêzîk zaravayê Soranî da tèn bikaranîn. Wek:

(322) *Birin* *birdin*

Kirin *kirdin*

Mirin *mirdin*

Xarin *xardin*

Lê di van mînakên da tişta ku diguhire awayê *raderîn* nîn e, awayê *raderîn* heman wek standardê ye; “bird-in, kird-in, mird-in, xard-in” tişta ku diguhire kok/rayeya lêkerê ye.

2.8.2. Qertafên Kesandinê

Qertafên kesandinê li gorî dema berdest û li gorî dema çûyî, herwiha li gorî gerguhêz û negerguhêzîya lêkerê wek paşgiran tèn lêkeran. Heger ku dem borî û lêker gerguhêz be li gorî bireserê hereket dikin (ergative alignment), heger ku dem berdest be lêker gerguhêz jî be li gorî kirdeyê diguhirin (accusative alignment). Ji aliyek din ve “her

tim li gorî cînavkên xwerû tên bikaranîn; heke kirde ji cînavkên xwerû be lêker li gorî kirdeyê, heke bireser be, lêker li gorî bireserê tene dawîya lêkeran.”(Tan, 2011: 138). Di tabloyên jêr da di Kurmancîya standard da qertafên kesandinê (tab. 12). Û di devoka Hekarîyê da li gorî standardê berhevdana qertafên kesandinê. (tab. 13).

Tablo 2.7. Qertafên Kesandinê di Kurmancîyê da

Kes	Qertafên Kesandinê	
	Berdest	Borî
kesê1.Yekj.	-(i)m	-(i)m
kesê2.Yekj.	-î/-e	-(y)î
kesê3.Yekj.	-e	- Ø
kesê1,2,3.Pirj.	-(i)n	-(i)n

Çavkanî: Haig-Öpengin (2015)

Tablo 2.8. Bi Kêşana Lêkera “kirin/çûn”ê Qertafên Kesandinê di Standard û Devoka Hekarîyê da

Kes	Kurmancîya Standard		Devoka Hekarîyê	
	Dema Niha	Dema Borî	Dema Niha	Dema Borî
YK1 ⁶³	dik- <i>im</i>	çû- <i>m</i>	dik- <i>em</i> ⁶⁴	çû- <i>m</i>
YK2	dik- <i>î</i>	çû- <i>y</i>	dik- <i>ey</i>	çû- <i>y</i>
YK3	dik- <i>e</i>	çû-	dik-(e) <i>t</i>	çû-
PK1	dik- <i>in</i>	çû- <i>n</i>	dik-(e/i) <i>n</i>	çû- <i>n</i>
PK2	dik- <i>in</i>	çû- <i>n</i>	dik-(e/i) <i>n</i>	çû- <i>n</i>
PK3	dik- <i>in</i>	çû- <i>n</i>	dik-(e/i) <i>n</i>	çû- <i>n</i>

Li ser qertafên kesandinê di devoka Hekarîyê da li gorî Standardê guherîna herê berbiçav di dema *berdest* da qertafa kesê sêyema yekjimar e, ku di standardê da “e” ye lê di devoka Hekarîyê da “t” digire.

(323) Paşa jî gehiştê; bereket bî-t şivano. (31)
(be)

⁶³ YK1: Yekjimar kesê yekem, YK2: Yekjimar kesê duyem, YK3: Yekjimar kesê sêyem, PK1: Pirjimar kesê yekem, PK2: Pirjimar kesê duyem, PK3: Pirjimar kesê sêyem.

⁶⁴ Di devoka Hekarîyê da qertafa dema niha bi gelemperî wek “d/t” tê kurtkirin û bi peyva bera xwe tê zeliqandin. Herwiha di devoka Hekarîyê da ji bo dema niha ji bilî qertafa dema niha hêmanek din jî tê bikaranîn ku em ê di mijara deman da ser vê yekê birawestin.

- (324) Be qîrar ew bû-t ez nehêlim piçûk mihe bû-t te bikuj-ît.(5)
 (be) (be)
- (325) Mal ya jinkan e, zelum çî-t şolke-t bo xwe. (20)
 (di-çe) (şol-di-ke)
- (326) Xuda-t zan-ît gêsik destê mi kete xar. (18)

Ji bilî vê cudahîyê qertafa yekjimara kesê sêyem jî li gorî koka lêkerê hin caran wek “y” hin caran “i” hin caran jî wek “î” diguhire.

- (327) Hema tu min bixw-ey gele baş e. (25)
- (328) Tu bêj-i ew e kurê mi ne bût. (5)
- (329) Ge te piçûk peyda bü tu bêj-e mi. (5)
- (330) Gotê vlahî tu dê bo mi bêj-i, tu çî't ken-î,(7)

Qertafên kesandinê ne tenê lêker, tên navdêr, rengdêr û cînavkan jî;

- (331) Gotê wila **tu** kurê min **i**. (5)
- (332) **Ew** jî he gundîyê me **ye**. (12)
- (333) Go be wêca **em** dê ku ke-**n**, **em** misafir **in** jî. (26)
- (334) **Hing** herdu jî, birayêt min **in**. (17)

2.8.3. Di Devoka Hekarîyê da Neyînîkirin

Di Kurmancîyê da çar qertafên neyînîkirinê hene; *na, ne, ni, me*. Ji wan qertafan, “me” ku qertafa neyînîkirinê ya fermanîyê ye; “*bi-şo/me-şo*” ev qertaf di devoka devoka Hekarîyê da nahê bikaranîn. Ji cihê vê qertafê bi gelemperî “ne” tê bikaranîn; “*bi-şo/ne-şo*”. Qertafa “ni”yê bi awayekî sînordar tenê di çend lêkeran da, di dema fireh da tê dîtin; “*ni-zanim, ni-karim*”. Dema em qertafên “ne/na”yê dinêrin, Gündoğdu (2015a) vê yekê li gorî deman dinirxîne; qertafa “na”yê di dema niha/fireh da tê bikaranîn û rasterast cihê qertafa “di”yê digire. Qertafa “ne”yê jî di demên borî û di neyînîkirina raweya daxwazîyê da ji cihê “bi”yê digire. Lê belê di *dema borîya berdest* da ji ber ku dem borî ye, ji cihê qertafa “di”yê “ne” digire. (tablo. 14). Di devoka Hekarîyê da jî neyînîkirin bi gelemperî wisa pêk tê. Lê wek me jor jî dîyarkirin, di lêkerên hevedudanî da hin caran qertafa neyînîkirinê wek pêşgirekê bi serê lêkerê cihdigire.

Tablo 2.9. Bi Kêşana Lêkera “çûn”ê li gorî Deman Neyînîkirin di Devoka Hekarîyê da

Kes	Dema Bê	Dema Niha	Dema Fireh	Dema Borî	D. Borîya Dûdar ⁶⁵	Çirokîya D. Borî ⁶⁶	D. Borîya Berdest
YK1	dê (bi)çim/ na-çi-m	(y)ê di- çim/(y)ê na- çi-m ⁶⁷	di- çim/na- çi-m	çûm/ne- çû-m	(y)ê çûy/ne-çû- m-e	çû-bîm/ne- çû-bî-m	di- çûm/ne- dî-çû-m
YK2	dê (bi)çi/ na-çi	(y)ê di- çi/(y)ê na-çi	di- çi/na-çi	çûy/ne- çû-y	(y)ê çûy/ne-çû- y-î	çû-bîy/ne- çû-bî-y	di-çûy/ne- dî-çû-y
YK3	dê (bi)çît/ na-ç-ît	(y)êt di- çît/(y)ê na-ç- ît	di- çît/na- ç-ît	çû/ne-çû-	(y)ê çûy/ne-çû- y-e	çû-bî/ne- çû-bî	di-çû/ne- dî-çû-
PK1	dê (bi)çin/ na-ç-in	(y)ê di- çin/(y)ê na- ç-in	di- çin/na- ç-in	çûn/ne- çû-n	(y)êt çûy/ne-çû- n-e	çû-bîn/ne- çû-bî-n	di-çûn/ne- dî-çû-n
PK2	dê (bi)çin/ na-ç-in	(y)ê di- çin/(y)ê na- ç-in	di- çin/na- ç-in	çûn/ne- çû-n	(y)êt çûy/ne-çû- n-e	çû-bîn/ne- çû-bî-n	di-çûn/ne- dî-çû-n
PK3	dê (bi)çin/ na-ç-in	(y)ê di- çin/(y)ê na- ç-in	di- çin/na- ç-in	çûn/ne- çû-n	(y)êt çûy/ne-çû- n-e	çû-bîn/ne- çû-bî-n	di-çûn/ne- dî-çû-n

(335) Jintîyan wan çav pê **na**-rabin hindî baş e (27)

(336) Gût çub des min **na**-kevît ez b'xwem. (30)

(337) Gûtê here, em **na**-hên, **ne**-çûn. (26)

(338) Çaveke temîz jî **ne**-înîtin ew jî **ne**-xweş e (20)

(339) Goti jinkê belaa xo lê **ne**-ve-kirewe. (7)

(340) Tu kub key e(z) te **na**-danêm. (10)

2.8.4. Avanîya Lêkeran (Voice)

Wek me jor da dîyarkirin “*lêker*” di gelek alîyên cuda ve tên nirxandin û avanîya lêkeran jî kategorîyek serbixwe ye ku “taybetîyên rêzimanî yên ku li gorî têkilîya kirde û bireserê li gel lêkerê derdikevin holê. Avanîya lêkeran ji alîyê bireserê ve *gerguhêz û negerguhêz*, ji alîyê hebûna kirdeyê ve *lebatî û tebatî*, û bi girêdayî jimara kirdeyên mantiqî ve *dançêker û hevayî* ne.” (Hengirmen, 2009: 94). Di Kurmancîyê da ji alîyê

⁶⁵ Di devoka Hekarîyê da bikaranîna dema borîya dûdar bi gelemperî wisa ye, lê bikaranîna: “çûm-e, çû-yî, çû-ye, çûn-e” jî tê dîtin.

⁶⁶ Di devoka Hekarîyê da, “bîm, bîy, bî, bîn” standart nîn e, bikaranîna “bûm, bûy, bû, bûn”ê jî he ye.

⁶⁷ Qertafa “di”yê di devoka Hekarîyê da bi gelemperî wek “t/d” tê kurt kirin û hêmana bera xwe ve tê zeliqandin. Di vir da, ji bo ku mijar bê fam kirin, me heman wek “di” dîyar kir.

avanîyê ve “lêker dibin sê bir, “*gerguhêz/negerguhêz, lebatî/tebatî û dançêker.*”(Tan, 2011: 298).

2.8.4.1. Gerguhêzî û Negerguhêzî (transitîf/intransitîf)

Gerguhêzî û negerguhêzîya lêkeran li gorî bireserê xuya dibe, heger ku lêkerek di dema axavtinê da bireserê bigire wek gerguhêz û heger bireserê negire wek negerguhêz tê qebûlkin. Ji alîyê din ve, ji ber ku Kurmancî zimanek nîv ergatîv e, di dema borî da kirde li gorî gerguhêzîya lêkerê ditewe û lêker li gorî bireserê hereket dike.

Gerguhêzîbûn, ji bo hemû lêkeran nebe jî li gorî pirsên “çi/kê/kî” xuya dibe. Heger bersivên pirsên “çi/kê/kî” ku lêkerê tên kirin ji kirdeyê cuda bin, ew lêker gerguhêz in, lê herger ku persiva wan pirsan kirdeyê bidin, ew lêker negerguhêz in.⁶⁸ Wek:

Hevok: “Gulê sêv *xwar*, Gulê sêv *bir*, Gulê sêv *şuşt*, Gulê *çû*, Gulê *hat*, Gulê *kenî*,”

Pirs: “*çi/kê/kî xwar, çi/kê/kî bir, çi/kê/kî şuşt, çi/kê/kî çû, çi/kê/kî hat, çi/kê/kî kenî?*”

Bersiv “Gulê sêv *xwar*, Gulê sêv *bir*, Gulê sêv *şuşt*, **Gulê çû**, **Gulê hat**, **Gulê kenî**,”

Wek tê dîtîn bersiva pirsên “çi/kê/kî” ên ku lêkerên “*xwar*, *bir* û *şuşt*”ê hatî kirin ji kirdeyê cudatir in. Lê bersiva pirsên “çi/kê/kî” ên ku lêkerên “*çû*, *hat*, *kenî*”yê hatî kirin kirde “Gulê” bixwe ye. Yanî lêkerên ku bersiva “kirde”yê didin negerguhêz û yê ku bersiva wan ji kirdeyê cudatir (bireser) gerguhêz in.

Mijara gerguhêzî û negerguhêzîyê di devoka Hekarîyê da heman wek standardê ye.

a) Gerguhêz:

(341) Sîpêdekê rabû caba zavayê xwe **rêkir**. (27)

kê rêkir?

⁶⁸ Awayek din yê diyarbûna gerguhêzîyê; di rewşa tebatî da kirdarbûyîna bireserê ye, ku di rewşa tebatî da bireser di heman demê da kirde ye jî.

- *Gul kirîn / gul hatine kirîn* (gerguhêz)
- *Gulê çû / gule hate çûyîn** (negerguhêz)

Wi rêkir.

çi rêkir?

caba zavayê xwe.

(342) Dayka min kerkîtkek jî lali Yaqûyê Cuhü **kirî**. (2)

Kê kirî?

Dayka min.

Çi kirî?

Kerkîtkek kirî.

b) Negerguhêz:

(343) Çît, nêrîtinê, hêstirekêl nav bürekê nivisti. (25)

Kê diçît? kê nêrîtinê? kê nivistîye?

Ew diçît, ew nêrîtinê, hêstirek nivistîye.

(344) Ewe çarde sale ez çûy. (13)

kê çûye?

ez.

2.8.4.2. Lebatî û Tebatî

Avanîya lêkeran ya *lebatî û tebatîyê* li gorî hebûna kirdeyê, yanî li gorî dîyarî û nedîyarîya kirdeyê xuya dibe. Lêkerên ku kirar/kirdeya wan dîyar wek lêkerên *lebatî* tên qebûlkin. Di vê avanîyê da karê ku tê kirin ji alîyê kê ve tê kirin dîyar e. Di lêkerên bi avanîya *tebatî* da kirar/kirde nedîyar e. Yanî tişta ku tê kirpandin “karê ku tê kirin”e û kirar nedîyar e. Di devoka Hekarîyê da avanîya lêkerên *lebatî û tebatî* heman wek standardê ye.

a) Lebatî

Karê ku tê kirin ji alîyê kê ve hatîye kirin, dîyar e. Hêmana derdikeve pêş û çalakdar kirde ye.

(345) Babê Memê jî **gûtê**: (tu) **rabe, here** deng Cizîrê **bike**...(29)

(346) **Goti** pişti hingî, (ew) yê **rabûy**, **çûy** Mam Hebûb hemi ket kete yêt **tînayne** bini. (4)

(347) (*Em*) da **çîn**, met **gotê** biranê, hing **nizanin**, hingo **nekirye**. (11)

b) Tebatî

Di vê avanîyê da kirara/kirde tewgerê pêk tîne nedîyar e û tiştê dertê pêş/kirpandin karê ku bandorê *bireser* ê dike ye. Ev avanî bi alîkarîya lêkera *hatinê* pêk tê. Herwiha “avanîya tebatî ji lêkerên gerguhêz çêdibe. Ji ber ku lêkerên bêyî *bireser* nikarin bibin tebatî.” (Tan, 2011: 299). Di avanîya tebatî da lêkera “*hatin*”ê li gorî dem û kesan tê kişandin û lêkera bingehîn jî her dem di rewşa raderîn da ye.

Kirde – Ø (Nedîyar) + Bireser + “*hatin*” + lêkera bingehîn / (di rewşa raderîn da)

Mîn: *ez* *hatime* *kuştin*
Kirde – Ø Bireser “*hatin*” lêkera bingehîn / (di rewşa raderîn da)

Kê kuşt?(kirde) - Nedîyar.

Kê hate kuştin?(bireser) - Ez.

Tablo 2.10. Avanîya Tebatî di Devoka Hekarîyê da

Kes	Dema Bê	Dema Niha	Dema Borî
YK1	dê hê-me xwarin	ê tê-me xwarin	hatime xwarin
YK2	dê hê-ye xwarin	ê tê-ye xwarin	hatîye xwarin
YK3	dê hê-te xwarin	ê tê-te xwarin	hate xwarin
PK1	dê hê-ne xwarin	ê tê-ne xwarin	hatine xwarin
PK2	dê hê-ne xwarin	ê tê-ne xwarin	hatine xwarin
PK3	dê hê-ne xwarin	ê tê-ne xwarin	hatine xwarin

(348) Êcat bêjin, sitran jî **tête** gûtinê. (27)

(349) Gûtê dîwanek **hate** girtinê vê Colemêrgê. (31)

(350) Meyteba wan **nehate** qapatkirin. (3)

(351) Heta dazde bîka jî bîra mi da, dewatêt wan êt **hatye** kirin.(12)

Hin lêkerên *negerguhêz* bi paşgira “*andin*”ê dibin *gerguhêz* û bi wî awayê li avanîya *tebatî* tèn kêşan. Wek:

Gerîn – Ger-andin

zarok li çîya hatine gerandin.

Razan – raz-andin

Zarok hatine razandin

Firîn – firandin

Kew hatine firandin

2.8.4.3. Avanîya Dançêker

Di avanîya dançêker da ji bervajî avanîya tebatî kirde dîyar e, lê kirde, karê ku tê kirin bixwe nake, wek navgînekê bi kesek din dide kirin. Di Kurmancîyê da avanîya dançêker bi alîkarîya lêkera “*dan*”ê pêk tê û lêkera bingehîn heman wek avanîya tebatî di rewşa raderîn da ye.

Kirde + Bireser + “*dan*” + lêkera bingehîn / (di rewşa raderîn da)

Mîn: Serdari *ez* *dame* *kuştin*
Kirde Bireser “*dan*” lêkera bingehîn / (di rewşa raderîn da)

Kê kuşt? - nedîyar.

Kê da kuştin(kirde) - serdari

Kê hate kuştin?(bireser) - *ez*.

(352) Yanî büka nû ye, (wan) çi şol ew pê **nedane** kirinê. (27)

(353) Wextê pezbirê em çûn me pezê xwe, me **da** birîn. (6)

2.8.5. Dem-Rawe-Aspect (DRA)

Dem û rawe, du kategorîyên têkildar yên rêzimanî ne. Rawe; kar, bizav û rewşa ku helwesta tewgera axêver pêk tîne, dide dîyarkirin. Di Kurmancîyê da du cûre rawe hene. wek; ““*raweyên pêşkerî*” û “*raweyên daxwazî*”” (Tan, 2011: 256). *Raweyên pêşkerî* (indicative mood), di hevokê da dema karekê nîşan didin, gelo ka ew kar pêk hatîye, yan pêk nehatîye û di derheqê karê ku berdewam da jî agahîyê didin. *Raweyên daxwazî* (subjunctive mood), jî behsa karekê pêknehatî yan jî pêkhatina wî karî tê xwastin dike.

Di Kurmancîyê da lihevhatina dîyardeyên raweyan li gel lêkerê (qertafên dem û kesandinê) di rewşên cuda da pêk tê; hinek ji wan ji berîya qertafên *dem-kesandinê* lihev tîn (MKL), hinek ji wan ji piştî qertafên *dem-kesandinê* cih digirin û hinek jî ji derveyî lêkerê, serbixwe di hevokê da cih digirin.

Tablo 2.11. DRA Dîyarde di Kurmancîyê da

Dîyarde	Peywir	pevgihan
<i>di-</i>	Berdewam (Progressive)	<i>di</i> -Lberdest - MKL <i>di</i> -Lborî – MKL
<i>bi-</i>	Daxwazî	<i>bi</i> - Lberdest - MKL <i>bi</i> -Lborî – MKL
<i>ê/dê/wê</i>	Dema bê	S/A <i>ê/dê/wê bi-</i> Lberdest – MKL
<i>-e</i>	Dûdar	Lborî - MKL <i>-e</i>
<i>-bû</i>		Lborî <i>-bû</i> - MKL

Çavkanî: (Gündoğdu, 2018: 99)

Di devoka Hekarîyê da ji xeynî van dîyardeyan, hin dîyardeyên din jî hene ku berbelav tîn bikaranîn. Ji wan dîyardeyan:

Tablo 2.12. Hin Dîyardeyên Cuda di Devoka Hekarîyê da

Dîyarde	Peywir	pevgihan
(y)ê/(y)a + <i>di-</i>	Berdest/têdayîn	(y)ê - <i>di</i> -Lberdest - MKL
(y)ê/(y)a	Dûdar	(y)ê/(y)a- MKL-Lborî
<i>da</i>		<i>da</i> – Lberdest– MKL
<i>ba</i>	Pêknehatî	<i>dê</i> - Lborî- <i>ba</i> - MKL

Di Kurmancîya standard da û di gelek devokên Kurmancîyê da ji bo dema niha û dema fireh dîyardeyek ji hev cudakirinê nîn e. Di pirtûkên rêzimanê da ji hev cûdakirina dema niha û dema fireh “di zimanê nivîskî da dema niha û dema fireh bi heman rengî ne. Herdu dem bi alîkarîya hokeran ji hev cûda dibin.” (Tan, 2011: 259). Herwiha vê

dîyardeyê jî “(y)ê” wek dîyardeyek “dema niha ya berbiçav” dibînin. Lê di devoka Hekarîyê da ev dîyarde “(y)ê/(y)a” rasterast dîyardeya dema niha/têdayîn/berdest e. Pêkanîna vê dîyardeyê ((y)ê/(y)a + di + Lêker + MKL).

Kurmancîya standard		Devoka Hekarîyê	
Dema niha	Dema Fireh	Dema niha	Dema Fireh
<i>va ye ez di-çim</i>	<i>ez di-çim</i>	<i>ez (w/y)ê-t çim</i>	<i>ez't çim</i>
<i>a niha di-şom</i>	<i>ez di-şom</i>	<i>ez ê-t şom</i>	<i>ez't şom</i>

(354) Ez êt bêjme **xo** be ez bo bin renîyê nakewim. (1)

(355) He yêt bêtê min berde. (31)

(356) Befrek a têt befrek a têt nahête gotin. (1)

(357) Bêjît wila bêna insana ya tete mi (9)

(358) Qederekê çûn berê xo kirê pezeke kûvî yat çît (14)

Di devoka Hekarîyê da heman ev dîyarde ((y)ê/(y)a ji bo dema borîya dûdar jî tê bikaranîn ku di Kurmancîya standard da dema borîya dûdar bi dîyardeya “e”yê pêk tê: (rayeka dema borî + MKL + e). Pêkhatina devoka Hekarîyê : ((y)ê/(y)a + MKL + rayeka dema borî).

Kurmancîya standard	Devoka Hekarîyê
<i>ez hatim-e</i>	<i>ez ê hat-i</i>
<i>min xwarî-ye</i>	<i>min ê xwar-i</i>
<i>em birîndar bû-ne</i>	<i>em êt birîndar bûy</i>

Di vê derê da, divê dîyardeya ku di Kurmancîya standard da “dema borîya dûdar” pêk tîne û qertafa arastebûnê nehê tevlihevkin. Ji ber ku qertafa arastebûnê di devoka Hekarîyê da bi berbelavî tê bikaranîn. wek: “*Ew çûy-e mizgeftê.*” (Ocek, 2014, 224). Di vê mînakê da “e” di standardê da û di hin devokên Kurmancîyê da peywira dîyardeya “dema borîya dûdar” dibîne. Heman mînak di devoka Hekarîyê da di wateya pirs lêkirinê da tê gotin û “e” jî peywira arastebûnê dibîne. Lê di devoka Hekarîyê da ew mînakê di “dema borîya dûdar” da wek. “*Ew ê çûy-e mizgeftê.*” tê gotin.

Dîyardeya “da”yê, di du fonksiyonên cuda da tê pêşberî me. Di devoka Hekarîyê da fonksiyona ewil ku dîyardeya “da”yê pêk tîne di pirtûkên rêzimanê ên Kurmancî da wek “çîrokîya dema bê” ya hatî binavkirin. Ev dîyarde **ji piştî karekê ku pêk hatî, di dema niha da daxwaza ew karê ku pêk hatî tê kirin**. Herwiha çîrokîya dema bê di Kurmancîya standard da wisa pêk tê: ((*d*)ê + *bi* + *lêkera bêrader* + MKL + *a*). (Ocek, 2014: 230). Di devoka Hekarîyê da pêk hatina wê: (*da*+ *rayeka dema niha* + MKL). Pêkhatina nêyîna wê jî: (*ne*+*di* + *rayeka dema borî* + MKL).

Kurmancîya standard		Devoka Hekarîyê	
Erênî	Neyînî	Erênî	Neyînî ⁶⁹
<i>Min ê biribû-ya</i>	<i>Min ê ne-biribû-ya</i>	<i>ez da bem</i>	<i>min ne-di-bir</i>
<i>Ez ê ketibûm-a</i>	<i>ez ê ne-ketibûm-a</i>	<i>ez da kewim</i>	<i>ez ne-di-ketim</i>
<i>Min ê bixwar-a</i>	<i>min ê ne-bixwar-a</i>	<i>ez da xwem</i>	<i>min ne-di-xwar</i> ⁷⁰

Di bikaranîna vê demê “çîrokîya dema bê” da li gorî standardê (yan jî devokên din ên Kurmancîyê) di devoka Hekarîyê da tişta ku duguhire tenê dîyarde nîn e, ew dem di Kurmancîya standard da li gorî gerguhêzîya lêkerê, kirdeyê jî ditewîne. Di devoka Hekarîyê da di forma erênî da ji ber ku lêker di rayeka dema niha da ye lêker gerguhêz jî be kirde her dem xwerû ye; lê belê di devoka Hekarîyê da neyînîkirina wê “demê” li ser rayeka dema borî pêk tê û kirde heman wek standardê li gorî gerguhêzîya lêkerê ditewe.

(359) Me şerê wi nekir **da** me kirêt ketin.(31)

(360) Gûtê ez **da** çim pezekê bo xwe girim xwum. (25)

(361) Êk hêlaba **da** bo min car car şol kiriba. (10)

Dîyardeya “da”yê li gorî rayeka lêkerê hin wateyên demên cuda jî têxe hevokê. Wek mînak dîyardeya “da”yê di metna jêr da wateya “çîrokîya dema fireh” diêxe hevokê.

⁶⁹ Di devoka Hekarîyê da neyînîkirina “dema borîya berdest (domdar)” jî heman bi vî awayî ye. (106.)

⁷⁰ Ev mînak di devoka Hekarîyê da rasterat wisa tê bilêvkirin:

mi ned xar

e ned ketim

mi ned bir

(362) “Piştî sê roj dewat kirban êca **da** hindek xo be zewa danin, **da** zewaw birazewa dizin. pişti hingî tekrar **da** cartek dî sê şev sê roj dî **da** kene dewat. êca an **da** bene Satê, an **da** bene Şitûnê-Îraqê, êca an **da** bene Bêda, êca da tifeng we qirên we dewat we... **Da** çin wi zewa Înînewe, da zewa kirin, zewa jît kirî paratî, carek dî birazawa zawat kirî paratî. an **da** destekê cilka ben, an **da** parey ben, **da** weto çin zewa carek dî înewe. carek dî sê şev sê roj dî **da** kene dewat.” (12)

Dîyardeya “*ba*”yê jî di devoka Hekarîyê da wek dîyardeya “*da*”yê, di du fonksiyonên cuda da tê bikaranîn. Yek ji wan fonksiyonan jî heman wek “*da*” yê “*çîrokîya dema fireh*” pêk tîne.

(363) “Eynî şin jî wesanê; dê **gotiban** şinê esmanî, şinê tarî, dê **gotiba** kesk, zer hemi ayrî ayrî dê reng **kiriban** pişti hingî dê **inaban** darêt xwe **lêkdaban**, met gotê, noke bênê hetan hingît gotê dartewin. dartewin çaanê bü, du şiti garîta sê metra dirêj, weku çarçowê dera dê **lêkdaban**, mafûra xwe **raçandiban**, du jinka, sê jinka dê mafûr **raçandiba**, heta êwari dê mafûrek **raçandiban**.”(2)

Ev Fonksiyon bi gelemperî li devera Şemzînan bi dîyardeya “*da*”yê (362), li devera Geverê bi dîyardeya “*ba*”yê (363) pêk tê.

Fonksiyona duyem ku dîyardeya “*ba*”yê pêk tîne di standardê da wek “*xwestekîya pêknehatî*” tê binavkirin ku di vê raweyê da xwestina karekê ku pêk hatî tê kirin. Tan (2018) raweya *xwestekîya pêknehatî* bi du awayan dîyar dîke 1. *bi+rayeka demaborî+qertafa xwestekî = bi+kir+a*. 2. *rayeka dema borî+dengê alîkar+lêkera alîkar+ qertefa xwestekîyê = got+i+bû+ya*. (2018: 79). Di devoka Hekarîyê da ew rawe wek: “*rayeka dema borî + ba + MKL*” pêk tê.

Tablo 2.13. Bi Kêşana Lêkerên “Çûn/Gotin”ê Di Standard û Devoka Hekarîyê Da Xwestekîya Pêknehatî.

Kes	Kurmancîya Standard				Devoka Hekarîyê	
	Awayê 1.		Awayê 2.		Gerguhêz	Negerguhêz
	Gerguhêz	Negerguhêz	Gerguhêz	Gerguhêz		
YK1	bi-got-a	bi-çû-m-a	got-i-bû-ya	çû-bû-m-a	got-i-ba	çû-ba-m
YK2	bi-got-a	bi-çû-y-a	got-i-bû-ya	çû-bû-y-a	got-i-ba	çû-ba-y
YK3	bi-got-a	bi-çû-y-a	got-i-bû-ya	çû-bû-y-a	got-i-ba	çû-ba-
PK1	bi-got-a	bi-çû-n-a	got-i-bû-ya	çû-bû-n-a	got-i-ba	çû-ba-n
PK2	bi-got-a	bi-çû-n-a	got-i-bû-ya	çû-bû-n-a	got-i-ba	çû-ba-n
PK3	bi-got-a	bi-çû-n-a	got-i-bû-ya	çû-bû-n-a	got-i-ba	çû-ba-n

(364) Gûti heko mi zanî-**ba** ew malmîrate dê bo rojekê pênc zêran dete min...

(31)

(365) Yanî he mi zanî-**ba** polis e jî mi dê erzan da-**ba**-yê. (3)

(366) Xozka tu miri-**ba**-y- gote babê xo. (17)

(367) Yanî çend heskiri-**ba** bixwînît nedgirtin. (20)

2.8.5.1. Raweya Fermanî

Di raweya fermanî da, daxwaza karekê ku hêj pêk nehatî tê kirin. Di Kurmancîyê da raweya fermanî li ser rayeka dema niha û bi qertfa “bi”yê pêk tê û qertafên kesandinê “e û in”ê digirin. Di devoka Hekarîyê da raweya fermanî heman li ser rayeka dema niha û bi qertafa “bi”yê pêk tê, qertafa kesandinê “in” bi gelemperî wek “en”ê diguhire lê mînakên bi qertafa “in”ê jî hene.

(368) Heko tu wê bizmarêş pîyê min derêxi û paşî min **bi-xw-e**. (25)

(369) Belê ma em ku lê-**b** ken. (23)

(370) Bêjîtin paşa gotê wê şolê **ne-k-en**, her-**in** bi xo şolek dî **bi-k-en**. (5)

(371) Bihara pîrê ye, agrê xo **bi-b-e** her-**e**. (9)

Neyînîya raweya fermanî jî heman wek standardê; qertafa fermanîyê “bi” radibe cihê wê “ne” tê.

(372) Xeberê mezinan li erdi **ne-d-en**. (26)

(373) Bêjtê da biraêt mi **ne-kuj-e**, tilya mi **bi-mij-e**. (9)

Hin lêker (were, here,) di raweya fermanî da bin jî qertafa fermanîyê “bi” nagirin. Ji bilî van lêkeran di devoka Hekarîyê da hin caran rawe fermanî be jî qertafa “bi”yê nahê bikaranîn.

(374) Mari zar hat gel axivt, gûtê **were** netirse. (31)

(375) Ew jîd bêjîtinê: **bêje** şertê te çî ye, ka bo mi **bêje**. (27)

Di pirtûkên rêzimanan da dem bi gelemperî wek “*dema bê, dema niha û dema borî*” tê dabêşkirin, demên din (dema borîya dudar, çîrokîya dema borî. hwd.) di nava van deman da tîn cûda kirin” (Crystal, 2008: 479). Lê li gorî hin zimannasan di rêzimanê da dem dibe du beş; I. dema ku hêj nahatî, II. dema borî. Herwiha di Kurmancîyê da jî dem li ser du rayekan tîn dîyarkirin; rayeka dema niha û rayeka dema borî, hemû demên din bi alîkarîya hin qertaf û dîyardeyan li ser van herdu rayekan tîn kêşandin.

Tablo 2.14. Bi Kêşana Lêkera “Çûn”ê Pêkhatina Deman Di Devoka Hekarîyê Da

Kes	Dema Bê	Dema Niha	Dema Fireh	Dema Borî	D. Borîya Dudar	Çîrokîya D. Borî	D. Borîya Berdest
YK1	(d)ê (bi)çi-m	(y)êt çi-m ⁷¹	‘t çi-m	çû-m	(y)ê/(y)a çûy	çû-bî-m ⁷²	‘t çû-m
YK2	(d)ê (bi)ç-î	(y)êt çi	‘t çi	çû-y	(y)ê/(y)a çûy	çû-bî-y	‘t çû-y
YK3	(d)ê (bi)ç-ît	(y)êt ç-ît	‘t ç-ît	çû-	(y)ê/(y)a çûy	çû-bî-	‘t çû-
PK1	(d)ê (bi)ç-in	(y)êt ç-in	‘t ç-in	çû-n	(y)êt çûy	çû-bî-n	‘t çû-n
PK2	(d)ê (bi)ç-in	(y)êt ç-in	‘t ç-in	çû-n	(y)êt çûy	çû-bî-n	‘t çû-n
PK3	(d)ê (bi)ç-in	(y)êt ç-in	‘t ç-in	çû-n	(y)êt çûy	çû-bî-n	‘t çû-n

2.8.5.2. Dema Niha û Dema Fireh

Kar û tewgerên ku dema têdayîn/berdest da pêk tîn wek “dema niha” tê binavkirin. Kar û tewgerên ku her dem tîn kirin jî wek “dema fireh” tê binavkirin. Di Kurmancîya standard da herdu dem jî bi heman awayê pêk tîn û gelek devokên Kurmancîyê da jî ji bo hev cudakirina herdu deman hin hokerên demî (niha, a niha, va, vê gav...) tîn bikaranîn. Awayê pêkhatina herdu deman “bi koka dema niha û bi qertafa “di”yê” pêk tê.

⁷¹ Ev dîyardeya dema têdayîn bi gelemperî nebe jî li gorî zayenda kirdeyê wek “a/ya” diguhire.

⁷² Di devoka Hekarîyê da lêkera “bûn”ê, bi awayekî standart nahê bikaranîn, lêkera bûnê bi sê awayên cûda xuya dibe, wek: “bûn”, ”bûn”, ”bîn”. Herwiha mirov nikare bibêje ka kîjan herêm kîjan formê bikar tîne, lewra li hemû herêma hersê form jî tîn dîtin.

Di devoka Hekarîyê da, dema fireh heman wek standardê pêk tê, lê belê ji bo dema niha li gorî Kurmancîya standard ji pêşîya qertafa dema niha hêmanek din jî “ê/yê”⁷³ tê bikaranîn. Herwiha qertafa dema niha “di” bi gelemperî wek “t/d” tê kurtkirin û ne bi lêkerê, bi hêmana bera xwe ve tê zeliqandin.

Dema niha: dîyardeya dema niha “(y)ê”+ qertafa dema niha “di” + koka dema niha

Tablo 2.15. Bi Kêşana Lêkera “Kirin”ê Cudahîya Dema Niha Û Fireh Di D.H Da

Kes	Kurmancîya Standard		Devoka Hekarîyê	
	Dema Niha	Dema Fireh	Dema Niha	Dema Fireh
YK1	dik- <i>im</i>	dik- <i>im</i>	ê dik- <i>em</i>	dik- <i>em</i>
YK2	dik- <i>t</i>	dik- <i>t</i>	(y)ê dik- <i>ey</i>	dik- <i>ey</i>
YK3	dik- <i>e</i>	dik- <i>e</i>	ê dik-(e) <i>t</i>	dik-(e) <i>t</i>
PK1	dik- <i>in</i>	dik- <i>in</i>	ê dik-(e) <i>n</i>	dik-(e) <i>n</i>
PK2	dik- <i>in</i>	dik- <i>in</i>	ê dik-(e) <i>n</i>	dik-(e) <i>n</i>
PK3	dik- <i>in</i>	dik- <i>in</i>	ê dik-(e) <i>n</i>	dik-(e) <i>n</i>

Çend mînak ji bo dema fireh:

- (376) Rêkire wêrê gûtê em-**t** çîne wêrê daran. (27)
- (377) Te xêr e tu be wan çêla wê garanê tu-**t** girî. (9)
- (378) Em jî meytêbê-**t** xûnin, (23)

Çend mînak ji bo dema niha:

- (379) Ez êt bêjme xo be ez bo bin renîyê nakewim. (1)
- (380) He yêr bêtê min berde. (31)
- (381) Befrek **a** têt befrek **a** têt nahête gotin. (1)
- (382) Bêjît wila bêna insana **ya** tete mi (9)
- (383) Qederekê çûn berê xo kirê pezeke kûvî **yat** çît (14)

Di devoka Hekarîyê da li devera Çelê di dema fireh da formek cuda heye, lê ev form tenê di yekjimara/kesê/3. da xuya dibe.

⁷³ Herwiha ev hêman li gorî zayendê carînan wek “a/ya” jî tê bikaranîn. Ji beşa veqetandekê binêrin r. Ji aliyê din ve, ku Ayhan Geverî ji Abdurrehîm Rehmî Hekarî neqildike, Rehmî Hekarî vê hêmanê wek “wê” dîyardike. Binêr r.58

- (384) Ew jî **çît** **bêjîtinê**: vila xatûna mi. (31)
(di-çe) (di-bêjê)
- (385) **Çît** **nêrîtinê** hêstirekêl nav bürekê nivisti. (25)
(di-çe) (di-nêre)
- (386) **Çîtine** rasta baxçekê berê xwe **detinê** (27)
(di-çe) (di-dê)
- (387) Têt berê xwe **detinê** mezel êb şebeq vedet. (29)
(di-dê)
- (388) Bangîn **bêtinê** Memo bira xulam (29)
(di-bêje)
- (389) Rojekê **nêrîtinê** karvanek d' binê dehli ra hat. (30)
(di-nêre)
- (390) Şêxê Senanîyal wêrê **çîtine** dinyayê **gerêt** gerêt **çît** **bîtine** mêvanê
hinde kafiran. (27) (di-çe) (di-gerê) (di-çe) (di-be)

Ev mînakên jor ku di dema fireh da hatine vegotin ji derveyî forma standard formek cuda da xuya dibin. Wek tê dîtîn hin lêkerên din jî ku di heman mînakan da cihdigirin (*çît/gerêt*); qertafa dema niha “di” ketiye û bi tenê rayeka dema niha û qertafa kesandinê pêk tên.

2.8.5.3. Dema Bê

Dema bê, kar û tewgerên ku piştî dema gotinê tên kirin in. Di standardê da ew dem wek; erênî “*ê/dê + bi+rayeka dema bê*”, neyînî “*ê/dê + ne+ rayeka dema bê*” pêk tê. Di devoka Hekarîyê da awayê erênî tenê bi dîyardeya “*ê/dê*”yê pêk tê û qertafa raweya fermanî “*bi*” bi gelemperî nahê bikaranîn⁷⁴. Herwiha di awayê neyînî da jî dîyardeya “*ê/dê*” dikeve û tenê bi qertafa neyînîyê “*na*”yê pêk tê.

⁷⁴ Di standartê da jî “qertafa raweya fermanî “bi-” di lêkerên pêkhatî de ji holê radibe” (Tan, 2011: 261)

Tablo 2.16. Bi Kêşana Lêkera “Şuştin”ê Dema Bê di D.H Da

Kes	Kurmançîya Standard		Devoka Hekarîyê	
	Erênî	Neyînî	Erênî	Neyînî
YK1	<i>dê bi-şom</i>	<i>dê ne-şom</i>	<i>dê şom</i>	<i>na-şom</i>
YK2	<i>dê bi-şoy</i>	<i>dê ne-şoy</i>	<i>dê şoy</i>	<i>na-şoy</i>
YK3	<i>dê bi-şo</i>	<i>dê ne-şo</i>	<i>dê şot</i>	<i>na-şo</i>
PK1	<i>dê bi-şon</i>	<i>dê ne-şon</i>	<i>dê şon</i>	<i>na-şon</i>
PK2	<i>dê bi-şon</i>	<i>dê ne-şon</i>	<i>dê şon</i>	<i>na-şon</i>
PK3	<i>dê bi-şon</i>	<i>dê ne-şon</i>	<i>dê şon</i>	<i>na-şon</i>

(391) E **dê** mirim, herin go zîyaretê min big(r)in.(26)

(392) Goti e **dê** çim coti kem. (10)

(393) Belê vila xalo e **dê** deme te. (19)

(394) Xudê **dê** rabim dareke dirêj dê çêkem. (15)

(395) Gûtê here gûtê em **na**-hên, (26)

(396) Goti newlahî e **na**-hême xarê. (10)

(397) Hob ket arê wi **dê** rijîyêt, hob ket **na**-çêbît. (15)

2.8.5.4. Dema Borîya Dîyar

Kar û tewgerên ku di demek dîyar da hatî qewimîn wek dema borîya dîyar tê binavkirin. Di standardê da pêk hatina vê demê li ser rayeka dema borî ye. Tiştê ku di guhire li gorî kirdeyê qertafên kesandinê ne. Awayê neyînî jî wek pêşgirekê bi qertafa neyînî “*ne*”yê pêk tê. Di devoka Hekarîyê da ev dem hem awayê erênî hem jî awayê neyînî heman wek standardê pêk tê. Herwiha di vê demê da li gorî gerguhêzîya lêkerê kirde ditewe.

Tablo 2.17. Bi Kêşana Lêkerên “Xwarin û Hatinê”ê Dema Borîya Dîyar Di D.H Da

Kes	Gerguhêz		Negerguhêz	
	Erênî	Neyînî	Erênî	Neyînî
YK1	xwar	<i>ne-xwar</i>	hat- <i>im</i>	<i>ne-hat-im</i>
YK2	xwar	<i>ne-xwar</i>	hat- <i>î</i>	<i>ne-hat-î</i>
YK3	xwar	<i>ne-xwar</i>	hat	<i>ne-hat</i>
PK1	xwar	<i>ne-xwar</i>	hat- <i>in</i>	<i>ne-hat-in</i>
PK2	xwar	<i>ne-xwar</i>	hat- <i>in</i>	<i>ne-hat-in</i>
PK3	xwar	<i>ne-xwar</i>	hat- <i>in</i>	<i>ne-hat-in</i>

- (398) Kiçik nav cihan da **nivist**. (27)
 (399) Wextê ku nehêlan, la îstifa **kir** (3)
 (400) Piştî şeş heyva **çû** eskerîyê. (13)
 (401) Gelek îşçîtîya alemê jî mi **kir**. (20)
 (402) Birayê wi xwe lê **ne-girt** hêstira xwe bir u **çû**. (19)
 (403) Pîyêt mi hindî **perçutî**, çuj mi **ne-zanîn**. (6)

2.8.5.5. Dema Borîya Dûdar

Kar û tewgerên ku di demek nedîyar da hatî qewimîn wek dema borîya dûdar tê binavkirin. Di Kurmancîya standard da dema borîya dûdar wek paşgirekê bi dîyardeya “e”yê pêk tê; di devoka Hekarîyê da ev dem bi dîyardeya ((y)ê/(y)a pêk tê, Lê awayê neyînî heman wek standardê ye, yanî “qertafa neyînîyê + rayeka dema borî + e”

Standard: (rayeka dema borî + MKL + e).

Devoka Hekarîyê : ((y)ê/(y)a + MKL + rayeka dema borî).

Tablo 2.18. Bi Kêşana Lêkerên “Kenîn”ê Dema Borîya Dûdar Di D.H Da

Kes	Kurmancîya Standard		Devoka Hekarîyê	
	Erênî	Neyînî	Erênî	Neyînî
YK1	kenîm- <i>e</i>	<i>ne</i> -kenîm- <i>e</i>	ê kenîy	<i>ne</i> -kenîm- <i>e</i>
YK2	kenîy- <i>e</i>	<i>ne</i> -kenîy- <i>e</i>	yê kenîy	<i>ne</i> -kenîy- <i>i</i>
YK3	kenîy- <i>e</i>	<i>ne</i> -kenîy- <i>e</i>	ê kenîy	<i>ne</i> -kenîy- <i>e</i>
PK1	kenîn- <i>e</i>	<i>ne</i> -kenîn- <i>e</i>	êt kenîy	<i>ne</i> -kenîn- <i>e</i>
PK2	kenîn- <i>e</i>	<i>ne</i> -kenîn- <i>e</i>	êt kenîy	<i>ne</i> -kenîn- <i>e</i>
PK3	kenîn- <i>e</i>	<i>ne</i> -kenîn- <i>e</i>	êt kenîy	<i>ne</i> -kenîn- <i>e</i>

- (404) Te **yê gût-i** kûre ye jî çi nabînît.(27)
 (405) Te çi zelum **ne-dîtin-e** (31)
 (406) Çi lêb ken dayka min **a ketîy-e**⁷⁵ rikê. (9)
 (407) Belê mi zêreser **ne-dîtî-ye**, ema mi ya⁷⁶ pezi **ya dît-i**. (8)

⁷⁵ Di vê mînakê da, wek me li jor dîyarkirî (binêr: r. 113), “e” di peywira arastebûnê da ye.

⁷⁶ Veqetandeka serbixwe. Binêr: r. 55

(408) Mi dawet **ne-kirî-ye** ez **ne-zewicîm-e**. (20)

(409) Mej goti qatî **yê çû-y** bo Tirgewer. (18)

2.8.5.6. Çîrokîya Dema Borî

Çîrokîya dema borî li ser rayeka dema borî û bi alîkarîya lêkera “bûn”ê pêk tê, neyînîya wê jî bi qertafa “ne”yê çêdibe. Di devoka Hekarîyê da ev dem heman bi awayê standardê ye. Tiştta ji standardê cuda lêkera “bûn”ê ye ku hin caran wek “bîn” û “bün”ê diguhire. Lê forma herê zêde tê bikaranîn “bîn” e.

Tablo 2.19. Bi Kêşana Lêkera “Birin”ê Çîrokîya Dema Borî Di D.H Da

Kes	Kurmancîya Standard		Devoka Hekarîyê	
	Erênî	Neyînî	Erênî	Neyînî
YK1	biri- <i>bû</i>	<i>ne</i> -biri- <i>bû</i>	biri- <i>bî</i>	<i>ne</i> -biri- <i>bî</i>
YK2	biri- <i>bû</i>	<i>ne</i> -biri- <i>bû</i>	biri- <i>bî</i>	<i>ne</i> -biri- <i>bî</i>
YK3	biri- <i>bû</i>	<i>ne</i> -biri- <i>bû</i>	biri- <i>bî</i>	<i>ne</i> -biri- <i>bî</i>
PK1	biri- <i>bûn</i>	<i>ne</i> -biri- <i>bûn</i>	biri- <i>bîn</i>	<i>ne</i> -biri- <i>bîn</i>
PK2	biri- <i>bûn</i>	<i>ne</i> -biri- <i>bûn</i>	biri- <i>bîn</i>	<i>ne</i> -biri- <i>bîn</i>
PK3	biri- <i>bûn</i>	<i>ne</i> -biri- <i>bûn</i>	biri- <i>bîn</i>	<i>ne</i> -biri- <i>bîn</i>

(410) Camêrekê jî bireke 'eyalê hürde he-**bü**. (31)

(411) Goti jinkekê hewt piçûkê wê he-**bün**. (9)

(412) He-**bî** ne-**bî** çil Xudê mestir ne-**bî** çil benîademi dirohîntir ne-**bî**...(7)

(413) Goti kulekê da çû-**bû** xwar. (10)

(414) Dayka mij se dereca rûnişti-**bî**. (18)

(415) Çunkî hingî kimlika me çi ne-**bî**. (20)

(416) Yêb aqil hêstirê siwar-**bû**. (19)

2.8.5.7. Dema Borîya Berdest

Ev dem li ser rayeka dema borî û bi qertafa dema niha “di”yê pêk tê. Neyînîya vê demê bi qertafa neyînîyê “ne” yê pêk tê, lê di awayê neyînî da ji bervajî dema niha “di” nakeve. Bikaranîna vê demê di devoka Hekarîyê da jî heman wek standardê ye.

Erênî: *di* + *rayeka dema borî*

Neyînî: *ne + di + rayeka dema borî*

Tablo 2.20. Bi Kêşana Lêkera “Dîtî”ê Dema Borîya Berdest Di D.H Da

Kes	Kurmancîya Standard		Devoka Hekarîyê	
	Erênî	Neyînî	Erênî	Neyînî
YK1	<i>di-dît</i>	<i>ne-di-dît</i>	<i>di-dît</i>	<i>ne-d-dît</i>
YK2	<i>di-dît</i>	<i>ne-di-dît</i>	<i>di-dît</i>	<i>ne-d-dît</i>
YK3	<i>di-dît</i>	<i>ne-di-dît</i>	<i>di-dît</i>	<i>ne-d-dît</i>
PK1	<i>di-dît</i>	<i>ne-di-dît</i>	<i>di-dît</i>	<i>ne-d-dît</i>
PK2	<i>di-dît</i>	<i>ne-di-dît</i>	<i>di-dît</i>	<i>ne-d-dît</i>
PK3	<i>di-dît</i>	<i>ne-di-dît</i>	<i>di-dît</i>	<i>ne-d-dît</i>

(417) Yanî çend heskiriba bixwînî **ne-d**-girtin. (20)

(418) Belge melge **ne-d**-daneme. (6)

(419) Dexil-**d** kire danhêrik wêca-**d** kire gilûl. (8)

(420) Hingî xo çî darij **ne-d**-birîn, qet qet **ne-d**-kirin. (18)

BEŞA SÊYEM

DI DEVOKA HEKARÎYÊ DA HEVOKSAZÎ

3.1. HEVOKSAZÎ (SYNTAX)

Di rêzimanê da hevok bi du awayên sereke tên analîzkirin; ji aliyê wateya peyvan ve û ji aliyê peywira peyvan yanî hêmanên hevokê ve. Di vê beşê da em li ser hemû mijarên hevoksaîyê ranawestînin, bi gelemperî di Kurmancîyê da li ser peyvrêzîya hevokê, di hevokê da kitekirin û li ser hin cûreyên hevokan, wek; hevokên pirsyarîyê, hevokên erênî û neyînî... rawestînin û di vê çarçoveyê da di devoka Hekarîyê da li gorî standardê rewşên awarte bidin dîyarkirin.

3.1.1. Peyvrêzî

Di Kurmancîyê da hevok bi gelemperî çar hêmanan pêk tê “hêmanên bingehîn; ‘kirde’, ‘pêveber’ û hêmanên alîkar; ‘bireser’ û ‘têrker’” (Tan, 2011: 304). Li gorî pirtûkên rêzimanê û xebatên ku li ser Kurmancîyê hatîye kirin; di Kurmancîyê ya da peyvrêzîya sade wek (KBP) “*kirde + bireser + pêveber*”⁷⁷ (Subject+Object+Predicate/Verb)ê pêk tê.

KBP (Kirde + Bireser + Pêveber)

(421) *Min nan xwar*
K. Tew. B.xwr. P. dem. Bor. Yekj.

(422) *Ew cilan dişon*
K. Xwr. B.Tew. P. dem. Nih. Pirj.

(423) *Şîyar dê daran bibire*
K. Xwr. B.Tew. P. dem. bê. Yekj.

Peyvrêzîya standard “**KBP**” di devoka Hekarîyê da jî bi heman awayê ye. Lê dema hêmana *têrkerê*⁷⁸ dikeve nava hevokê, li gorî *lêkerê* (karê ku tê kirin) û li gorî *daçekan* peyvrêzî jî diguhire. Herwiha ev hêman di devoka Hekarîyê da jî rewşên awarte tîne meydanê. Bi hebûna hêmana *têrkerê* di Kurmancîyê da peyvrêzî bi du awayan pêk tê;

⁷⁷ Di gelek xebatan da cihê hêmana *pêveberê* rasterast *lêker* (verb) tê nivîsîn.

⁷⁸ Têrker, ew hêman e ku karê tê kirin ji aliyê *dem*, *cih* û *rewşê* ve temam dike.

1- *Têrker* ji berîya *lêkerê* cih digire û hin caran pêşîya *bireserê* hin caran jî piştî *bireserê* cih digire.

KTBP (*Kirde + Têrker + Bireser + Pêveber*).

- (424) *Min [di] mal da nan xwar*
 K. Tew. T. B.xwr. P. dem. Bor. Yekj.
- (425) *Wi duhi dar birîn*
 K. Tew. T. B.xwr. P. dem. Bor. Pir.j.
- (426) *Wan [di] kanyê da cil şuştin*
 K. Tew. T. B.xwr. P. dem. Bor. Pir.j.

KBTP (*Kirde + Bireser + Têrker + Pêveber*).

- (427) *Min nan mal da xwar*
 K. Tew. B.xwr. T. P. dem. Bor. Yekj.
- (428) *Ez çayê îskanê da venaxwim*
 K. xwr. B.Tew. T. P. dem.
 Bê. Yekj.
- (429) *Te Mîrza çarşîyê dît?*
 K. Tew. B.xwr. T. P. dem. Bor. Yekj.

2- Di awayê duyemîn yê peyvrêzîya bi *têrker* da; *têrker* ji piştî *lêker/pêveberê* cih digire. Hin kesan (Tan, 2011: 344, Eroğlu, 2015: 53) wisa dîyarkirine ku ev cure peyvrêzî tenê bi hebûna *lêkerên negerguhêz* pêk tê. Lê gelek *lêkerên gerguhêz* hene ku *têrkerê* piştî xwe qebûl dikin û gelek *lêkerên negerguzêz* jî hene ku *têrkerê* piştî xwe qebûl nakin. (tab. 26). Lewra ev yek negirêdayî *gerguhêzî/negerguhêzîyê* ye, zêdetir bi girêdayî taybetîya *lêkerê* ya *ragihandinê/neqilkirinê* pêk tê. Ev *lêkerên* ku *têrkerê* diavêjin piştî xwe taybetîya *ragihandinê/neqilkirinê* di xwe de dihewînin; di vê neqilkirin û ragihandinê da, *kes*, *bigir* an jî *cihê* tiştek jê ra tê ragihandin/neqilkirin wek *hedef* ji piştî *lêkerê* cih digire. Yan jî em dikarin bibêjin *lêker* bi taybetîya xwe ya ragihandin/neqilkirinê *kes*, *bigir* an jî *cihê* wek “*hedef*” diavêje piştî xwe. Vê hêmanê “*hedef*”ê Haig &

Öpengin, (2018); ku di rewşên “*hedefa* cihî ya lêkerên tewgerî, *bigirên* lêkerên neqlî û *muxatabên* lêkerên axavtinê” da cih digirin wek *têgînek derbendî* dinirxînin. Wek di (tablo 26) da jî xuya dibe gelek mînakên lêkerên gerguhêz û yên negerguhêz hene ku hêmana “*hedef*”ê piştî xwe qebûl dikin.

Tablo 3.1. Li Gorî Lêkeran Bi Cihbûna Hêmana Têkerê

Lêkerên ku têkerê diavêjin piştî xwe			
Gerguhêz		Negerguhêz	
<i>avêtin</i>	<i>zivirandin</i>	<i>çûyîn</i>	<i>bezîn</i>
<i>anîn</i>	<i>êxistin/xistin</i>	<i>firîn</i>	<i>hatin</i>
<i>birin</i>	<i>rêtin</i>	<i>revîn</i>	<i>rabûn</i>
<i>dayîn</i>	<i>rêkirin</i>	<i>rûniştin</i>	<i>ketin</i>
<i>şandin</i>	<i>hinartin</i>	<i>zivirîn</i>	...
<i>gihandin</i>	<i>firotin</i>		
<i>kişandin</i>	<i>dotin ...</i>		
Lêkerên ku têkerê naavêjin piştî xwe			
Gerguhêz		Negerguhêz	
<i>dîtin</i>	<i>xwarin</i>	<i>şewitîn</i>	<i>sotin</i>
<i>birîn</i>	<i>kirîn</i>	<i>êşîn</i>	<i>tirsîn</i>
<i>standin</i>	<i>zanîn</i>	<i>jîyîn</i>	<i>kenîn</i>
<i>kuştin</i>	<i>dirandin</i>	<i>girîn</i>	<i>fikirîn</i>
...		<i>heyirîn</i>	...

Herwiha wek me jor jî da dîyarkirin ev hêmana *hedefê* di pirtûkên rêzimanê da bi peywira xwe wek “*têker*” tê binavkirin.

K(B)PT (Kirde + Bireser + Pêveber + Têker).

- Bi lêkerên **gerguhêz** peyvrêzî

(430) *Şervanî* *nan* *da* *Rêberî.*

K. Tew. B.Xwr. P. dem. Bor. Yekj. T.Tew

- | | | | | |
|-------|---------------|----------------|---------------------|---------------|
| (431) | <i>Binewş</i> | <i>avê</i> | <i>diberde</i> | <i>zevîyê</i> |
| | K. Xwr. | B.Tew. | P. dem. Niha. Yekj. | T.Tew |
| (432) | <i>Gulnaz</i> | <i>xeberan</i> | <i>dibêje</i> | <i>Şivanî</i> |
| | K. Xwr. | B.Tew. | P. dem. Niha. Yekj. | T.Tew |
- Bi lêkerên *negerguhêz* peyvrêzî
- | | | | |
|-------|--------------|--------------------|-----------------|
| (433) | <i>Perî</i> | <i>çû</i> | <i>bêrê</i> |
| | K. Xwr. | P. dem. Bor. Yekj. | T.Tew |
| (434) | <i>Cûcîk</i> | <i>fîrîne</i> | <i>ser darê</i> |
| | K. Xwr. | P. dem. Bor. Pirj. | T.Tew |
| (435) | <i>Mêvan</i> | <i>dê birûnêne</i> | <i>ber deri</i> |
| | K. Xwr. | P. dem. Bê. Pirj. | T.Tew |

Di van mînakên ewil da “rêber” (430) wek *bigir*, “zevî” (431) wek *hedefa cihî*, “Şivan” wek *muxatab* ji piştî lêker/pêveberê cih digirin. Di mînakên (433), (434), (435)an da ji ber ku lêkerên *negerguhêz* *bireserê* nagirin hêmana *têrkerê* tenê wek “hedefa cihî” diavêjin piştî xwe. Di mînakên (433), (434), (435)an da jî “bêr”, “ser darê” û “ber deri” wek *hedefa cihî* ji piştî lêkerê cih digirin. Ji aliyê din hem lêkerên *gerguhêz* “*dan, berdan, gotin*” û hem jî lêkerên *negerguhêz* “*çûn, fîrîn, rûniştin*” bi taybetîyên xwe yên ragihandin/neqilkirinê wek navgînekê; hêmanên *têrkerê* ji piştî xwe qebûl dikin û wateya arastebûnê diêxin tewgera ku pêk tê.

Di devoka Hekarîyê da li gorî standardê hin rewşên cuda tên dîtîn. Wek ku di mînaka (432)an da jî dîyar e, *muxatabê* axivtinê ji piştî pêveberê cih digire. Ev yek di devoka Hekarîyê da bi gelemperî wisa ye. Lê belê di standard û hin devokên din ên Kurmancîyê da bi rêya dordaçeka “ji...re/ra”yê *muxatab* dikeve pêşîya pêveberê. Vê cudahîyê Haig (2014) û Gündoğdu (2019) di çarçoveya bandora zimanên têkildar da dinirxînin; Li gorî wan, devokên Kurmancîyê yên Bakûr⁷⁹ ketine bin bandora zimanên Tirkî û Ermenîyê û peyvrêzîya wan zimanan “BL”⁸⁰ (*bireser-lêker*) girtine. Lê devokên Başûr (Hekarî û Bahdînan), bi bandora zimanê Aramî⁸¹ jî, peyvrêzîya “Kurdîya kevin” “LB” (*lêker-bireser*) di xwe da parastine. Ji ber vê yekê Devokên Bakûr, hêmana

⁷⁹ Gündoğdu (2019) wek devokên Kurmancîyê yên Bakur û Rojavayê, Haig (2014) wek devokên Anatolîya Navîn binav dike. Herêma Serhed, Diyarbekir, Mardîn (herêmên ku forma “ji ...ra”yê bikartînin).

⁸⁰ “VO” (vêrb-object)

⁸¹ Zimanê Aramî jî xwedîyê avaniya LB ye.

hedef(goal)ê bi rêya dordaçeka “ji....re/ra”yê ji berîya lêkerê nîşan dikin⁸², lê devokên Başûr (Hekarî û Bahdînan) hêmana hedefê heman wek Kurdîya kevin diavêjin piştî xwe.

K.S- *Kajîni* *ji Dilvîne re* *got*

D.H- *Kajîni* *got-e* *Dilvîne*

K.S- *Gulê* *ji min re* *dibêje*

D.H- *Gulê* *dibêjt-e* *min*

K.S- *Te* *ji wê re* *çi* *got?*

D.H- *Te* *çi* *got-e* *wê?*

Di devoka Hekarîyê da hin caran *muxatab* bi daçeka “bo/bû”yê dikevin pêşîya *pêveberê*. Lê di vê derê da *muxatab* di rewşa *hedefê* da nîn in û di karê ku tê kirin da jî wateya arastebûyîne nîn e, kar û tewger bi sedema *muxataban* tê kirin.

(436) Mi **bû** hewe negot. (21)

K. Tew. T.Tew P. dem. Bor. Yekj.

(437) (tu) bendeke stranê **bû** min bêje.(25)

K. Xwr. B.Tew T.Tew P. dem. Bê. Yekj.

(438) Dadê çîrok **bû** me gotin.

K. Tew. B.Xwr. T.Tew P. dem. Bor. Pir.j.

Di hin devokên Kumancîyê da bi bikaranîna daçeka “ber bi....ve”yê jî hin caran wek hedef “*cih*” ji berîya *pêveberê* *cih* digire.

(439) *Rêber* *ber bi* *malê ve* *diçû.*

K. Xwr. Daç. T.Tew P. dem. Bor. Yekj.

(440) *Pez* *ber bi* *çîyay ve* *dihat*

⁸² Di Kurmancîya standart da jî ev form tê bikaranîn.

	K. Xwr.	Daç.	T.Tew	P. dem. Bor. Yekj.
(441)	<i>Ew</i>	<i>ber bi</i>	<i>bazarê ve</i>	<i>diçû</i>
	K. Xwr.	Daç.	T.Tew	P. dem. Bor. Yekj.

Ev form jî di devoka Hekarîyê da nîn e û ji cihê vê formê, formek cuda ku bi daçeka “bo/bû”yê tê çêkirin tê dîtin, lê dîsa jî wek *hedef cih* dikeve piştî lêkerê.

(442)	(Ez)	Yê't	çim	bo	rexê Bilîsey da (1)
	K. Xwr.		P. dem. Bor. Yekj.		T.Tew
(443)	Ez	siet nehê	hatim	bo	gundi (6)
	K. Xwr.		T.Tew	P. dem. Bor. Yekj.	T.Tew
(444)	(Ew)	hat	bo		memleketi (13)
	K. Xwr.		P. dem. Bor. Yekj.		T.Tew

Di devoka Hekarîyê da peyvîzî hin caran bi awayên cudatir jî pêk tê⁸³. Ji wan rewşên cuda; gelek caran hokera demê (têker) li serê hevokê cih digire.

(445)	Êk salîyê	mi(n)	meyteb	xandî ye. (20)
	T.Tew	K. Tew.	B.Xwr.	P. dem. Bor. Yekj.
(446)	Berê	em	(di)çûne	zozana (19)
	T.Tew	K. Xwr.	P. dem. Bor. Pirj.	T.Tew.
(447)	Zemanê berê	me	pez	hebî. (2)
	T.Tew	K. Tew.	B.Xwr.	P. dem. Bor. Yekj.

Hin caran cihê *Kirde* û *bireserê* jî tê guherîn:

(448)	a.	Sêvên	zerkê da mêvanan	xarin.
		B.Tew	K. Tew.	P. dem. Bê. Pirj.
	b.	Mêvanan	sêvên zerkê da	xarin.
		K. Tew	B.Tew	P. dem. Bê. Pirj.

⁸³ Ev yek di devokên din ên Kurmancîyê da jî tînin dîtin

3.1.2. Ji alîyê Wateyê ve Hevok

Hevok ji alîyê wateyê ve wek; hevokên *Pirsyarîyê, neyînî, erênî, fermanî, baneşanî* hwd. tên dabeşkirin. Di vê derê da em li ser hemû cureyan ranawestin, tenê di devoka Hekarîyê da hin rewşên cuda dê bidin dîyarkirin.

3.1.2.1. Pirslêkirin

Di Kurmancîyê da *pirslêkirin*, bi hin *peyvên cînavkî, hokerî, rêngdêrî* û bi *kirpandinê* pêk tê. Di devoka Hekarîyê da bi kirpandinê pirslêkirin heman wek standardê ye; hêmana ku tê pirsîn tê kirpandin.

(449) Gûtê: tu **aqilfirûşî?** (13)

(450) Gulbarînk tu bîra dayka met **key?**.(9)

(451) Te me'na wê **zanî?** (27)

Di devoka Hekarîyê da li hin deverên nêzîkî sînorê “Îraq” û “Îranê” hêmana ku tê pirsîn bi kirpandinê tê dirêjkirin jî.

(452) a. *Tu çawanîî?*

b. *Tu başîî?*

c. *tu hatîî?*

Di devoka Hekarîyê da bi cînavk, hoker û rêngdêran pirslêkirin li gorî standardê ji alîyê peyvên ve hin guherîn çêdibin. Ev yek hin caran peyvrezîyê jî bi xwe ra diguhire. Wek:

D.H

K.S

Ka/Kanê

Li ku

(453) a. Birawê wi hat gûtê: kuro **ka** pez? (19)

(pez **li ku** ye)

b. Kurik rabû gûtê dayê **ka** babê min?(21)

(babê min **li ku** ye)

c. Go be **ka** xudanê wi?(27)

(xudanê wî **li ku** ye)

Di devoka Hekarîyê da wateya *pirsê* çî bi kirpandinê be û çî jî bi peyvên cînavkî, hokerî, rêngdêrî be, gelek caran bi awayê *neyînî* pêk tê. Ev yek di devokên din ên Kurmancîyê da jî tê dîtin lê di devoka Hekarîyê da berbelavtir e.

- (454) a. Tu bû me meselekê **nabêji**? (16)
 b. Gûtê bira te **nezanî**? (31)
 c. Çi kes dî gel hewe **nebî**? (6)

3.1.2.2. Hevokên Erênî û Neyînî

Ji alîyê wateyê ve *hevokên erênî*, kar û tewgerên ku hatîye kirin, tên kirin yan jî dê bihên kirin dîyar dikin. Di devoka Hekarîyê da li ser hevokên erênî ku bi lêkerên gerguhêz pêk hatî, di “çîrokîya dema bê”(binêr, r. 114)da guherîn çêdibe.

K.S	D.H
<i>Min ê nan xwariba</i>	<i>Ez da nan-i xwe-m</i>
<i>Te dê nan anîba</i>	<i>Tu da nan-i îni</i>
<i>Me dê dar birîba-n</i>	<i>Em da dar-an bir-in</i>

Wek tê dîtin di hevokên bi standardê da *kirde* tewandî, *bireser* xwerû û *lêker* li gorî *bireserê* ya hatî kişandin, lê di hevokên bi devoka Hekarîyê da *kirde* xwerû *bireser* tewandî û *lêker* li gorî *kirdeyê* ya hatî kişandin.

Dema em hevokên neyînî dinêrin, ji bervajî hevokên erênî, kar û tewgerên ku nehatîye kirin, nahên kirin yan jî dê nehên kirin dîyar dikin. Di Kurmancîyê da “neyînîbûna lêkeran bi *qertafên* neyînî, neyînîbûna rengdêr û navdêran jî bi *daçekên* neyînîyê pêk tê”(Tan, 2011: 312). Di devoka Hekarîyê da *hevokên lêkerî* heman wek standardê tên neyînî kirin, yanî *qertafên* neyînîkirinê “ne/na” tên lêkerê û bi vî awayî hevok tê neyînîkirin. Lê di hevokên *navdêrî* da rewş diguhire; di devoka Hekarîyê da neyînîkirina hevokên *navdêrî* ji cihê *pêşdaçeka* “ne”yê, bi *paşdaçeka* “nîn”ê pêk tê.

K.S	D.H
<i>Tu ne mirov î</i>	<i>Tu mirov nîn î</i>
<i>Ev e ne baş e</i>	<i>Ev e baş nîn e</i>
<i>Rengê wê ne şîn e</i>	<i>Rengê wê şîn nîn e</i>

Ku di mînakan da jî dîyar e, di standardê da neyînîkirina hevokê bi *pêşdaçeka* “ne”yê û di devoka Hekarîyê da bi *paşdaçeka* “nîn”ê pêk hatîye.

ENCAM

Zimanê Kurdî wek gelek zimanên dinyayê ji çend zaravayan pêk tê. Herwisa zaravayên Kurdî jî çend devokên ji hev cuda di nava xwe da dihewîne. Lê li gorî gelek zimanên dinyayê zaravayên zimanê Kurdî û devokên wan zaravayan ji xebatên berfireh bêpar mane. Gelek devokên zaravayên Kurdîyê jî ji lêkolînên zimannassan dûr mane, ji wan devokan yek jî devoka Hekarîyê ye ku xebatên berfireh li ser vê devokê nehatine kirin. Devoka Hekarîyê ji ber pozisyona erdnigarîya ku li ser tê axavtin û ji ber sînorên sîyasî li gorî devokên din gelek taybetîyên cuda di nav xwe de dihewîne. Di vê xebatê da bi gelemperî Kurmancîya Hekarîyê bi çavekê zimannasî hat analîz kirin.

- i- Li ser dengnasîyê sedan sed nebe jî di devoka Hekarîyê da rewşên awarte hatin dîyarkirin. Ji van rewşên awarte yên herê ber bi çav; hebûna dengê [y:]yê ku bi gelemperî ji cihê dengê [u:]yê digire, kêmbûna dengê [o]yê ku bi gelemperî ber bi dengê [u:]yê ve diguhire, ji alîyê Geverê ber bi Colemêrg û Çelê ve ketina dengê [r]yê, bi taybetî li alîyê Şemzînan neyînîya diftonga “xw”yê û dengê [v]yê. Hwd. hêj bi sedan rewşên awarte. Ji alîyê din me ji çar navçeyên Herkarîyê ji çar datayên ji hev cuda rêjeya dangan derêxist û li gorî vê rêjeyê di devoka Hekarîyê da hebûna dangan analîz kir. Ji bo mînak ji ber veqetandeka pirjimarîyê di devoka Hekarîyê da dengê [t]yê zêde dibe û dengê [n]yê kêmbûn dibe. Herwiha li gorî navçeyan bi xebatên tengtir, dê gelek cûdahîyên din der bînin pêş.
- ii- Li ser mijarên morfosentaksê; ku her mijarek bi datayên herêmê hat pişt rastkirin;
 - Di devoka Hekarîyê da bi gelemperî nebe jî zayend wek Kurmancîya standard derdikeve pêş. Lê di nava civaka Hekarîyê da di formên rêzimanî da ji mezinan li ber civanan ve hin guherîn çêdibin. Yek ji wan guherînan jî zayend e ku, di nava kesên mezin da zayend çiqas jî bi awayekî xurt bê parastin, di nava civanan da zayend cudahiya xwe hêdî hêdî winda dike. Em dikarin bibêjin ev guherîn ji bandora Tirkîyê ye, ji ber ku bi awayekê dijber kesek çiqas tirkîaxêv be, dema Kurmancî diaxive zayenda rêzimanî ew qas tevlihev dike. Ev guherîna zayendî li gorî tewangê di veqetandekê da kêmtir e lê di nava civanan da car caran mirov li hemberî tevlihevkirina zayenda bi veqetandekê jî tê.
 - Di Kurmancîya standard da ji piştî qertafên nedîyarîyê qertafên veqetandekê *ek-e/mê/yekjimar*, *ek-î/nêr/yekjimar* û *-ine/pirjimar*. Di devoka Hekarîyê da ev qertaf wek: *ek-e/mê/yekjimar*, *ek-ê/nêr/yekjimar*. Yanî yekjimara mê “ek-e”

heman wek standardê ye, lê yekjimara nêr “*ek-î*” ji ber “*ek-ê*” ve diguhire û qertafa pirjimarîyê ya nedîyar nahê bikaranîn.

- Li gorî dataya ku me berhev û analîz kirî bi gelemperî ji qertafa pirjimarîyê “*an*”ê hin caran “*n*” dikeve, tenê wek “*a*” dimîne. Qertafa yekjimariyê ya nêr/masculine “*î*” bi gelemperî wek “*î*”yê tê bikaranîn. Qertafa yekjimariyê ya mê/ feminine “*ê*” bi heman awayê standard tê bikaranîn. Qertafên nebinavkirinê “*-ek*” û “*-in*” jî ditewin ango qertafên tewangê werdigirin û dibin “*-ekê*” (yekjimar/mê), “*-ekî*” (yekjimar/nêr) û “*-inan*” (pirjimar). (Tan, 2011: 91). Lê belê dema em ji devoka Hekarîyê dinêrin ji piştî qertafa yekjimara nedîyar “*ek*” peyv xwedî zayenda mê be jî nêr be jî herdem bi qertafa mê “*ê*”yê tê tewandin. Vê yekê Hazim (1994) jî dîyardike ku di rewşa nedîyar da ji bo zayenda nêr û mê “*ê*” têt bikaranîn. Dema em pirjimarîyê dinêrin ji bo rewşa nedîyar çu qertaf nahên bikaranîn lê ji berîya peyva ku di rewşa pirjimar da ditewe hin peyvên wek: *hin, çend, gelek...* tên bikaranîn.
- Di devoka Hekarîyê da qertafên banglêkirinê piştî demekê bi hin navan ve ên zeliqî û di hemû rewşan da di halê tewandî da tên bikaranîn. Ev yek di hemû navên ku ji sê peyvan pêk hatî (zîn, gul, pîr, kej...) û di peyvên tên kurt kirin (leyla/leyl, fatma/fat, eyşan/eyş, memed/mem, sedat/sed, rojhat/roj...) da tê dîtin. Yanî lêker gerguhêz be jî negerguhêz be jî kirde di rewşa tewandî da ye.
- Di mijara daçekan da; daçekên xwerû/esil ku di nava xwe da û li gorî pozisyona xwe ên bûy sê beş; wek: *paşdaçek, pêşdaçek, bazindaçek*. Di devoka Hekarîyê da her çend jî ji van cûre daçekan hemû bên bikaranîn jî, *pêşdaçek* bi awayekî zêdetir cih digirin. Gündoğdu (2019), vê yekê di çarçoveya zimanên derdorê/têkildar da dinirxîne; dibêje ku bi bandora zimanê derdorê hin devokên Kurmancîyê bi gelemperî avanîya *paşdaçekan* (mîn: Meletî), hin devok avanîya *bazindaçekan* (mîn: Mûş) bikartînin, lê devokên Başûr (mîn: Hekarî) bi bandora zimanê Aramî jî avanîya *pêşdaçekan* bikartîne.
- Di Kurmancîyê da lihevhatina dîyardeyên raweyan li gel lêkerê (qertafên dem û kesandinê) di rewşên cuda da pêk tê; hinek ji wan ji berîya qertafên *dem-kesandinê* lihev tên (MKL), hinek ji wan ji piştî qertafên *dem-kesandinê* cih digirin û hinek jî ji derveyî lêkerê, serbixwe di hevokê da cih digirin. Di devoka

Hekarîyê da ji xeynî dîyardeyên di standardê da tên bikaranîn hin dîyardeyên din jî hene ku berbelav tên bikaranîn. Ji wan dîyardeyan:

- a- “(y)ê/(y)a”; rasterast dîyardeya dema niha/têdayîn/berdest e. Pêkanîna vê dîyardeyê ((y)ê/(y)a + di + Lêker + MKL). Di devoka Hekarîyê da heman ev dîyarde ((y)ê/(y)a ji bo dema borîya dûdar jî tê bikaranîn ku di Kurmancîya standard da dema borîya dûdar bi dîyardeya “e”yê pêk tê: (rayeka dema borî + MKL + e). Pêkhatina devoka Hekarîyê : ((y)ê/(y)a + MKL + rayeka dema borî). Ev hêman ji bo ku wateya demê biêxe hevokê ji pêşîya lêker/pêveberê cih digire. Haig (2008) di beşa Formên Devoka Badînanî (Evidence from Badînanî) da vê hêmanê di bin serenava “*ergativîya duyane*” (Secondary ergativity) da dinirxîne û dibêje ku: “wek peyvnasî ev hêman bi bingeha xwe ji qertafên veqetandekê ne, lê li gorî vê avanîyê, ne wek veqetandek, zêdeyî wek parçeyek lêker/pêveberê hereket dikin” (Haig, 2008: 269). Di berdewamê da Haig (2008) ji MacKenzie (1961) neqil dike, ku MacKenzie van hêmanan rasterast wek dîyardeyên *rewşa berdewamîyê* dibîne. Bi gelemperî ev hêman li gorî kirdeyê hereket dike û heman wek qertafên veqetandekê zayend û jimarê didin dîyarkirin, lê mînakên tevlihevkirina zayendê jî kêm nîn in. Bi gelemperî tevlihevî an jî guherîn ji zayenda mê ber bi nêrzayîyê ve ye.
- b- Dîyardeya “da”yê, di du fonksîyonên cuda da tê pêşberî me. Di devoka Hekarîyê da fonksîyona ewil ku dîyardeya “da”yê pêk tîne di pirtûkên rêzimanê ên Kurmancî da wek “çîrokîya dema bê” ya hatî binavkirin. Ev dîyarde **ji piştî karekê ku pêk hatî, di dema niha da daxwaza ew karê ku pêk hatî tê kirin**. Herwiha çîrokîya dema bê di Kurmancîya standard da wisa pêk tê: ((d)ê + bi + lêkera bêrader + MKL + a). (Ocek, 2014: 230). Di devoka Hekarîyê da pêk hatina wê: (da+ rayeka dema niha + MKL). Pêkhatina nêyîna wê jî: (ne+di + rayeka dema borî + MKL). Dîyardeya “da”yê li gorî rayeka lêkerê wateya “çîrokîya dema fireh” jî diêxe hevokê
- c- Dîyardeya “ba”yê jî di devoka Hekarîyê da wek dîyardeya “da”yê, di du fonksîyonên cuda da tê bikaranîn. Yek ji wan fonksîyonan heman wek “da”yê “çîrokîya dema fireh” pêk tîne. Fonksîyona duyem ku dîyardeya “ba”yê

pêk tîne di standardê da wek “*xwestekîya pêknehatî*” tê binavkirin ku di vê raweyê da xwestina karekê ku pêk hatî tê kirin.

Hêj bi dehan form û rewşên awarte li gorî datayan hatin analîz kirin.

iii- Li ser hevoksazîya devokê;

- Di devoka Hekarîyê da li gorî standardê forma herê cuda, *muxatabê* axivtinê ji piştî pêveberê cih digire. Ev yek di devoka Hekarîyê da bi gelemperî wisa ye. Lê belê di standard û hin devokên din ên Kurmancîyê da bi rêya dordaçeka “ji....re/ra”yê *muxatab* dikeve pêşîya pêveberê. Vê cudahîyê Haig (2014) û Gündoğdu (2019) di çarçoveya bandora zimanên têkildar da dinirxînin; Li gorî wan, devokên Kurmancîyê yên Bakûr ketine bin bandora zimanên Tirkî û Ermenîyê û peyvîzîya wan zimanan “BL” (bireser-lêker) girtine. Lê devokên Başûr (Hekarî û Bahdînan), bi bandora zimanê Aramî⁸⁴ jî, peyvîzîya “Kurdîya kevin” “LB” (lêker-bireser) di xwe da parastine.

Mebesta vê xebatê ew bû ku Kurmancîya Hekarîyê bi hemû alîyan ve û bi çavekê zimannasî analîz bike. Herwiha xebat, li serî heya dawîyê, her taybetîyek devokê bi datayên ku hatî berhevkirin ra hat piştrast kirin. Di xebata xwe da bi qasî ku destê me hatî me her taybetî û formek cûda ya vê devokê analîz kir, lê ji ber ku devok di nava xwe da jî xwedîyê standardekê nîn e, dibe ku gelek formên cuda di xebata me da cih negirtibin. Hêvî dikim ku van mijarên ji lêkolînan bêpar may ji aliyê lêkolîner, zimannas û kesên ku bi van mijaran ve mijûl dibin, xebatên berfirehtir û binecihtir bînin kirin.

⁸⁴ Zimanê Aramî jî xwedîyê avanîya LB ye.

ÇAVKANÎ

- Adak, A. (2013). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Aksan, D. (1979). *Her Yönüyle Dil: Ana Çizgileriyle Dilbilim*. Cilt 1, Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.
- Austin, P. K. (2014). Language documentation in the 21st century. *JournalLIPP*, Vol 3, 57-71.
- Bedir Han, C. ve R. Lescot (2004). *Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi)*. İstanbul: Avesta Yayınları
- Bedir Xan, C. A. (1994). *Bingehên Gramera Kurdmancî*. Stockholm: Nûdem.
- Bedir Xan, E. C. ve R. Lescot (2011). *Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî)*, İstanbul: Weşanên Doz.
- Bedirxan, C. (1998). "Bingehên Gramera Kurdmancî." *Hawar* 2 (Hejmar 28). Stockholm: Weşanên Nûdem.
- Bedir-xan, C. A. (2002). *Elfabêya kurdî & Bingehên Gramera Kurdmancî*. Stockholm: Nefel.
- Bedlîsî. Ş. (2007). *Şerefname*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Bussmann, H., (1996). *Routledge dictionary of language and linguistics*, London: Routledge.
- Ciwan, M. (1992). *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi (kurmanc lehçesi)*, Balingen: Weşanên Jîna Nû.
- Ciwan. M. (1993), "Zimanê Kurdî." *Armanc*. Stockholm, hej: 135-138.
- Crystal, D. (2008). *A Dictionary of Linguistics and Phonetics*. Blackwell Publishing, USA.
- Eroğlu, Y. (2015). "Di Kurdî (Kurmancî) de Hevoksazî". *Nûbihar*, Jimar 132, 52-54.
- Farqînî, Z. (2018). "Ji Aliyê Binyatî ve Lêker û Lêkerên Veqetînbar di Zaravayê Kurmancî de", *The Journal of Mesopotamian Studies*, <http://jms.artuklu.edu.tr/tr/issue/38846/427751> (Tikandin: 31.01.2020).
from Kurdish. *Lingua*, 105, 149-173.

- Geverî, A. (2017). "Sê Tabloyên Ebdurrehîm Rehmî Hekarî yên Derheq Kêşana Lêkeran de." *Derwaze*, Jimare 1, 148-155.
- Gündoğdu, S. (2015). "Negation in Kurmanji" *Affix Ordering Across Languages and Frameworks*. Oxford University Press, 154-171.
- Gündoğdu, S. (2016a). "Noun-Verb Complex Predicates in Kurmanji: a syntactic account." *Proceedings of the 23rd Conference of the Student Organization of Linguistics in Europe (ConSOLE XXIII)*, 383-405.
- Gündoğdu, S. (2016b). "Remarks on Vowels and Consonants in Kurdish." *Anemon (Muş Alparslan University Journal of Social Sciences)*, Cilt 4, (1), sayfa 57-69.
- Gündoğdu, S. (2017). "Variation in the Ergative Pattern of Kurmanji", *Wiener Jahrbuch für Kurdische Studien*, 5: 45-63.
- Gündoğdu, S. (2019), "Asymmetries in Kurmanji Morphosyntax" in *Bamberg Studies in Kurdish Linguistics*, University of Bamberg Press. Vol. 1, 93-116.
- Gündoğdu, S., (2018). "Argument-Adjunct Distinction in Kurmanji Kurdish", PhD Dissertation, Boğaziçi University, İstanbul, Social Sciences Institute.
- Haig, G. (1998) On the interaction of morphological and syntactic ergativity: lessons
- Haig, G. (2002). Noun-plus-verb complex predicates in Kurmanji Kurdish: rgumentsharing, argument incorporation, or what? *Sprachtypologie und Universalienforschung*: STUF, pp. 15-48.
- Haig, G. (2008). *Alignment change in Iranian languages: A construction grammar approach*. Berlin: Mouton.
- Haig, G. (2014). "VG word order in Kurdish and Neo-Aramaic: Typological and areal considerations. In Khan, G. & Napiorkowska, L. (eds.)", *Neo-Aramaic and its linguistic context*, New York: Gorgias Press. 407–425.
- Haig, G. ve Öpengin, E. (2015). Kurmanji Kurdish in Turkey: structure, varieties, and status. Retrieved from https://www.academia.edu/17650650/Kurmanji_in_Turkey_structure_varieties_and_status (Tikandin: 03.09.2019).

- Haig, G. ve Öpengin, E.(2014). “Gender in Kurdish Structural an Socio-cultural Dimension. https://www.academia.edu/6001901/Gender_in_Kurdish_Structural_and_sociocultural_dimensions (Tikandin: 25.09.2019).
- Hazim, R. (1994). “Devokê Hekarîya, *Kovara Kurmancî*, Hejmar 14-15. Parîs, Enstîtûya Kurdî ya Parîsê <https://www.institutkurde.org/publications/kurmanci/telechargement/ku1415.pdf> (Tikandin: 02.11.2019).
- Hengirmen, M. (2009). *Dilbilgisi ve Dilbilim Terimleri Sözlüğü*, Ankara: Engin Yayınları.
- Izady, M. R. (2011), *Bir El Kitabı Kürtler*, İstanbul: Doz Yayınları.
- Kalkan, L. (2019). “Rêjeya Dengan Di Devoka Torê/Tûr Abdîn de”. *Nûbihar*, Jimar 147, 56-60.
- Kurdo, Q. (1981), *ZIMANÊ KURDÎ (RÊZIMAN)*, Frankfurt: Weşanên Komkar.
- MacKenzie, D. N. (1961), *Kurdish dialect studies, Vol. I*. London: Oxford University Press.
- MacKenzie, D. N. (1962), *Kurdish dialect studies, Vol. II*. London: Oxford University Press.
- Muhammed, H. (2016) “*Dengnasî di kurdî de*” <https://zimannas.files.wordpress.com/2016/08/dengnasi1.pdf>. (Tikandin: 22.02.20).
- Muhammed, H. (2016). "Daçek Di Zimanê Kurdî", *Kanîzar*, Hejmar 5: 4-70.
- Ocek, N. (2014). *Waneyên - Rezimana Kurmancî*. Van: Weşanên Sîtav.
- Öpengin, E., ve Haig, G. (2014). "Regional variation in Kurmanji: A preliminary classification of dialects", *Kurdish Studies*, 2(2), 143-176.
- Doskî, T. Î. (hzl) (2011). *Dîwan*. İstanbul: Nûbihar Yayınları.
- Rhea, S. A. (1869). “Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District”, *Journal of the American Oriental Society*, Vol. 10 (1872-1880), pp. 118-155 <https://www.jstor.org/stable/pdf/592123.pdf> (Tikandin: 03.10.2019).
- Rizgar, B. (2012), *Uygulamalı Kürtçe Dersleri /Dersên Kurdî*, İstanbul: Doz
- Tan, S. (2011). *Rêzimana Kurmancî*. İstanbul: Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê.

- Tan, S. (2018). *Du Xebatên Destpêkî yên bi Îngilîzî yên Rêzimana Kurmancî: Analîzeke Zimanzanî û Rêzimanî*, (Teza Çapnekirî ya Lîsansa Bilind) Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi, YDE.
- Thackston, W.M. (2006). *Kurmanji Kurdish: A reference grammar with selected readings*. Unpublished Manuscript. Harvard University, Cambridge, MA, USA.
- Vaux, B., ve Cooper, J. (1999). *Introduction to linguistic field methods* (Vol. 1). Lincom Europa.
- Vikisözlük, “IPA okunuşları”, https://tr.wiktionary.org/wiki/Yardıml:IPA_okunuşları (Tikandin 20.02.2020).
- Zêrevan, A. (hzi) (2004). *Memozîn*. Stockholm: Nefel.
- Xeznedar, M. (2010). *Mêjûy Edebî Kurdî*, Hewlêr: Weşanên Aras.
- Yıldırım, K. (2013). *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi*. İstanbul: Avesta Basın Yayın.

KURTEJÎYAN

Serdar Akbaş di sala 1993an da li navçeya Geveê ya Hekarîyê ji dayîk bûye. Dîbistana seretayî, dibistana navîn û lîse li bajarê Dîlokê xwandîye. Di sala 2017an da li zanîngeha Mûş Alparslanê beşa ziman û edebîyata Kurdî tamam kirîye. Di heman salê da li Enstîtûya Zanîstên Civakî ya Zanîngeha Mûş Alparslanê di beşa Çand û Zimanê Kurdî da dest bi lîsansa bilind kirîye. Di sala 2018an da li navçeya Şemzînan wek mamostayê Zimanê Kurdî (Kurmancî) hatîye wezîfekirin û hêj jî berdewamîya wî karê xwe dike.

ÖZGEÇMİŞ

Serdar Akbař 1993 yılında Hakkari'nin Yüksekova ilçesinde doğdu. İlk, orta ve lise öğrenimini Gaziantep'te tamamladı. 2017 yılında Muř Alparslan Üniversitesi Kürt Dili ve Edebîyatı Bölümü'nden mezun oldu. Aynı yıl Muř Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilimdalında Yüksek Lisans programına başladı. 2018 yılında Hakkari'nin řemdinli ilçesinde Yařayan Diller ve Lehçeler (Kurmanci) öğretmeni olarak göreve başladı ve halen bu görevini sürdürmektedir.